


# PÊŞMERGE

## Rehîmê Qazî

NÛDEM

# PÊŞMERGE

*Rehîmê Qazî*

# PÊŞMERGE

*Rehîmê Qazî*

*Kurmanciya wê:* *Ziya Avci*

NÛDEM

Weşanên Nûdem: 33
Pêşmerge
Çapa Yekem: Êrîvan 1960
Çapa Duwem: Bexda 1962
Çapa Sêyem: Stockholm 1997

© Weşanên Nûdem
Pergala bergê û rûpelan: Nûdem
Wêneya bergê: Ata Kazaz
ISBN: 91 88592-33 2

Adres:
Nûdem
Termov. 52
176 77 Järfälla-Sweden

Tel û faks: 8-583 564 68

# Pêşgotina weşanxanê

Ev berhema di destê we de, di sala 1958'an de ji aliyê Rehîmê Qazî ve hatiye nivîsandin. Berhem têkoşîn û xebata siyasî-civakî ya serdema Komara Kurdistanê radixe ber çavan; jiyana pêşmergetiya wê demê, zordestiya dagîrkerên Kurdistanê, zilm û bindestiya hundurî bi awayekî sade digihîne me û behsa bûyerên rasteqînî û awayê xebata siyasî, kulturî û eskerî ya wê demê bi uslûb û awayê romankî tîne zimên.

Ev pirtûk, bi celebê pirqehremanî hatiye nivîsandin. Qehremanên wê çend kes in. Tîpên mîna Mîrza Qutas çêkirine ku, li Kurdistanê sembol û nimûneyên belavkerên bîr û fikrên neteweyî ne. Ev dikarin bibin alavên baş ji bo lêkolînerên vî warî. Tîpên mîna Mîrza Qutas, ku ne tenê li rojhilata Kurdistanê, belko li seranserî Kurdistanê jî hene, ew tîp in ku xebata neteweyî ya destpêkê meşandine.

Rehîmê Qazî, di sala 1925'an de li rojhilata Kurdistanê, li gundê Gwîgceliyê, li navçeya Mukriyanê hatiye dinyayê. Ew ji malbateke bi nav û deng e. Vê malbata han di riya xebata azadiya Kurdistanê de gelek şehîd dane. Yek ji wan ku ji aliyê hemû kurdan ve rêz û hurmet jê re tê girtin û bi minnet tê yadkirin, Qazî Mihemmed e.

Rehîmê Qazî, yek ji wan 60-70 kesan e ku di sala 1946'an de ji aliyê Komara Kurdistanê ve ji bo xwendin û perwerdekirina kadroyan çûbû Bakûyê. Piştî çûyina wan bi pênc-şeş mehan, bûyera ji holêrabûna Komara Kurdistanê diqewime, gelek ji wan xwendevanên kurd vedigerin Kurdistanê. Lê Rehîmê Qazî û çend kesên din li wir dimînin. Paşê ew

dest bi xwendina akademîk dike û di sala 1954'an de teza xwe ya doktorayê li ser tevgera neteweyî ya kurd, pêşkêşî unîversîteya Bakûyê dike.

Dr. Rehîmê Qazî di salên xwe yên koçberiyê de, li Sovyetê, vala nasekine. Dema ku Barzanî diçe Sovyetê, Rehîmê Qazî bi wî re dikeve têkiliyê û têdikoşin ku serokatiyek nû li Kurdistanê bê avakirin. Dr. Rehîmê Qazî jî bi Mele Mustefa Barzanî re di nav vê serokatiyê de cih digire. Lê ev kar zêde dewam nake. Ew û çend hevalên xwe bi hecma yekrûpelî rojnameya *Kurdistan* diweşînin. Ew vî karê han 13-14 salan didomînin.

Dr. Rehîmê Qazî, ev romana bi navê PÊŞMERGE, di salên xwe yên koçberiyê de nivîsandiye. *Pêşmerge* cara yekemîn di sala 1960'î de li Êrîvanê û di sala 1962'an de jî li Bexdayê tê çapkirin. Di sala 1964'an de li Bakûyê bi zimanê azerî tê weşandin. Li Kurdistana Iraqê, ji aliyê edebiyatnas û pisporan ve pêşwaziyek baş li romanê tê kirin.

Piştî ketina Şah û hatina Xumeynî, Rehîmê Qazî vedigere Kurdistanê. Ew beşdarî kongeraya çaran ya Partiya Demokrat a Kuristana Îranê dibe û ji bo endametiya Komîteya Navendî tê helbijartin. Di sala 1981-82'an de ji ber hinek sebebên polîtîk ew careke din ji Kurdistanê derdikeve û vedigere Bakûyê. Ew broşurekê bi navê *Mihakemeya Qazî Mihemmed* û pirtûkekê bi navê *Qazî Mihemmed û Tevgera Rizgarîxwaziya Gelê Kurd* dinivîsîne.

Dr. Rehîmê Qazî, di nehê gulana 1991'ê de, ji ber nexweşiya apandîsê li bajarê Bakûyê wefat kir.

Em vê romana ku Ziya Avci ji soranî adapteyî kurmancî kiriye, bi niyeta avakirina pireke edebî di navbera perçeyên welêt de, bi serbilindî pêşkêşî we xwendevanên dilovan dikin.

Bi hêviya ku wê bi dilê we be...

**NÛDEM**

Zivistana Kurdistanê ye, ewqes sir û serma ye ku hindik maye xwîna nav demarê mirov bimeyê. Tu tif dikî dibe qeşa û dikeve erdê. Ewran pêşiya asîman girtine, deng ji zîruhek nayê. Teyr ji çeng û bask ketine, ji bo xwe bihewînin, li gund, deşt û perçepalên çiyan li ciyekî reşbelek digerin. Rêzên çiyan, deştên rast û rewan û ew malên di kolanên wan de dukelên reş derdikevin, bi kefenê berfê hatine rapêçan. Erd, tu dibêjî li muqabilê zulma asîman gazindan dike û dinale, karêzên kaniyan bîhna xwe vedidin û car caran bayekî sar bi ser gund de diheje, ew xortên ku li qeraxên sergoyan û li ber penayê kalaxan ji bo parastinê sekinîne, mecbûr dibin biçin mizgeft û malan.

* * *

Gundê Kanîsewzeyê nêzîkî Seqizê ye û gundekî herî xweş û bi dêmen ê Kurdistanê ye. Dikeve ber perçe pala çiyayekî bilind, her çar aliyê wî bax, mêrg û çîmen in. Ew kaniyên ku ji hemû milan ve diherikin û di palan de bi xure-xur ber bi geliyan ve ber bi jêr dibin û ji geliyên aşan derbaz dibin, spehîtiyeke taybetî ya tabiî dane Kanisewzeyê.

Nêzîkî sed malên biyanî û cot û bend di Kanîsewzeyê de

hene. Hemû kewşenê gund ê axê ye. Çar malên xwediyê cot û bendan bi jina axa re û pênc malên din jî bi kur, keç û bûkên axa te nîvekarî zîraetê dikin. Xwediyê cot û bendan, tenê şeş mal bûn ku xwediyê wê taqetê bin bi şertê ji dehan didu cotkariyê bikin.

Ji biyaniyan jî bîst malan ji bo xwediyê milk û zarokên wî li gor ji sisiyan yekê kar dikirin û yên din jî bi paletî, karkerî û çerçîtî xwe îdare dikirin.

Kek Mamend, yek ji wan biyaniyan bû ku li gor ji sisiyan yekê kar dikir û tam neh mehan bi jin û zarokên xwe ve li ser erda axê dixebitî û bi rojên nemir-ne jî zivistana xwe derbaz dikir.

Lê ew sal, ew sala reş, pişta xwe dabû kek Mamend û ew muhtacê nanê tisî kitibû. Teyrok û kuliyên bêwext û jenga heta ber xemaman temamê dexil pûç kiribû. Ew tutina li berpala çiyê ku bi bezaran zehmetî tê de hatibû xwarin, garana mala axê ketibûyê û hemû perçiqandibû.

Kek Mamend çend caran çûbû li ba axa ku bi qerz çend bar genim an ceh bidê, lê axa dayîna bi qerz genim û ceh deyne milekî, bi ser de daxwaza heqê ga û cotên xwe jî jê kiribû û bi serbarê vê de, jê re gotibû ku, ew tovê ji bo çandindiniyê dabûyê xesar bûye, gerek bîne û têke enbara wî. Axa ji bo ga û cotê xwe herroj muxtar dişand ser mala kek Mamend. Rojekê Mamend diçe ba axê û jê re dibêje:

– Axa, Xwedê xezeb barand û dexla min ji min sitand. Garana te jî tutina min perçiqand. Keda min û zarokên min ya neh mehan di avê de çû. Niha gunehê te bi keda min, hirçîmayîna jin û zarokên min nayê û bi ser vê de jî tu doza tov, ga û cotê xwe ji min dikî. Axir Xwedê vê qebûl nake! Eger bîst teneke (pût) tovê te tê de çûye, yê min jî zehmetî û keda

salekê tê de çûye. Hemû xelkê gund jî dizanin ku garana te tutina min perçiqand. Axir bê bela be mercê ji sisiyan yekê bi vî awayî nîn e... Ez li asîmanan ji Xwedê û li ser rûyê erdê jî ji te şik dikim, were bike sedeqa serê kurên xwe û li min bibore...

Axa ji wan gotinên Kek Mamend ku bêbna gazind û îtîrazan jê dibatin xeyîdî û ji ber xwe ve niriya û got:

– Erê, kî li wir beye? Werin vê sebabê derêxin derve. Me tu xêr ji sêyekbebriya wî nedît, batiye doza qerzan ji me dike. Heyî, beyîîî, beyî, bibîne ecêban. Wisan dixuyê tu bi wî bêtîmê xwe re çûyî Seblaxê û bûyî pêşmergeî. Ji ber vê tu gotinên bi vî awayî yên mêraniyê li hemberê min dikî. Ne, neee bi serê te ez ji wan natirsim û nahêlim lingên wan li vî gundê bikeve. Ez nahêlim ew cî û warên ku ji bab û bapîrên me ji me re mane ji biyaniyekî rût re bên dan. Kurmanc çi ye ku di muqabilê axayê xwe de xwe însan hesêb bike? Kurmanc çî ye ku bêje ez jî heme...

Xulamên axê bi çepilên kek Mamend girtin û ew derxist derve...

Niha, di çile–kanûna vê zivistana han a xedar de, ew tiştên ku di bîra kek Mamend de, tenê ew bû ku dê çawan ji zarokên xwe re pariyek nan bi dest bêxe.

* * *

Roja din serê sibê, kek Mamend ku temenê wî ji şêst salan derbaz bûbû, siwarê kerê boz bû, di kolanên gund ên tejî berf de ber çiyê ve meşiya. Cil û bergên li ser kek Mamend paltoyek ji sed perçeyên pênekirî, di ciyê piştiniyê de çend perçe kapên di çend ciyan bi hev ve girêdayî, di ciyê pêçek

rîşî de cawekî spî yê ji ber qirêjahiyê reş bûyî û cotek lakaşên ji çermê gayê mirarbûyî bûn. Vî dîmenê ban ji dûr ve feqîrî, rebenî û lêqewmiya siwarê kerê ji hemû kesî re dida nîşan. Mamend, di ciyê karên navtijî, goşt û birinc û gwîz û mewîjan, nanekî reş ê ji arê cehê nebeyî kiribû paxila xwe û serê wî di ber de, car caran li kerê xwe dixist û xwe bi xwe bile bila wî ba û digot: "Heft serî xêzanê min du roj e bê nan û bê xwarin mane û çavê wan tevan li destê min e. Pîrût jî va çend mehin çûye Makûyê û tu xeberek jê tune. Bi çi awayê dibe bila bibe, niha divê di vê zivistana xedar de ez ji çiyê darên berû berhev bikim û bibim bajêr bifroşim û wan derêxim biharê... Eger ez di vê riyê de bimrim jî, ji wê baştir e ku çavê min li destê wî nemerd be. Ez dizanim, eger ez gaziyê Pîrût bikim û wî bikim xulamê axê û ez wî mecbur bikim ew dev ji wî karî berde, dê wê çaxê kar û barên min baş bibin. Lê ez vê nakim û sitoyê xwe li ber wî namerdê natewînim. Çare çi ye? Ez li ber wî bisekinim û hêvî û lavayan ji wî bikim? Ez biçim parsê bikim... ne, neee, ne, parskirin ne layîqê min e...! Dayîka min şîrekî helal daye min, wê ez serbilind perwerde kirime... kula dilê min Pîrût tu li ku yî! Eger te tiştek jî nekiriba, te ê di vê zivistana sar û serma de alîkariya babê xwe bikira..."

Kek Mamend ji bo ku demek zû bigihîje ciyê xwe bi lez kerê xwe diajot:

Deb, deh! zarok birçîne, çavê wan li rê ye...

Kek Mamend nêzîkî çiyê bû. Lê dinya çiqas diçû tarîtir dibû. Ewr wek rêzên ordiyan li pişt yekûdu rawestabûn û hergav li hêviya fermanan bûn. Kek Mamend li asîman nêrî û bi dilekî tejî ber xwe ve got: "Xwedê bike nebare, hekene dê zarokên min ji birçîna bimrin, çavê wan li riya min e..."

Lê asîman guhê xwe neda hêvî û lavahiyên wî. Befr û bagerê dest pê kir. Dinya ronak berê xwe da şeva reş û tarî. Çav çavan nabîne. Çi gava rêçeriyek tê dîtin, di cî de befir ser digre û ew wenda dibe. Kerê boz ji taqet ket û herdu guhên xwe yên sor şor kirin sekinî. Kek Mamend berê xwe da kerê boz û got: "Ker ker e... ey mexluqatê bê zehr û ziman, ma tu fehm nakî ku tu jî wek zarokên min birçî yî, ez çi dixwim tu jî wê dixwî... em herdu jî hûne cehxwer!!! çuh, çuh..."

Lê ew gotin di guhên kerê boz de nediçûn xwarê, êdî taqeta meşê di çokên kek Mamend jî nemabû. Kek Mamend berê xwe da hewayê û serê xwe ber bi asîman de bilind kir û got:

– Xwedê, ez çi bikim! ez vegerim, ew zarokên çavên wan li riya min dê ji birçîna bimrin, eger ez venegerim jî ne taqeta min ne jî ya kerê min ber bi çûna jor ve nemaye. Ya herî baş ew e ez xwe bigihînim nav şikevtekê û çaverê bim ku dema berf û bager sist bibe, ez hiçim nav daristanê û daran herhev bikim...

Kek Mamend bi halekî seyîtî xwe gihand hundurê şikevtê û xwe tê de hewand. Lê befir û bager nesekinî. Kek Mamend şeva xwe li wir derbaz kir. Şevê her car û car serê xwe ji şikevtê derdixist û li hewayê dinihêrî. Demek nêzîkî nîvê şevê, dît ku asîman ji aliyê bakûr ve dest bi ronahiyê kir û hêdî hêdî sayîtî dinyayê digre, dilê wî xweş bû û di dilê xwe de got: "Welleh dê sibê tav derkeve û ez ê bi hêsanî bikarim daran berhev bikim..."

Sir û serma hewayê, hêviya derketina tava sibê, berhevirina daran û destbileziya gihîştîna hawara zarokên xwe, nedihiştin xew bikeve çavê kek Mamend. Mamend di derya xeyalan de xerq bûbû û difikirî û xwe bi xwe diaxift û digot: "Mirov

nizane heta mirinê çi tê serî. Tu kes nizane ka ez niha li ku me û ji bo xatirê pariyek nan di vê sermaya han de min xwe kiriye vê kona han û ez çaveriya derketina rojê me. Bi Xwedê dê rojek bê emê ji vê felaketê rizgar bibin. Vêca were li vî halê binêre, niha ez di vê sir û sermayê de li hêviya derketina rojê me, gelo axa li hêviya çi ne? Ez li pê bidestxistina pariyek nan im, lê ew li pê nêçîra kêroşkan in ku sibê berê şefeqê biçin û nêçîrekê bi dest bixin. Vêca wan kincên hevrîşim li tajiyê xwe rapêçane û di ciyên germ de dihewînin, lê ez di vê şikefta han û di bin vê sir û sermayê de, doşeka min erd û lehêfa min asîman e û min li xwe werandiye û ez dikim nakim min nagre... Hey mala te xera bibe nedarî, hinava te reş bibe desttengî, ca tu bi Xwedê kî ev jî jiyan e, welle halê seyan ji vê xweştir e...".

Kek Mamend, car caran Pîrûtê kurê xwe dianî ber çavê xwe, di saya wî de ronahiyek dipekiya ser dilê wî û digot: "Wey ez kor bim, tu li ku yî Pîrûtê ruhê min? Ne dûr e ew karê ku we dest pê kiriye tê de ronahiyek ji feqîran re bê dîtin. Kurê xweşik ma ne tivinga te jî heye...".

Di nav axayên kurdan de bi tajiyan çûna nêçîra kêrwoşkan xwediyê tertîbek taybetî ye. Li çi gundekî û li ba çi kurmancekî tajiyek pêsivik hebe, axa bi çi mercê be hewil didin ku ew bidest bixin. Gelek caran di nav axayan de li ser tajiyan girê û astengên mezin diqewimin û ji bo reqabeta bi hev re carnan bihayê tajiyekî ji yê hespekî baş derbaz dibe. Vêca diziya tajiyan jî tiştekî seyr e. Eger hat û kurmancekî tajiyê xwe nefroşe axê, hewil tê dan ku ew tajî bê dizîn. Axa, ji bo xwedîkirina tajiyan tajîvanekî digre. Qerwaşa jina axê kinc û ristên hevrîşim ji tajiyan re didrû, ji bajêr perçeyên hevrîşim ên

hûnandî û perrikên zîv pê de kirî jê re tînin. Nanpêja mala axê dibê hemû wextê nanê destpêkî yê germ yê tendûrê bide tajiyan. Çunkê meşhur e û dibêjin ku: "tajî bi nanê tendûrê yê germ beza dibe".

Demên zivistanan, wextê ku befir dibare, axawet gelek bi dab û dezgeh xwe ji nêçîrê re hazir dikin. Ew şeva ku befir dibarî, li dîwanxaneya axê wek ku şahî û aheng hebe bi wî awayî bû. Wê şevê heta sibê xew nakeve çavê xulêm, qerwaş û seyîsên (meyter) axê. Xulam carinan li asîman dinihêrin û di derheqê hewayê de axa agahdar dikin. Qerwaş ji bo nêçîra sibê kade, qûbûlî, xwerîsa şêrîn û qilûçên xweşik hazir dikin. Seyîs, alif dide heywanan û ew mehes dikin, teng, lixab û rikêfa wan ber çav re derbaz dikin û kincên axê lê dikin.

Di zivistana sala 1945an de, eynê ew şeva ku kek Mamend ji bo xatirê bidestxistina pariyek nan bi kerê xwe ve di wê sir û sermayê de xwe kiribû kona şikeftê û wek tîrê subhanê diricifî û zarokên wî li mal birçî mabûn, li mala Qerenî Axa yê xwediyê Kanîsewzeyê bi kêf û xweşiyek ji bo nêçîra kêrwoşkan a sibê re tedarik dihatin kirin.

Wê salê, Qerenî Axa bi lezzet, kêf û xweşiyek taybetî xwe ji nêçîrê re hazir dikir. Çunkê ji payîza çûyî ve bi du telîs genim û dused tûmen pere ji kek Senî yê xelkê Kanîkûzele Guleşîn kirîbû û dê cara yekem di nêçîra sibê de tecrube bikira. Divê bi girrina kêroşkekê tola wî genim û pereyî ji axê hilîne...

Mala Qerenî Axa li milê herî jorê yê Kanîsewzeyê bû û kele û xaniyekî bilind ê duqat bû. Kele û xaniyê axa du perçe bû, perçeya yekan jê re enderûn digotin, ku jin, keç, hûk û qerwaşên axê tê de diman. Ew beş di nav hesareke mezin de bû û ji gund ve nedihat dîtin. Perça din jî, ku jê re bîtûn di-

gotin, li bemberî gund bû, dîwanxane û bergeba xanî li wirbû. Axa, bi kur û xulamên xwe ve li wir diman.

Wê şevê fermanderê dayîreya jendirman ê Seqizê sergord (bînbaşî) Şimînan jî bi çend zabitên din ve bi mêvanî batibûn ba Qerenî Axa. Sergord, miroveki dirêj, req û reştebleyê zirav bû, ewqas beşîş kêşabû ku berdu çavên wî yên biliqî û qermîçekên wan ji dûr ve diyar bûn, wek nûkilê bûqelemonê dibatin xuyakirin û ewqas jar bû, bi pifekê dikarî bifiriya.

Dîwanxana axê bi xalîçe û mebfûrên mezin û sipebî hatibûn raxistin. Di nav dîwanxaneyê de çar sitûn hebûn, her sitûnek çend balge li ber hatibûn danîn û doşekek biçûk li ber hatibûn raxistin. Di konceke dîwanxaneyê de radyoyek baterî hebû. Ji ber dumana cigaran temamê arîk û dîwarên dîwanxaneyê reş bibûn. Çend lambeyên dufitîl yên neftê dîwanxane ronî dikirin. Sobeya ji mefreqê ku tejî dar kiribûn, qirçe qirça wê bû û herçar aliyên wê wek pelên êgir sor bûbûn.

Meclisa qumarê germ bûbû. Sergord Şimîranî, ku pisporekî qumarê bû, di kaxezçêkirê de Şeytan tîn dibir ser kaniyê dîn vedigerand. Çûn û hatina wî ya li mala Qerenî Axa gelek zêde bû. Ew qazanca wî gihandibû Qerenî Axa û kurên wî, hînkirina wan a bi qumara pokerê bû. Qumara pokerê jî xêr û bereketa dema Şerê Cîhanê yê Duyem bû ku, ji aliyê Ingilîz û Emerîkiyan ji xelkê Îranê re hatibû dan.

Sergord Şimîranî, Qerenî Axa, kurê axa yê mezin û zabitên din li derûdora hev rûdiniştin û her yekî ji wan komek perên kaxezî didanîn pêşiya xwe û bi leyîstina pokerê mijûl dibûn. Qerenî Axa nizanîbû ew gotinên di leyîstika pokerê de dihatin gotin baş bi kar bianiya. Gotinên gelek ecêb dikirin. Di ciyê "dupêr" de digot "du per", di ciyê "fûl" de digot "fîl", di

ciyê "rêst" de digot "rist" û di ciyê "çêp semwar" de digot "ceh semawer" û yên din. Vêca wî ew gotin gelekî nazik digot û wisan dida xuyakirin ku te digot qey bi ingilîzî dizane.

Ew menqel, hoqqe û maşeya li tenişta sergord Şimîran hatibû danîn, dêmeneke taybetî dida dîwanxaneyê. Sergord, ji bo ku di esnayê leyîstina pokerê de xewa wî neyê mijek li xeşîşa xwe dida û car caran Qerenî Axa jî mijek lê dida û diniriya û bang dikir, çay dixwest:

–Kuro, kî li wir e?

Xulam ku li pêşiya xanî rûdiniştin, her wext guhê wan li nirîna axa bû û bersîva wî didan:

– Qurban tu çi dixwazî?

– Çayê bînin, çayê!

– Belê qurban!

Qerenî Axa û kurê wî, mexsus ku dilê zabitan xweş bikin çi perên li pêşiya wan bû wenda dikirin. Qumara pokerê temam bû. Serokê jendirman û efserên din temamê peran kirin bêrîka xwe. Dema nanxwarinê bû. Qerenî Axa cardin bi wî dengê nexweş nirand:

– Kî li wir e lo? Nên bînin!

Qasek bi ser de derbaz bû, her yek ji xulaman sîniyek tejî goşt–birinc, tirşik û dew li ser ketin hindur, sênî danîn ber wan û bi destbesteyî li hewşa ber derî sekinîn. Axa û mêvanên wî bi mirçe–mirç mijûlê xwarinê ne. Wê şeva dereng mirçe–mirça devê axa ji serê din ê dîwanê dihat sehkirin, pariyên wisan li birincê didan, te digot gore û kelaxekî mirî dîtiye. Ji nav pariyên wî dilop dilop ron dirijiya û lêva wî ya jêr û hemû derûdora simbêlê wî ji ber şilahiya rûn dibiriqî.

Xulam ku bi destbesteyî sekinîbûn, çavê xwe kiribûn devê axê û yên mêvanan û ji çavên wan dihat xwendin ku dibêjin:

"Wey hûn quzulqurtê bixwin, dê bes hikin, tiştekî jî ji me re bihêlin. Axir danê xwarina me bermayê we ye, hekene jina axa sîniyek din xwarina cihê ji me re naşîne. Bes e, bila ji we re bibe kerrafî, bes e xwe bidin paş!...".

Xwarina şevê gelek kêşa. Piştî berhevkirina sîniyan, ji nû ve çayek gelek bi dem li pêşiya axa û mêvanan hat danîn û rejiya menqela xeşîşa sergord jî hat nûkirin.

Hemû hewl û xebata Qerenî Axa ew bû ku, mêvanên wî wextekî xweş derbaz bikin û dema ku qurte qurta wî bû çay vedixwar, gaziyê xulamekî xwe kir û jê re got:

– Heme Çewre, ka kilameke Şikakiyan ji me re bêje.

Heme Çewre dest pê kir:

"Delê heyê lolo, heyê lolo, heyê lo nemînim li ber vê dinyayê...
Delê ba ba derê, li min derê eman
Sed ne'let bê li wan kesan
Ji ser ve birayê giyanî–giyanî
Ji bin ve temahî dikin bi me'şuqa dostê biraderî
Delê heyê lo, heyê lolo nemînim li ber wê xezemşorê heyê hooo...

Heme Çewre, du–sê bendên din jî gotin, lê Qerenî Axa hîs kir ku xweşa sergord naçe, bi îşaret Heme Çewre têgihand ku bibire û derkeve derve.

Pişt re axa mesela nêçîra sibê avêt ortê û bi kurên xwe re li ser kifşkirina heqê nêçîrkêşan (temal) sekinî. Her çend Qerenî Axa dixwest heqê nêçîrkêş gelek kêm be, lê ji bo ku kurên wî xwe li hemberê xulaman merd bidin nîşan, hewil didan heqê nêçîrkêş zêde be. Piştî xir–cirek zêde heqê nêçîrkêş 50 tumen hat birîn û biryar hat dan ku rista Guleşîn di destê Babekir Axa yê kurê Qerenî Axa yê mezin de be.

Di vê muddeta han de, ku Heme Çewre kilam gotin û di navbera axa û kurên wî de asteng û muşkilê hebûn, fermanderê jendirman pala xwe dabû balgiyê û lez bi lez nefes li hoqqeya heşîşa xwe dida û ketibû nav deryaya xeyalan. Guhê wî qet ne li wan gotinan hû û çavê xwe ziq bera xalekê dabû û dema ku Qerenî Axa got ku çayê bînin, ew hişyar bû û bi ser xwe de hat û bê ku gotina "axa" bi kar bîne, got:

– Qerenî, bi rastî tu miroveki kêfçî yî...

Qerenî Axa di cî de gotina fermanderê jendirman birî û ji bo xulam û kurên wî ew gotinên wî yên sivik seh nekin, berê xwe da wan û ji wan re got:

– Derkevin û ji bo nêçîra sibê xwe hazir bikin.

Sergord bi mexseda Qerenî Axa gihîşt û hinek din jî serbest hereket kir û bêyî jê şerm bike û wî însan bihesibîne, dest bi axaftina xwe kir û got:

– Ey peder sexteyê ehmeq! Tu qet dizanî ku beta niha bîst û pênc kes ji gundê te çûne Mahabadê û bûne pêşmerge? Li gor ew deng û behsên gihîştine me, hêzên pêşmerge Bûkan girtine û ber bi Seqizê ve tên. Mirov dibêje tu agahê te ji dinyayê tune. Mirov evqas jî gêj dibe? Di demek wiha de bi vî awayî bi dem û dezgeh ve xwe ji nêçîrê re hazir dike? Tu qet wê dizanî ku hinek kesên dewlemend ên Seqizê ji tirsan bargeh û biniyên xwe dane hev, dikin ber bi Tehranê ve biçin? Tu jî di guhê gê de yî. Qesem bi cûbbeyê paşa, eger pêşmerge bên vir, dê halê kûçikan bînin serê te ûdê ava serê te germ bikin. Ew rojnameya kurdî ya li Mahabadê derdikeve lîsteya hemû axayên ku xizmet ji Şahînşahî re kirine, nivîsandibû. Navê te li ser ê tevan re bû. Rojnameyê we welatfiroş û kasealêsê ber deriyê paşa binav kiriye. Tu dizanî ku ez dostê te me, ez ji bo qenciya te dizanim ku gelek e tu hinek hîşyar

bî û belko...

Di vê navê re Şimîranî, bi maşa desê xwe de agirê menqelê xweş kir û ji nîvê dilê xwe ve mijek li hoqqeyê da û dumana wê daqurtand û pişt re ji kona poz û devê xwe ve duman ber bi Qerenî Axa ve berda. Di wî kerî de ewqas mahir û pispor bû ku, wî wek sen'etkarekî herî baş ev wezîfeya han bicî dianî.

Qerenî Axa, piştî vexwarina dumanê berkenek hatê û destê xwe bi simbêlê xwe de anî xwarê û fikra fermanderê jendirman bi vî awayî temam kir:

– Yanê tu dibêjî ez xwe ji çûna ber bi Tehranê ve hazir bikim?

Fermanderê jendirman bi hejandina serê xwe da xuyakirin ku Qerenî Axa ew fehm kiriye.

Qerenî Axa yek ji wan axayan bû ku piştî têkçûna dîktatoriya Riza Xan, siwarekî zêde ên çekdar ji xwe re dabûn hev û hemû wextê sed siwarên hazir û amade pê re bûn.

Qerenî Axa, di eksê beşa piraniya axayên Kurdisranê, piştî têkçûna dîktatoriya Riza Xan, xulametiya hukumetê bijart û di ciyê wergirtina çek û qurixan her meh pereyekî zêde jî distand. Qerenî Axa li melbenda Seqizê bûbû çovê destê hukumetê û çend caran hereketê gundiyan dabû ber gulleyan. Qerenî Axa, ji ber ruhê welatfiroşî û karên xerab, dîqqeta karbidestên ingîlîzan jî kêşabû ser xwe û çend caran karbidestên ingilîzan ji Sine û Kirmaşan bi navê "mêvanî"yê hatibûn mala wî û emaneta pêwistiyê dabûnê...

Qerenî Axa ku bi berken guhê xwe dabû gotinên serokê jendirman, mijek li cigara xwe da û bi de'ye û teşexxûsek taybetî berê xwe da mêvanê xwe û ji bo şarezatiya xwe ya di zîmanê farisî de îspat bike, bi kurdiyeke farisî têkelkirî got:

– Cenabê reîs, eger tu kes nezane, lê tu bi qehremantî û merdayetiya bendê xwe beledî. Du sal berê niha, dema ku kurmancên Pabûrehnan dixwestin şaxê komelê li vir vekin, min karekî wisan anî serê wan ku bayê neanîbe serê konên kevin. Min di orta nîvroyê de du kes ji wan girtin. Temamê gundiyên derûdora Seqizê bi vê tirsiyan. Tu kes li ber min nikare bêje ez heme. Gelek mixabin hê te xulamê xwe nas nekiriye. Qurban, xulamê te di muqabilê wan de begzade kutenî, kilke newtênem û her eyê tînmewe. Di nav kurdan de banzdan 'eybek mezin e. Kesê ku banz hide di nezera wan de ji jinekê kêmtir tê hesêb kirin. We jî ku ji Tehranê teşrîf kiriye û hûn hatine, Xwedê selametiya we bide, her wext fikra firarkirinê di mejiyê we de ye...

Di vir de fermanderê jendirman gotina Qerenî Axa birî û bi awakî hêrs jê re got:

– Xefê şû, merdîkê (devê xwe bigir, mêrik) bê şu'ûr...

Navek re herdukan serê xwe kirin ber xwe û dîwanxane bêdeng bû. Qerenî Axa cigara di destê xwe de avêt û yeka din vêxist û bi dukela cigarê hinek ser bi xwe ve hat û serê xwe hilda û got:

– Cenabê serkar! tirs lazim nîn e. Siwar û yekîneyên min ên çekdar li Seqizê ruhê pêşmergan derdixin, we e'lehezretê Xumayûn xeledellahû mulkuhû î'tîmadekî fewqûl'ela bi me heye. Ba xusus ew tankên ku li memalikê Emrîka anîne pederê pêşmergeyan dişewitîne. Çekdarên we hene, topên we yên awa awa yên dûravêj hene. Hêzên pêşmerge tenê xwediyê tivingek rût in. Gulleyên tivingên wan tesîrê li tankên we nakin.

Piştî van gotinên Qerenî Axa yên bi farisî lê bi awayê kurdî, ev şiîra Se'dî xwend:

"An ne men başem ke rojî ceng bînî piştî min
An menem kender meyanî xakûxmên bînî serî"
("Ez ne ew kesim ku di roja cengê de pişta min bê dîtin
Ez ew kesim ku serê wî di nav ax û xwînê de bê dîtin".)

Fermanderê jendirman ku ji ber kêşana bêsekin a heşîşê wek golikekî lê hatibû, herdû lingên xwe dirêj kirihûn û pala xwe dabû balgiyan û ji xwe mezinkirin û pozbilindiya Qerenî Axa hêrs bûbû. Bi dengekî noze noz dest bi xeberdanê kir:

– Hey malwêran, hey mal lê xerabiyo, tu dibêjî te kurdbûna xwe jî jibîr kiriye. Qet par ne pêrar jî nayê bîra te. Qey jibîra te çûye, Ehmed Xan li Seqiz bi xenceran çawan tankên ordiya Şahînşahî bêkêr kirin. Ew kurdên ku ez nas dikim, tankê deyne milekî, heta xewfa wan ji firokan jî tune, tirs di çavê wan malxeraban de tune.Wekî mûriyan bi tankan ve hildikişiyan û bi xenceran şoferê wê kuştin. Niha jî kelaxên wan tankên ku kurdan wan bi xenceran xirdûxwaşî kirine li kolanên Seqizê hê mane û gundî ew bi tevr û çêkûçan perçe perçe dikin û dikin gêsin. Mimkûn e gêsnên piraniya re'yeta te jî ji hesinên wan tankan bin...

Serokê jendirman ku ev gotin digotin, di dilê xwe de jî di nav tirsê de bû û devê wî ziwa bû û ji bo ruh pê de bê nefesek din li heşîşa xwe da û qurtek çay ser de kir û cardin dest bi xeberdana xwe kir:

– Vê jî bizane ku, Qazî dest bi siyaseteke baş kiriye û mala me xera kiriye. Temamê eşîretan lihev aniye, beşa piraniya wan ber bi şoreşê ve kêşaye û niha ew jî bi siwarî û bi çekên xwe ve dikevin nav hêzên pêşmergan. Ji Kurdistana Iraqê herroj deste deste kurd tên Mahabadê û dikevin nav hêzên

pêşmergeyan. Ew Barzaniyên ku dijminê xurt ên Melik û ingilîzan bûn û li Iraqê tu rehetî nedan ingilîzan, niha di nav rêzên bereya pêşmergeyan de nin. Em gelekî bi hêvî bûn ku, hêza pêşmerge ser nakeve û dê bêserûberîtî di nav wan de çêbe. Lê ew zabitên kurdan ên ku ji Iraqê hatine Mahabadê, di nav hêzên pêşmerge de qanûn, qayîde û rêçek wisan ava kririne ku temamê zabitên ordiya Şahînşahî jê şaş mane. Ev zabitên han bi awakî wisan şarezayê fenên leşkeriyê ne ku, beşa piraniya sertîp û serleşkerên me avê li destê wan dikin.

Wellehî di nav wan de çar zabit ên navên wan Izzet, Mustefa Xoşnav, Xeyrullah û Mihemmed Mehmud hene ku, di zanistî, tedbîrî, şarezatî û azayetiyê de kesên wisan in ku di dîroka ordiyan de wêneyên wan kêm hatine dîtin û gelek zabitên me yên bi nav û deng ji tirsa wan ji xwe re li konên mişkan digerin...

Qerenî Axa ku bi dîqqet guhê wî li wan gotinan bû, bi çavekî xezeb û bi hêrs li ser, dev û çavên lihevketî yên Şimîranî dinihêrî û qet kêfa wî ji gotinên Şimîranî re nedihat. Qerenî Axa dixwest behsek din bavêje ortê û mijara axaftinê biguherîne, lê fermanderê jendirman firset nedayê û got:

– Erê baş hat bîra min. Ew Pîrûtê ku ji re'yeta te bû û li melbenda Seqizê sitar û tebata wî tunebû, niha li ku ye? Ew mirovekî çavsor û netirs e...

Fermanderê jendirman bi awakî wisan ew gotin got ku, dixuya dilê wî gelek ji Pîrût tijî bû û bi hilanîna navê wî tevzek di laşê wî de hat xwarê.

Qerenî Axa di bersîva xwe de wiha got:

– Qesem bi serê Şahînşahî, min hal û ehwalê Pîrût ewqas perîşan û pejmûrde kiriye ku, ew bi tu awayê bi wê serwetê nikare dijîtiyekê bike. Min bab, dayîk û malbata wî duçarê

derd û elemek wisan kiriye ku bi tu mercek qudreta xelasiyê ji wan re tune. Vêca bila Pîrût jî biçe Mahabadê û bibe pêşmerge.

Êdî şev gelek dereng bûbû. Qerenî Axa ji bo ku dilê fermanderê jendirman xweş bike û ji derd û kûlan dûr bêxe, jê re got:

– Cenabê serkar! dilê xwe neêşîne, tu li kar û kirinên xwe binêre. Tu hinekî îstîrahet bike, emê nêzîkî beyana sibê biçin nêçîra kêrwoşkan dê ew hemû diltengî û xemgîniya dilê me ji me bidin jibîr kirin. Ji bo xatirê dilê serkar emê sibê Guleşîn bibin nêçîrê...

Piştî saetekê-du saetan rabûn. Axa, fermanderê jendirman, zabitên din, kurên axê û deh–panzdeh xulaman ve siwar bûn û ji bo nêçîrê ketin rê. Çend ji wan siwaran bi zincîrên tajiyan girtibûn, du kesên din jî hêştirên bi bar siwar bûbûn. Wan tim hewil didan ku ji axa û sergord dûr nekevin, ji ber ku dema daxwazek wan bi av û xwarinê hebûya dê ew pêk bianîna...

* * *

Pîrût, xortekî bejinbilind, çarmil, xwediyê çav û biriyên reş, singpehn, exlaqxweş û nefsbiçûk bû. Pîrût di nav xortên Kanîsewzeyê de gelekî bi rêkûpêkî û bi quwetiya xwe dihat nasîn. Wextê zivistanan gundî li ber deriyê mizgeftê berbev dibûn, li ser sergoyê mala axê yê li nêzîkî mizgeftê, bi xortan guşttilî didan gittin. Pîrût temamê xottên hevsalên xwe davêt erdê û tu kesî nedikarî pişta wî bitewîne û dayne erdê. Pîrût xwediyê simbêlekî reş, zirav û gûrr bû û gelek caran dema ku dihat nav xelkê, digotin: "ha, pehlewanê simbêlba-

birî hat!".

Pîrût, heta sala ketina Riza Xan ji ser text, li Kanîsewzeyê bi Mamendê babê xwe ve mijûlê kar û kespa zîraetê bû. Her eynê wê salê, kek Mamend dixwest wî bizewicîne. Lê bûyerek wisan qewimî ku şahî û xweşî bi ser neketin...

Xortên kurmanc ên feqîr gelek caran dikarin tenê bi du riyan bizewicin. Eger di mala wan de keçek hebe êdî bîr û fikra wan a ji bo zewaca kurê xwe namîne. Mezinê malê bi riya berdêlî kurê xwe dizewicîne. Ew xortên di mala wan de keç tune, gelek caran mecbûr dibin keçê birevînin. Dema ku keçikê direvînin jî dibin mala mela yan qazî û pişt re bi riya wan bi bab û dayîka keçikê re li hev tên.

Xwişkeke Pîrût a reş–esmer, çeleng û xwînşêrîn hebû û navê wê Xezal bû. Kek Mamend bi hêvî bû ku keça xwe bide xortekî xwedî xwîşk û pê re berdêlî bikin û Pîtût bizewicîne.

Li gundê Kanîkîsele yê nêzîkî Kanîsewze keça kurmancekî ya navê wê Mirût hebû. Sipehîtiya wê di temamê welat de deng dabû.

Mirût, temenê wê taze gihîştibû hevdeyan. Bejn û bala wê ya wek tayê rihanê, çavên wê yên reş û belek, birû û mijangên wê yên tîr û kevanî, pora wê ya biriqî ya wek reşemarê, eniya pahn û fireh a wek hîva berê beyanê, reng û tûyê wek keskesora piştî baranê, lêva sor û xalê reş ê pasewanî, diranên wê yên wek Behra Ummanê, çala çena wê ya wek zîndana xortan, cote memikên wê yên wek hinarên negihiştî yên kal, bejinzirava sipehî, nazik û nazenîn, zend, poz û piyên biçûk ên wek befrê tejî ji bazind û xirxalan, kena wê ya wek bulbulan, meşa wê ya wek mehîna kehêl û mêkewên çiyayên berz û bilind ên Kurdistanê, bîhna sosin û beybûnên wê dilê hemû xortan xayîs dikir. Ewqaz nazik, nazdar, exlaqxweş, dilo-

van bû ku, çi kesê çavê wan lê biketiya, xeyrê îxtiyarî disekinîn û li wê dinihêrîn. Dema ku mirov li qama wê ya birûmet dinihêrî, te digot kaniya xwînê tê de dikele û mirov wek eynika ji kevirê xwe tê de didît û ji ber sipehîtiya wê şerm dikir. Lê, wek hemû keçên kurdan qet ji nemehremî û rûmeta xwe tiştek wenda nekiribû. Terbiye û me'rîfeta Mirût hinekî din jî sipehîtiya wê zêde kiribû.

Pîrûtê bi simbêlê qeytanî jî navûdengiya sipehîtiya Mirût seh kiribû û ji bo armanca dîtina wê carekê çûbû Kanîkîseleyê. Wê li ser kaniyê dîtibû û dilek nebêje bi hezar dilan aşîqê wê bûbû, lê bi xwe re nedîtibû ku eşqa xwe ji Mirût re veke. Pîrût, ji bo ku xwe nîşanê Mirût bike û dilê wê ber bi xwe ve bikêşe, ji çend rojan carekê diçû Kanîkîseleyê û li nêzîkî qeraxê kaniyê li ciyekê rûdinişt û xwe bi xwe dest bi kilaman dikir. Bi zanetî ew kilamên li ser eşqê û dîlberan bûn digot:

Ji dûr ve diyar e perçema te ya xavê
Ez dîwane kirim bi koşê çavê

Xweziya min li wan kesên ku cîranê te ne
Bi şev û bi roj agahê te ne

Piştê vê Pîrût dest bi kilamek din kir û got:

Ez çiqas dikim fikir û endîşeyê
Dûrketî ji mirov, mam û qewmîtiyê
Di dawiyê de ketim halê derwêşiyê

Mala min wêran kirin çavê
Dîwane bûm ji bo zulfên xwavê
Ez ê hejar ketim davê

*Çavê te reş in xumale ne*
*Memikên te sêvên bi darê ve ne*
*Xwedê daye neveşêre wan ji me ne*

Hatin û çûna Pîrût a zêde li Kanîkîseleyê û ew sitran û kilamên ku li qeraxê kaniyê bi dengekî xweş digotin, gurpe–gurp ji dilê Mirût anîbû û wê jî hez dikir demekê zû Pîrût bibîne û guhê xwe bide sitranên wî. Pîrût bi riya çend pîrejinan re hîn bibû ku birayekî Mirût ê çend sal ji wê mezintir jî heye û vê hê zêdetir dilê wî xweş kiribû. Çunkê dê bikariya biriya berdêlî re bigihîştiya mirazê xwe. Wî ji xwe re eyb hesêb dikir ku bi riya keçrevandinê bizewice, çunkê wî dizanî Mirût ne ji wan keçan e ku bireve. Pîrût dîn û sewda bûbû, her çiqas taqet dikir, lê ji ber sipehîtî û biheyatiya Mirût bi xwe re nedidît û evîniya xwe jê re veke û gotinên wê jî seh bike.

Roj nêzîkî êvarê bû, Mirût bi cotecêrên ser milan ve hat ser kaniyê û dît ku, va dengbêjê wê bi kul û keder li rexê kaniyê rûniştiye û çavên wî li şebeqa rojê ye ku dike here ava. Ji xeyrê Mitût kesekî din li ser kaniyê tunebû. Mirût wek tawûsê ketibe sed rengan, bi dengekî nerm û lerzok berê xwe da Pîrût û got:

– Erê, gelo tu çima wisan bêdengî û kilamekê nabêjî...

Pîrût, ku di nav kûrahiya deryaya xeyalan de bû, bi sehkirina vî dengê han bi ser xwe ve hat û tevzek wisan giran di bedena wî de hat xwarê ku ew şaş û gêj kir. Lê zû xwe da hev û hîşyar bû, bê îradeya xwe dest bi vê kilamê kir:

Eger tu bizanî halê derdê min
Girîn dê te bigre ji zeriya halê min

Binivîsin li ser kêla tirba min
Ez şehîdê eşqê me nekin cefayê li min

Ez çiqas bi dil dikim ku pîr nebe
Destê min li memikan gêr nabe
Lê çi bikim dil dîwane ye jîr nabe

Çavên te ji biriyên te reştirin
Ew ji marên reş jî hişyartirin
Hemû rojê riyan li ber min digirin

Pîrût çend ferdên din jî got, bêdeng bû û rabû ber bi Mirût ve hat.

Pîrût, tam li muqabilê Mirût li milê din yê kaniyê sekinî û ava kaniyê ya zelal ya wek çavên kêvjalê ku bi xure xur di ber wan re diherikî, wek wênekêşekî herî şareza wêneya wan herdu ciwanên xama yên li rexê wê sekinîbûn dikêşa. Pîrût cara yekê bû ku evqas ji nêzîk ve çavê wî bi gula dilê wî diket û bi dîtina bin çavan a bi hezar me'neyan dagirtî ya wê nazdara şox û şeng, pirça reş û hûnandî ya şevê, biriyên wek hîva yekşevî û hinarikên wê yên wek hinara sava çiqas diçû zêdetir şid û şidayî dibû. Pîrût, li nêrîn û temaşekirina Mirût têr nedibû. Nevak re sekinî, li milê din jî Mirût serê xwe kiribû ber xwe hêvî bû ku Pîrût tiştekî bêje. Pîrût, rengek da û yek sitand û ewqas perîşan û nerehet bû ku, ji bo ku bikare xwe rabigire tiqe–tiqa wî bû kevirên biçûk diavêt nav kaniyê û bi wan peşkên avê ku car caran ji ber derbên kevirên wî ji kani-

yê dipekiyan û dûr dibûn, li rûyê Mirût diketin û dilê wî ehwen dibû. Êdî Pîrût nekarî xwe lê rabigire û berê xwe da Mirût, bêyî ku tu destpêkek têke navê, raste rast û her wek tu şerm û 'eybek pê re runebe, got:

– Erê ruhê çavbelek, tu dixwazî bi min re bizewicî? Wellehî ji hesreta te wexte ez wekî mecnûnan li çiyan bikevim û tu sebr û tebat li min nemaye. Dê, tu bi Xwedê bikî zû bersîva min bide û birînên dilê min ên xedar û cergê min ê ker–ker carek din jî kul neke.

Pîrût navek re bêdeng bû û bêyî li hêviya bersîva Mirût be, cardin got:

– Ev ni'meteke gelek mezin e ku birayê te heye û ya min jî xwîşka min heye. Hekene Welleh ez ê mecbûr bimama û min ê tu birevanda. Şukir ji Xwedê re ku ez ji vî karê qirêj ê şermezarî rizgar bûm. Ax ez çi bikim, destê min teng e, hekene dê min bi heft deste zurne û dehul û heft şev û heft rojan dawet û şahîniyek wisan çêbikira ku di temamê dinyayê de deng bidaya. Dê tiştek nabe, Xwedê ji Sultan Mehmûd mezintir e. Bila dil li ba dil be, malê dinyayê ne tiştek e. Ez çawan sibê vegerim, ez ê çend bar dar bibim Seqiz, bifroşim û bi wan peran morîk û xişiran ji te re bikirim. Piştê rakirina hasilara payîzê, înşeallah emê pê şahî bikin û pê şad bibin...

Mirût, ku heta wê demê deng jê derneketibû û ji şerman temamê bedena wê di nav xwîdanê de mabû, bi nerm çavên xwe rakirin, dît ku Pîrût li kaniyê dinihêre, dest pê kir û jê re got:

– Gelo tu çima wiha mat bûyî..?

Ew dengê nizm, xweş û bidil ê Mirût, wek dengê qaz û qulingên qeraxên çeman û qebeqeba mêkewên serê kupên çiyan hat guhê Pîrût. Wisan zanî ku ji ewrên reş jê re xebe-

rek hatiye, ji ber vê berê xwe da Mirût û jê re got:

– Tu dizanî, niha min çi dêmeneke xweş û sipehî ber çavên xwe re derbaz kir. Ew roj hat ber çavê min ku, ez di qirçe–qirça germa havînê de dirûniyê dikim, xwîdanê dirêjim, ez têhnim, dilê min gelekî diçe dew û ji nişka ve dibînim ku, va dîzkek dew li ser milê te ye û tu bi naz û nazenîn ber bi min ve tê...Mirût can, bêje ka gelo dê ew roj bê...?

Pîtût ev gotin kirin û li çavên Mirût nihêrî, dilê wî bi awakî wisan dest bi lêdanê kir ku, dengê lêdana dilê wî hindik mabû herdu guhên wî kerr bikira, lê ew dilavêtineke xweş, tejî hêvî û armanc û bi daxwazên dahatû bûn...

Mirût bêyî serê xwe hilde, ji wan hemû gotin û pirsên Pîrût re wiha bersîv da:

– Filankes, ez nikarim tiştekî bêjim. Mesuliyeta min di destê kekê min de ye. Kekê min çi bêje ez gotina wî dikim...

Mirût ev got û serê xwe hilda û ji bilbisîna çavên wê yên belek diyar bûn ku, ji nîvê dilê xwe hez ji Pîrût dike.

Pîtût ewqas ji evîniya xwe piştrast, dilgerm û bi bawer bû ku, bêyî guhê xwe bide gotinên Mirût ên dawiyê, got:

– Çavreş û çelenga min, vê yekê bizane ku, Xwedê te ji min re û min jî ji te re afirandiye û ez ê sibê ji babê xwe re bidim gotin û bila bê xazgîniyan û te bi xwîşka min re berdêlî bikin...

Êdî roj ji asoyan ava bûbû, tariya şevê dikir perdeya xwe ya reş bi ser dinya ronî de bikêşe. Stêrkan ku nû serê xwe ji asîman anîbûn der, li wan herdu ciwanên dilgeş, gelek bihêvî û xweşik dinihêrî, ku li ser kaniyê sekinîbûn û ji ber dilxweşiya wan ketibûn semayê û bi girje–girja xwe çavên xwe yên fêlezaniyê li wan girtibûn û her te digot bi wê dixwazin bêjin: "hê, hê xwe ji xelkê veşartine, lê haya me ji we heye û hê ji

niha ve me dest bi govend û şahîniya daweta we kiriye..."

Mirût, cêrên xwe tejî av kirin û da pişta xwe û xatirê xwe ji Pîrût xwest û ber bi mal ve çû. Pîrût hinekî din jî li ser kaniyê rûnişt û pişt re rabû û ber bi Kanîsewzeyê ve ket rê. Pîrût mest û serxweş bû. Agahê xwe ji temamê dinyayê birîbû mest û serxweşê eşq û evîna Mirût bû. Pîrût, dema ku ket rê meşiya, xwe bi xwe dest bi kilaman kir û got:

Eger min bizaniya dê tu raketa li çiyan
Dê min singê xwe ji te re bikira doşek şûna ciyan

Va ez diçim, ez û dilê min
Emanet be ji te re, teka gula min

Tavahîvê xweş e, hîv li ser malan
Ku dostê te sipehî be dev jî li ser xalan."

Derengê şevê Pîrût gihîşt Kanîsewzeyê û her çendîn riyek dirêj jî meşiya bû, bi ser çend gir û newalan re derbaz bûbû, lê dilê wî yê tejî eşq û evîn nehiştibû biweste. Pîrût deriyê hewşa malê vekir û hêdî xwe kir nav ciyê xwe, çavê xwe kirin qurmê kêranên xanî û berê sibê pişt re xew çû çavan...

Pîrût, bi riya dayîka xwe Razê, ya di dilê xwe de gîhand kek Mamend. Piştî hevdîtina Mirût û Pîrût, wan çend carên din jî li ciyên xwe yê caran, li ser kaniyê hevûdu dîtibûn. Nasiya Pîrût bi birayê Mirût Şêrko re jî çêbû.

Şêrko jî carekê du caran bi mêvanî hat Kanîsewzeyê û Xezal dît. Herdu alî jî, hem mala kek Mamend û hem jî mala Şêrko bi berdêlî razî bibûn û herdu malan jî hazirî dikirin ku piştî rakirina hasilata payîzê şahî û dawetê bikin...

Lê mixabin...

Mîne Axayê Kanîkîsele, temenê wî ji pênciyan derbaz bûbû. Mirovekî zikmezin û fiş, pozberan, çavbeloq, lêvsitûr, navser û çavên wî girj û devxwar bû. Piyên wî ewqas mezin û zikê wî ewqas fiş bû ku, dema diket hindurê xanî pêşî zik û pozê wî dihatin dîtin, mirov bi vê dizanî ku yê tê hindur Mine axa ye. Çar jinên Mîne Axa hebûn û di enderûna mala xwe de ji her jinek xwe re odeyek veqetandibû û li gor adetan her şev diçû oda jinekê. Di navbera wan çar jinan de herroj şer û qirên bû. Her çendîn Mîne Axa kebantiya malê dabû destê dayîka kurê xwe yê mezin û mifta kîleta hemû xwarin û erzaqan dabû destê wê, lê jinên din guhên xwe nedidan wê û çi çaxê çavên wan bi hev biketa, wek kêtikan li hev dinihêrîn. Roj tunebû ku dema Mîne Axa ji hindur derdiket û dixwest biçe dîwanxaneya xwe, li jinekê nexistiya.

Mîne Axa çend xulamên xwediyê gotin û xeberên xweş girtibûn, bi şev û roj gotinên xweş digotin û henek dikirin. Wî tu carê cigara xwe neditefand. Dema şevê dereng diçû oda yek ji wan jinên xwe jî xulamekî xwe bi xwe re dibir. Wî xulamê gore û kincên axê derdixistin û pişt re dest bi çîrokan dikir û heta xew re biçe. Pişt re jî hêdîka radibû diçû û jina axê diket hindur.

Mîne Axa, her çendîn çar jinên wî hebûn, lê cardin li ciyê xwe rûnedinişt û gelek dêvinpîs bû. Bi wê qerefet û halê xwe ve jî riya jinan digirt û çi jina kêfa wî jê re bihatiya bi desrtika jina muxtarê gund dixwest xwe bigihînê û bi dest bixe.

Sipehîtiya Mirût gurpe gurp kiribû dilê wî kalî. Çi çaxê çavê wî bi Mirût diket û rastê wê dihat, te digot gorê bi askê ve daye, bi herdu çavên xwe yên biloq dimeşiya ser, ji serî bigir heta binî lê dinihêrî. Mîne Axa bi wasiteya çend rîsipiyên

Kanîkîseleyê ji Şêrko re xeber şandibû ku eger ew xwîşka bide wî, dê ew koşkek cihê ji Mirût re ava bike û çi tiştên Şêrko bixwaze dê bidiyê. Lê Şêrko bi tu awayê razî nebibû ku xwîşka xwe bide wî dêvinpîsî. Şêrko û xwîşka wî, herdukan jî dizanîn ku evînî û hezjêkirina Mîne Axa tenê çend roj in. Çunkê heta wê çaxê çend keçên kurmancan ên din jî mehr kiribûn û her yek ji wan tenê çend rojan li ba xwe ragirtibûn û pişt re ew berdabûn. Lê ev karê han bi vê tenê jî temam nebibûn. Mîne Axa, ji bo ku jinên wî yên berdayî bi ru kesekî re nezewicin, xulamên xwe mecbûr dikirin ku bi wan kevnejinên wî re bizewicin. Şêrko bi van tevan dizanîbû û nedixwest xwîşka xwe ya nazdar, bi heya û bi namûs bi destê wî ejderhayê xwînmij ve berde. Şêrko ne tenê birayê Mirût bû, di şûna babê wê de jî bû. Babê wan çend sal bû wefat kiribû û dayîka wan jî salekê piştî mêrê xwe mala xwe ji vê dinyayê bar kiribû...

Mîne Axa destgirêdayî nedisekinî û bi bahaneyekê digeriya ku ew rojekê Mirût bibîne...

* * *

Bihar e... bihara kurdewarî heta Xwedê bixwaze xweş e. Xûre xûra çem û kaniyan, qebe qeba kewan li çiya û pesaran, stiranên bi hezar meqamanên şalûl û bilbilan, hîre hîr û destkola hespên xama yên ji zivistanê derketî li meydanan, kare kar û bare bara bizin û miyên ji hol û govan derketî yên bi hêviya çûna zozanan, hezar deng û ahengên din ên mizgîniya hatina biharê û xweşkirina pîreşivanan bi şimşal û bilûrên xwe ahenga şahî û govendan, yek di bi yekê de bi hezaran naz û xemze ve serîavêtina ciwanên nazik û sava bi rengên

awa û awa li çîmen, bax, mêrg, zevî û berpalên çiyan, li qeraxên çem û kaniyan, destgirtin û li darxistina wan govend û dawetan, ew hemû aviyên ser wan ên dilop dilop dirijin ser erdê û di bin coyên avê yên sed bihên û ruh û berhênerê sergovenda serîhildanên gulan, girtina baxên gulên ciwan bi qure, mezintî û bi naz û nazenîn sergovendiya dawetan...

Di demsala biharê de keçên gundan revde û revde berhev dibin û ji bo pincarên wek dûkalo, gîlaxe, siping, pincar, kereng û ispanax ber bi daristan û qetpalên çiyan ve diçin û ber bi êvariyê her yek ji wan bi çentik, çar û torikên xwe yên tejî pincar ve bi dilxweşî û bi ken ber bi mal ve vedigerin.

Di wê bihara xweş de bû ku dilê Pîrût û Mirût ketihû hevûdu û bi hezar hêviyan çaveriya payîzê bûn ku dawetê bikin.

Mirût, wê biharê ji hemû biharên borî geştir bû, siban ji herkesê zûtir ji xew hişyar dibû û bi destexwîşkên xwe re, ji bo ku ji pincarên biharê xwarinê ji birayê xwe re çêke, her bi daristan û qerpalên çiyan ve diçûn. Şêrko gelek hez ji dûkalo û pincar yên di nav hêkeronê de sorkirî dikir. Mirût jî ji bo xarirê kekê xwe gelek caran ev xwarin çêdikir.

Mîne Axa, wek çawan gur birçî dibe xwe li ber bizinê diqelizîne, eynê bi wî awayî xwe li ber Mirût qelizandibû. Rojekê bangî jina muxtêr kir û jê re got:

– Sibê Mirût hilgire û bi bahaneya berhevkirina pincaran bibe nav daristanê. Bibe wî ciyê ku min paxan kiriye û kesek nikare bikeve navê.

Pîrejina muxtêr, ku yeka weke sihêrbazan bû, bi demarên destê wê yên derketî ji derve, enî û hiriyên qirmiçî, rû û çavên çîrtî li pîrhevokan diçû. Serê sibê rabû çû mala Mirût û li tenişta wê û li ber tendûrê rûnişt. Mirût tenê li mal bû û

Şêrkoyê birayê wê li pê kar û kespa xwe bû. Pîrejinê piştî hinek afixtina ser hal, kêf û sipehîtiya Mirût, dest bi pite pit û gazindan ji halê xwe kir. Ji ber xweşmerdokiya wê wek avê rûndik ji çavên wê dibarîn, te digot belko kurê wê yê ciwan miriye. Mirût, ku bi armaca pîrejina fêlbaz û hîlekar negihîştibû, gunehê wê pê hat û jê pirsî:

– Erê, xaltiya Fatim, ru ji bo çi digrî? Xwedê neke tiştek li we qewimiye û mamê Xile te qewirandiye?

Pîrejinê hinekî din jî xwe belengaz kir û jê re got:

– Nexêr, ruhê min, ez bibim sedeqa serê te, kurê min ê ciwan bimira ji vî halê min xweştir bû ku ez tê de me. Xileyê mêrê min ji xwe tu dizanî muxtarê axa ye, bankirina xelkê gund ji bo ulama axê wezîfeya wî ye, lê gelek caran kesek bersîva wî nade û nayên ulamê. Ew jî ku bêkêfiya xwe li hemberê axa nede nîşan, ez a bêziman kiriye kerê ulamê. Çi çaxê jina axê ji bo malîştina hewşê, şûştina erd û mehfûran, şehkirina hiriyê, girtina zimhêrê, hêrana destarê, lêdana tepikan û paqijkirina dangê, bangê çend jinan bike, ji min zêdetir kesekê jê re nabîne û dibê ez bi vê pîrejiniya xwe biçim û temamê wan karan bikim û serbarê ser de jî jina axê piçek xwarin jî nade û bi bile bil û êrîşa ser Xile ve min derdixe der. Do êvarê min lê nêrî Xile gelekî bi belengazî û neçarî hat mal û piştî ku hinek ji wê avpîvaza bê rûn ku min jê re çêkiribû xwar, berê xwe da min û got: "Jinik, dibê tu sibê biçî nav daristanê û ji mala axê re pincaran berhev bikî. Min ji çend keçan re got lê kesekê bersîva min neda û jina axê jî êrîşê min kir û ji min re got ku, eger ez jê re pincaran nedim anîn dê berata min bibre û min ji kar bide avêtin..."

Pîrejin hinekî sekinî û rûndikên xwe yên derewîn malîn û bi destê xwe çilm û çîrtên ser çav û rûyê xwe paqij kirin û

destê xwe bi pêşka fîstanê xwe zûwa kir, nefesek sitand û dest bi axaftina xwe kir û got:

– Vêca ez goriya te bim, ez pîr bûme û çavên min baş nabînin, ez batime ji te rîca dikim ku tu bi min re bê nav daristanê û alîkariya min bikî, bekene ez tenê bi serê xwe biçim ez nikarim tiştekî berbev bikim û ew malwêran jî dikare me bavêje derve û em rastê êş, derd û eziyetan bên. Vêca ez qurbana te bim, qet nebe bila gunebê te bi xaltiya te ya pîr bê û ez beta sax bim ez vê qenciya te jibîr nakim. Ez hêvîdar im ku belkê Kek Ehmedê Silêman agahê te be, ewladê min...

Mirût ewqas dilnazik bû ku, bi sebkirina van gotinên xaltiya Fatimê û bi dîtina rûndik û bêviyên wê xwe ji girînê zor girtibû. Mirût dilê xaltiya Fatim vekirrî û got:

– Xaltî, ruhê min, xem neke. Ka ez niba tendûrê vêxim û hinek nan pêjim û firavînê jî ji kekê xwe re çêkim, vêca em ê çarên xwe hilgirin û biçin. Kekê min jî ji min xwest ku ez sibê jê re pincêr sor bikim...

Xaltiya Fatimê ku li hêviya van gotinan bû, rûndikên çavên xwe paqij kirin û got:

– Bila ruhê min qurbana te be, beta tu van bikî dê ez jî biçim mal û serekî li zarokan bidim û bêm û pişt re emê biçin.

Lê xaltiya Fatimê di ciyê here mala xwe, raste rast berê xwe da dîwanxaneyê. Mîne Axa nû ji enderûnê derketibû derve û hê çav û rûyê xwe yê çîrt û diranên xwe yên zer neşuştibûn û li eywana ber dîwanxaneyê piyase dikir û çend xulam jî li derûdora wî sekinîbûn. Mîne Axa ji dûr ve xaltiya Fatimê dît û berkenek hatê. Dema ku xaltiya Fatim hat û nêzîkahiyê lê kir, Mîne Axa ji bo ku bizane plana wî serkevtiya yan ne, bêyî bihêle kesek pê bizane jê pirsî:

– Erê, lêêê qelişiyê, tu li çi digerî? Eger karekî te tune here

wê hewşiyê paqij bike, ew tejî pişkûl in.

Xaltiya Fatim bersîv da û got:

– Babê min qurbana te be, ez ê ser serê xwe bikim. Lê ez ê niha biçim nav daristanê pincaran, ez ê sibê hewşiyê paqij bikim...

Mîne Axa têgihîşt ku plana wî ser ketiye. Ew zalim, zebûn û dilkevir ji kêfan wextî bifiriya û pên wî li erdê nediketin û te digot seyê pêşewitî ye...

Xaltiya Fatim a 'efrît, pişt re rabû û ber bi Mirût ve çû û dema ku gihîşt li wir Mirût mêzera xwe girêdabû û çara wê li ser milan bû.

Herdu bi hev re ber bi daristanê ve ketin rê.

Ew kilama li ser mêzerê hebû gelek li wê keça ciwan û sipehî dihat û xeyrê îxtiyarî ew kilam hat ser devê wê û dest pê kir û got:

Mêzera sor û şîn yî
Şermendeyê deriyê Xwedê yî
Serî hilde bê bela bî

Mêzera çend rengîn e
Perçeya wek rengê hingvîn e
Rûyê xwe bide me dil xemgîn e

Mêzera sor û şîn e
Agir min girtiye gelek bêdîn e
Dil eynik e û xwe tê de bibîn e

Mîrûta şox û şeng, nazdar, sipehî, dilpak û ya bi armancek dahatû, bi xaltiya Fatim a rafizî, dilreş û mel'ûn nêzîkî daris-

tanê bûn û ber bi wê mintiqê ve çûn ku bi taybetî ji bo mala axê hatibû paxan kirin.

Mirûta feqîr ku bi hezkirina Pîrût taze tama şêrîniya vê dinyaya han tam kiribû, ji bilî wêne û dilê Pîrût ku, di hindurê dilê wê de cî girtibû, riya ru tiştekî din nedida ku bipeke û bikeve hindurê dilê wê. Wê wek zarokên sava bi çavê zaroktiyê li dinyayê dinibêrî û tenê Pîrût di dilê wê de bebû ku bûbû hêz û taqet jê re û ji jiyana wî pê ve nedikarî fikra tiştekî din bike û bizane ew kevnerafiziya teniştê wê çi davikek li ber wê vedaye.

Pîrejinê bi zanetî, ji bo ku wext derbaz be û tarî ser de bê, gelekî hêdî dimeşiya û car caran jî li ser kevirekî rûdinişt û "bîhna xwe vedida". Dema ku gihîşt navçeya paxankirî ku xaltiya Fatimê ji şeş–heft deqîqan carekê qevdek pincar diçinî, bi sed û ax û daxan li ser pîrîtî û qedera xwe xeber dida.

Roj gelekî ji qamê nîvroyê derbaz bibû. Gavan, avder, cotkar, nator û xebatkerên deştê êdî ber bi gund ve vedigeriyan; deşt, bax û mezra hêdî hêdî vala dibûn. Pîrejinê li milê aliyê rojavayê nêrî û ji dûr ve dît ku miroveki siwarî ber bi aliyê daristanê ve tê û di cî de zanî ku ew siwar Mîne Axa ye. Ji bo ku pîrejin xwe ji ber çavan wenda bike, berê xwe da Mirût û got:

– Mirûta ruhê min, ez ê qasekê biçim ser wê ava xwarê, li hêviya min bisekine û ez ê bêm û pişt re em ê biçin gund, êdî wext dereng e...

Gelek bi ser de neçû, mirovê siwarî nêzîkî daristanê bû. Mîne Axa çawan çavê wî bi Mirût ket, xwe li nezanînê danî û gazî kir:

– Keçê, tu tenê bi serê xwe vê wextê şevê li vir çi dikî? Çawan ciwanên wek te bi tenê serê xwe bên vir. Welleh însan

gelek 'ecêb in, hirçên dirinde jî te bibînin dikarin aşiqê te bibin û te birevînin.

Mirût, ku heta wê çaxê tu wextê Mîne Axa evqas ji nêzîk ve nedîtibû û tenê dengê wî sehkiribû, serê xwe kir ber xwe û dilop û dilop xwîdan jê diweriya. Wê pêşka destmala serê xwe da ber devê xwe û bi dengekî nizm bersîva axa da û got:

– Qurban, ez bi jina muxtar re hatime û emê ji maliya axa re pincêr berhev bikin. Dê niha jina axê jî vegere.

Guhên Mîna axa qet ne li van gotinan bûn. Ew gotin weke bayê li ber guhên wî re derbaz bûn. Wî xwe nêzîkî Mirût kir û got:

– Nexêr, nabe ez te tenê li vir bihêlim.

Mîna Axa ev go, ji hespê xwe peya bû, ber bi Mitût ve çû û jê re got:

– Dê ka em herin, vir tejî tirs û belan ye, dema ku tarî dibe ev der tejî cenewar dibin.

Şewatê ber qirika Mîne Axa girtibû, wextî nefes lê biçikanda û temamê demarên bedena wî di nav gerê de bûn. Lêv, dest, ejnî û ranên wî wek tîra subhanê dilerizîn. Mîne Axa nêzîkî Mirût bû û xwest bi milê wê bigre. Lê ji bo ku heta wê çaxê hê bi fêlên axa nehesiyabû û heta wê seetê destê tu nemehremekî bi destê wê neketibû, xwe paş de kêşa û got:

– Qurban, hûn siwar bin û bikevin pêşî û dê ez ê jî gaziyê xaltiya Fatimê bikim û em ê li dûv we bên.

Mîne Axa hevsarê hespê xwe bi çiqa darekî ve girê da û wek çawan hirç êrîşê nêçîra xwe dike, bi wî awayî êrîşê ser Mirût kir û bi awakî şidayî ew himbêz kir. Mitût êdî mebesta wî fehm kiribû û çiqas jê hat li Mîne Axa qêjiya û jê re got:

– Min berde hey sebabê wiha wiha lê kirî, bêşerefê bêheya,

min berde. Ez ne ji wan im ku tu xeyal dikî.

Mirût bi van gotinan û bi dest û piyan hewil da ku xwe ji destê wî berazê çiyê rizgar bike. Her te digot kevoka ber pençê başokê ye û aska ber kilpên gorê ye qajîn û hawarê dike. Lê qajîn û hawara wê aska nazdar ji destê wî seyê har bêfeyde bû û çiqas diçû axa destê xwe hê zêdetir li navtenga Mirût digerand, qahîm dikir û xwe bi xwe digot:

– Ne, ne ru ji destê min xelas nabî, ciwanên sipehî û nazikên wek te tenê ji axan re helal in. Heyf e tu bikevî destê kurmancekî reş ê genî.

Mîne Axa bi awakî wisan bi Mirût girt û givaşt ku taqet jê birî. Ji bo qêjîn û hawarê neke, bi lez piştîniya xwe ji pişta xwe vekir û herdu destên Mirût pê girêdan û egala rêşîkirî ya ber piştîniyê jî derxist û ji ber zarîn û axînê ku dengê wê neçe ciyekî danî ser devan û pişt re danî erdê...

Mirût bi dengekî temirî dikir hawar û ji bo alîkariyê bangî evîndarê xwe dikir:

– Ax Pîrût, tu li ku yî ku tu min ji destê vî sebahî xelas nakî!

Êdî asîman tarî bûbû, nerm û nerm baran dibarî. Her te digot asîman jî ji halê vê keça çavxezal, nazik û nazdara ku ketiye erdê û ji xwe çûye re ketiye kula girînê û jê re rûndikan diwerîne. Mirût piştî qederekê ku hişê wê hat serî, li çaraliyê xwe nêrî û zanî ku wî heramzadeyê karê xerap pê re kiriye û herdu destên xwe li nav serê xwe da û dest bi zarînê kir. Di vî halî de tenê fikıa kuştina xwe kir û di dilê xwe de got: "Nexêr, êdî jiyan li min tehl e û ji min re nabe. Keça kurd her wextê serbilind, bi heya û namûs jiya ye û mezintirîn serbilindiya keça kurd jî her ev e. Lê êdî ez ji vê serbilindiyê mehrûm im. Êdî ez çawan dikarim li xelkê binêrim û ez

ê bi çi rûyî mêr bikim. Ez bi sî cuziyên Qur'anê jî sond bixwim kes ji min bawer nake. Ez ne girîng im, dê heyayê birayê min jî biçe...". Mirût di dilê xwe de ev gotin digot, rûndikên çavan dirêt û di serê xwe de difikirî ku dê çawan xwe helak bike. Pîrût hat ber çavê wê û di dilê xwe de got: "Ax Pîrût, ez çiqas hez ji te dikim. Lê heya û namûsa keça kurd nehişt ez evîniya xwe nîşanê te bidim. Tu bi Xwedê kî çi keçê şûna min de bûya dê eynê tişt bikira. Tu nizanî min li mal çiqas kum, gore û destmal jê re çinîbûn. Bila Xwedê keçeka xweşbext bike bextê te, xweziya min bi wê ku...".

Mirût ewqas giriya û li xwe xist ku, êdî rûndikên çavên wê hişk bûbûn û dilop dilop xwîn ji çavên wê diwerîn. Asîman jî, hercarê ku çavê wê hi dilopên xwînî yên çavên wê şox û şengê yên wek libên hinarê diket, zêdetir di ewran de diwemilî û wek dîzmencela tejî av a serjêrkirî rûndikan dirêt.

Mirût, êdî di dilê xwe de biryar dabû ku xwe bixeniqîne û ji destê ezab û eziyeta ruhê xwe xelas bibe. Çunkê dizanî ku li hemberê zulm û zordariya axa, ne bi xwe, ne Şêrkoyê birayê wê û ne jî Pîrûtê evîndarê wê yê yekane ji destên wan tiştek nayê. Eger ji ber zulma destê axa şikayeta wî li dewletê bikin feyde nake û dikarin bi xwe malwêran bibin. Fermanderê jerdirman dikare bi sedan bahanan bi wan re bigre û di dawiyê de cardin ew qerzdar derkevin, ji xwe axa jî ji wan kesan nîn e ku guhê xwe bide seyîd û melayan.

Mirût, çiqas difikirî hê ewqas zêdetir baweriya xwe bi rastiya biryara xwe dianî û ji xwexeniqandinê pê ve tu riyeke din nedidît. Ji ber vê, Mirût rabû û piştîniya xwe ji xwe kir. Serek wê bi darê aland û serê din jî kir heleq û nefesa jiyana xwe ya dawîn bi van gotinên di dilê xwe de temam kir: "'Omrê min qurbana te be birayê min ê delal, tu hêvî bû ku

tu min bidî mêr û ji xwe re jinekê bînî. Lê hêviya te nehat cî, ez nizanim ji vir şûn de dê tu bi kîjan riyê bizewicî...

"Ez ji te re kor bim kekê min ê giyan, tu li hêvî bû ku ez sibê ji te re qazyaxe sor bikim, ez ji te re kerr û lal bim...."

* * *

Şêrko li mal rûniştibû û çaveriya xwîşka xwe bû. Di pê hev de diçû hewşa xanî û divegeriya û dema ku baranê dest pê kir hê zêdetir nerehet bû û êdî bîhn û nefes lê çikiyabû. Şêrko, ji kerba xwîşka xwe êdî nekarî xwe zêde li mal ragire, rabû û ket nav gund û serî li hemû ew malên ku xwîşka wî diçû û keçên wan destexwîşkên Mirût bûn da. Li Kanîkîseleyê êdî malek nemabû ku Şêrko neçe û pirsa xwîşka xwe neke. Ji bilî xaltiya Fatim pê ve kesekî nedizanî û wê jî ji tirsa axa lêvên xwe ji ser hev ranedikirin. Şêrko qet cewah û saloxek bi dest nexist û bi naçarî paşde vegeriya mal. Ewqas bawetiya wî bi evîndariya Pîrût û Mirût hebû ku, qet nediket bîrê ku Pîrût ew revandibe, lê ji ber bêçaretiyê car caran ew jî diket bîra wî...

Wê şevê heta sibê xew neket çavên Şêrko û wek dînan lê hatibû. Tariya sibê rabû û cardin ket nav gund, lê cardin serûşûnek bi destan neket. Şêrko cardin vegeriya mal û ket nav eşyayên xwîşka xwe û dît ku cil û bergên wê yên nû kum, kulav, lepik û hemû cihêzên wê di ciyê xwe de ne, êdî bi temamî dilê wî ser rûnişt ku xwîşka wî bi Pîrût re nereviyaye. Dema ku hinek din li derûdora xwe nêrî, dît ku di nav eşyayên malê de çarik û adek naxuyên û di cî de ket bîrê ku ji xwîşka xwe re gotibû jê re pincar sor bike, hebe tunebe xwîşka wî do çûye nav daristanê ji bo wî pincar berhev bike. Şêr-

ko bi vê fikrê ji nişka ve da xwe rabû û bi bez ber bi daristanê ve çû. Piştî lêgerîneke gelek zêde, ji dûr ve reşaya însanekî ber çavên wî ket ku, te digot li binê darekê sekiniye destê xwe dirêjê çikên darê dike. Şêrko çawan ev dît, di cî de dest bi qêrîn û hawarê kir û got: "Erê, way way li min Mirût!". Çend carên din jî qêrîn û hawar kir, lê tu bersîv negirt. Êdî bi bazdanê nêzîkî wê darê bûbû û cendekê xwîşka wî ya bi darê ve aliqandî dihat dîtin. Şêrko bawer kir hê xwîşka wî sax e, bi lez girêka piştîniyê ji darê vekir û çend caran bangî Mirût kir, lê tu deng ji Mirût derneket. Li ser vê çiqas ji Şêrko hat kir borîn û dest pê kir dest û rûyê xwîşka xwe yên cemidî maçî kir. Piştî têr girîn û lixwexistinê, Şêrko serê xwe rakir û li derûdora xwe nêrî û berî hemû tiştî serokê cigara germîn û şûna nalên heywenekî ber çavê wî ketin...

Şêrko cenazeyê xwîşka xwe danî ser herdu destên xwe û ber bi avahiyan ve vegeriya. Hemû xelkê Kanîkîseleyê derketibûn derve û li wê ciwanê dinihêrîn, tevan bi hev re dest bi borîniyê kirin.

Destexwîşkeke Mirût a herî nêzîk ku keça cotkarekî dewlemend bû, hêvî û lavayan li birayê xwe kir ku biçe gundê Kanîsewzeyê pê Pîrût ve. Ew jî çû û bêyî tiştekî ji Pîrût re bêje, ew anî Kanîkîseleyê. Dema ku Pîrût gihîşt Kanîkîseleyê êdî xelk ji ser mexberan vegeriyabûn, li gor urf û adetan tenê mirovên meyt yên nêzîk, yanê Şêrko li binê kêla xwîşka xwe mabû.

Dema ku Pîrût ji Zêno ber bi malan ve ser ket û Kanîkîsele hat dîtin, tevzek di bedena wî de hat xwarê, dilê wî dest bi lêdanê kir, rengê wî bizirî, devê wî zûwa bû û bi lez berê xwe da mala Şêrko. Ew pîrejin, keç û zarokên ku li wir berhev bûbûn, bi dengekî nizm jê re gotin:

– Şêrko li ser mexberan e...

Pîrût berepaş ber bi mexberan ve çû û dema ku gihîşt wir, dît ku Şêrko rûniştiye û kêlek himbêz kiriye. Pîrût xwe li sitoyê Şêrko gerand û jê pirsî:

– Çi qewîmiye lo, ka bêje ez jî bizanim, ez ji kerban mirim?

Bi kelegirîn û bi axînek kûr ve got:

– Way çû çûû, xwîşka min çû...

Dema ku Pîrût ew gotin seh kirin, dinya bi ser de hilweşiya û xwe avêt ser mexbera Mirût û dest bi borîniyê kir, bi dengê xwe yê xweş dest bi şîn û reşayê kir û çend ferdên sitrana Xecê û Siyabend bi wan çavên xwe yên tejî rûndik ve gotin:

"Singê te yê spî nerm û newal, soregulê jêkim Xecê giyanî,
Taqe gula bîhnxweş a Zerza û Mukriyanî,
Derdê min bû derdekî zêde giranî,
Xewna min rast derket ku gotine her dar derdê darê dizanî,
Xecê giyan, ez nemînim ji bo wê ciwanî,
Hey eman, hayê eman ji te re nemînim Xecê gerdûn bi xalî,
Ay, yayê, yayêyêyêyê çû...
Xecê ciwanê, çeleng kebanî... of, of derdekî bê emanî,
Va roj li min sekiniye li mehelê danê taştî
Melekê mewtê hatiye ser nazikê bi giyan kêşanî
Ax... ax ez çi bikim! nemaye dema desthildan û cengê liberxwedanî,
Ax destê min nagere çengê ger û marî û qevda xencera debanî,
Ez ji bo te bigerim ser û binê welatê kurmancetî û şeş dangê kevnemeydanî,
Diqîrim ka dijmin û ew kesê gora min dizî kanî,
Ew siwarê bi lez ber bi min ve tê bihingivim ji dûr ve bişkînim nîşa-

nî,
Yan siwarê mehîna kûmêt, hespê şê û kehêlan bim û dij rawestim bi darê cirîtê, teqle û rimbazî,
Yar bibîne zorevanî,
Ay, ayyê, yayêyêyê çû...
Vê carê yên hatin serê mêr û jinên dûrnas û zozanî,
Lew û cihêlên siwarî, nêr û mê, ciwanên pak û xortên bajarî,
Zarok û mendalên rûniştiyên temamê herêm û welatan dîtin ew serketin û derketina yekê qehremanê axa Mukriyanî,
Tu xem ser dilê min tunebû ji bilî derdê dûbûnî,
Yan xwe ji nemana merg û jiyanî,
Ji bilî xema evîndara xwe sorgula xwe benda dilê xwe,
Yanê Xeca giyanî,
Of, of ji destê zeman û rûreşiya dewranî...
Ay, yayê, yayêyêyê çû...".

Pîrût her digot û didomand. Şêrko dixwest li ber dilê Pîrût bikeve. Pîrût jî hewil dida dilê Şêrko hivekirre. Êdî tarî daketibû. Ew herdu xortên sava wek zarokan digiriyan û bi ser xwe ve hatin ji wan re runebû. Pişt re ser û milê wan ber bi wan ve û bi çavên xwe yên ji xwînê sorbûyî hêdî hêdî ber bi mal ve vegeriyan. Xelkên gund revde revde dihatin serxweşiyê û çengşikestî vedîgeriyan.

Dar û berên Kanîkîseleyê jî ketibûn şîna wê ciwanê. Tem, mij û xubar temamê asîmanê Kanîkîseleyê dagirtibû.

Pîrût û Şêrko tenê li mal mabûn. Xew û xwarin li wan heram bûbû. Bêdeng pala xwe dabûn henzêlê û rûniştibûn. Pîrût, ji bo hê agahê wî ji tiştekî runebû, dixwest hizane ku çi lê hat gula sor a hindurê dilê wî ji nişkave mir. Lê dilê wî dest nedida û bi xwe re nedidît ku ji Şêrko bipirse. Şêrko tê-

gihîşt ku Pîrût gelek hez dike bizane ka çi qewimiye. Ji ber vê, ji ciyê xwe rabû û çû rexê wî rûnişt û yên ku dizanî jê re gotin. Şêrko got:

– Birayê min, li wî ciyê ku vê ciwana han xwe daliqandibû, min qûnika cigarekê dît û ciyê simê hespê jî kifş bû. Bi Xwedê li vî gund ji Mîne Axa pê ve kesek cigara germanî nakêşe. Wî sebabê çend caran mirov şandin ba min û xwîşka min ji min da xwestin. Lê min tu bersîv nedayê û gelek jî mirovekî dêwîn pîs e, bêşik sebebê xwîna xwîşka min ew e...

Dema ku Pîrût ev sehkirin, gotina Şêrko birî û got:

– Wellehî ez ê niha biçim û bi dirganê bûrê wî bidirînim...

– Ne Pîrût, niha tu nikarî bi heqê wî bê derê û nabe em xwe nîşan bidin ku şika me li ser wî ye û qatilê cannazika me ew e. Hekene dê em jî bibetilin û em nikarin qet tola xwe jî jê vekin. Niha ew siwar e û em peya ne, eger bi xwe jî nekare tiştekî bi me bike, bi destê fermanderê jerndirman ku bi sedan benan bi hev ve girêdayî ne, dikare navê qaçaxçîtî û diziyê bi me ve deyne û toz û dûmana me bavêje. Ka bisekine, Xwedê ji Sultan Mehmur mezintir e. Kar tune ku Xwedê baş neke. Ev dinya han her wiha nabe, emê dereng an zû tola xwe vekin...

Pîrût ku gelekî mat bûbû û bi dil guhê xwe didan gotinên Şêrko, bi sehkirina gotina "tolevekirinê" da xwe rabû û wê Qur'ana kevin a ji melayê Kanîkîsele mabû, ji ser binzêlê anî xwarê, danî pêşiya Şêrko û got:

– Wellahî, webîllahî û wetîllahî, bi sî cuziyên vê Qur'ana han ez sond dixwim ku kengê tivingek bi destê min bikeve, ji bo vekirina tola Mirût ez ê gulleya wê ya yekê berdim singê vî sebabê han...

* * *

Çerxa zemanê jî te digot li gor daxwaz û hêviyên wan herdu xortan dizîvirî. Bihar derbaz bû û qirçe–qirça havîna sala 1941an bi tîrêjên xwe welatê kurdan gerim kir. Piştî bîst salên dîktatoriya reş a Riza Xan cara yekê di wê havînê de cejna kurdî ya mezin hat pîroz kirin. Gelê Kurdistanê tiving, dabance û şeştîr bidest xist. Ji gelekî bindest, zorlêkirî û dilşewitî re, ji destkevtina çek xweştir tiştekî din tune...

Her bi derketina firokên reş ji asoyê milê bakur, ordiya Şahînşahî wek tu qemçek nok bavêjî erdê wisan belav kir. Ew xortên gundî yên ku bi zorê biribûn eskeriyê û ji destê zabitên xwînxwar hatibûn emanê, bi dilxweşî û şadî bi bîranîna gelê xwe pêşwaziyê bi hatina firokên reş kirin û halla–hallaya wan bû, bi awakî zû cil û bergên xwe yên îcharî ji xwe kirin û çûn ba kes û nasên xwe. Ew beşa ordiyê ya li Kurdistanê bicî kiribûn belav kirin û beşa piraniya ew çek û cehirxanên wan ketin destê kurdan. Gelek kesên wisan hebûn ku bi satilek mast, du nanan, qutiyek tutin û çend qiranan tiving û dabance ji eskeran distandin.

Dema ku beşa ordiyê ya Seqiz têkelhev bû, hejmarek ji zabitên wê gelekî ji xwe ditirsiyan. Çunkê di muddetê demên mayîna xwe yên li Seqizê de, xerabiyeke gelek zêde li gel eskerên ku kurd bûn kiribûn. Ew di wê hewlê de bûn ku bi çi awayî dibe bila bibe bi sax û selamet xwe bigihînin Tehranê. Ji bo vî karê han jî temamê hêviya wan Qerenî Axa yê Kanîsewzeyî bû. Wan dixwestin xwe bigehînin Kanîsewzeyê, li wir cil û bergên xwe biguherînin û bi riya Tîkan Tepe ya Hawşar û Bêcar re ber bi Tehranê ve biçin. Ew zabitên ku xwe bi Qerenî Axa girtibûn ku di vî karî de alîkariya wan bi-

ke, soz lê dabûn ku di muqabilê vê de otomobîlên xwe, çend tivingên birno û çend damancên berebullum bidin wî û bi ser vê de sozek din jî dabûn Qerenî Axa ku, ew çawan bigihîjin ciyê xwe ji Heme Riza Xan madalyayek jê re bistînin. Qerenî Axa, bi taybetî, sitandina wê madalyê ji xwe re serbilindiyeke mezin dizanî û di dilê xwe de digot: "Welle, di nav axayên kurd de yê cara yekê ji destê wî paşazadeyê mubarek ku madalye werdigre ez im û dê temamê kurdan bexîliyê ji min bikin... Vêca qurban, dema ku ez wê madalyê bi singê xwe ve bikim, ez wê çaxê paşan jî xulamê xwe nahesibînim...".

Qerenî Axa, piştî ku qewlê alîkariyê dabû wan zabitan, çend kes ji xulamên xwe agahdar kiribû û ji wan re gotibû ku, dibê wan zabitan bi saxî û selametî bigihînin Tîkan Tepe, eger tiştek bê serê wan an mûyek jî ji wan kêm be, bila êdî ber çavê wî nekevin. Van xulaman jî, ji bo ku li hemberê xulamên din xwe kêrhatî bidin nîşan, xwe qure û kubar dikirin û digotin: "Baweriya axê gelek bi me heye û ji nav tevan ji bo vî karê bitirs wî em bijartine...". Hêdî hêdî behsa hatina çend zabitên Îranî ji Seqiz a Kanîsewzeyê di nav temamê gund de belav bûbû.

Hejmarek zêde xortên Kanîsewzeyê eskerî kiribûn û li wir ji destê zabitan 'ezab û eziyetek gelek zêde dîtibûn û çend kes ji wan jî ji eskeriyê nevegeriyabûn û bêser û bêşûn wenda bûbûn. Hinek ji wan xortan sehkiribûn ku dê çend zabit ji Seqiz bên Kanîsewzeyê. Li ser vê, li hev kiribûn ku biçin riya wan bibirin û tolê ji wan vekin û wan bişêlînin. Vêca ji ber vê, ew xort çûn li ba Pîrût û xwestin ku wî jî bi xwe re bibin. Çunkê zexmî û zîrektiya Pîrût dikarîbû gelek alîkariya wan bike. Dema ku Pîrût daxwaza alîkarî û beşdariya bi wan re ji

hevalên xwe yên gund seh kir, di cî de destxistina tivingê û tolevekirina ji Mîne Axa hat ber çavê wî û teklîfa wan qebûl kir. Pîrût bû serokê wan xortan. Bi riya xulamên axê pê agahdar bû ku dê sibe êvarê ew zabit bi makînê ji Seqiz bên Kanîkîseleyê. Ji bo ku plana wî bi ser bikeve hevalên xwe berhev kirin û ji wan re got ku, dibê em ji niha de biçin rê kontrol bikin û bizanin ka emê li kîjan ciyê rê li wan bigrin. Berbanga êvarê Pîrût bi pênc kesên din ve ber bi riya Seqizê ve ketin rê. Sê çarîk seet ji Kanîsewze wêdatir, rê di nav şîv û newalekê re derbaz dibû. Ji herdu milan jî serê çiyan gihiştibûn asîmanan û wek selên mezin dibatin ber çav. Ji wir ve tu avahiyek nedibat dîtin û teqandinek jî çêbûya deng dûr nediçû. Li Pîtût ev ciyê ban ji hemû ciyên din baştir hat xuyakirin. Ji hevalên xwe re got ku emê sibe êvarê karê xwe li vir bikin.

Roja din êvarê, Pîrût û pênc bevalên xwe her yek ji wan ji milekî ve ji nav avahiyan derketin û dûr ji çavan li hev berhevbûn. Ew şeş kes bûn û sîlahên wan jî: tivingek pênçtîr a jengarî ya zemanê Şêx û canbêzareke kevin a dewra Xalo Qurban bûn. Ev herdu tivingên han jî di seranserê dewra dîktatoriya Riza Xan de ji aliyê gundiyan ve di nav kulavan de hatibûn pêçandin û kiribûn bin arîkên xaniyekî. Ji bilî van tivingan, xencer, necax û dirgan bi wan re bebûn.Bi Pîrût re jî xencerek debanî hebû.

Dema ku gihîştin şîveyê tariya şevê bi temamî dinyayê girtibû. Bêsekin pangoran gilêlê ser rê kirin û rêzekevirek seranserê rê raxistin. Du kesan li milekî rê û sê kesin din jî li milê din yê rê xwe li ber kevir û hafan veşartin. Yekî din jî şandin ser Zêno ku dema lambên ereba wan bixuyê, kevirekî gilêl bike û îşeratê bide bevalên xwe. Ji bo ku neyên naskirin ser û

rûyên xwe pêçan û tenê hindavê çavê wan dihat dîtin.

Pîrût, di 'omrê xwe de cara yekê bû ku rêbirî dikir û dizanî ku ev karekî gelek bitirse. Lê destxistina tivingê û kerba tolevekirina evîndara xwe ya nazik û nazenîn dilê wî wisan rakiribû ku, te digot li ber wê selê û di vê şeva tarî û zilmat de ji bo şer û xwînrijiyê xwe neqelizandiye, belko dema nimêja nîvroyê ye û li ber çemê Seqizê pal daye û bi kêfa dilê xwe tora xwe avêtiye çem û masiyan digre...

Serheng (albay) Xwocendî yê serokê serkantî ya beşa ordiya Îranê ya li Seqiz, hê ji destpêka serê wê salê ve jin û zarokên xwe şandibûn Tehranê û ew roja beşa ordiyê ya li Seqiz belav bûbû, hemû eşya û hûr û mûrên xwe kiribûn çenteyan û li fersetekê digeriya ku rojekê zû bi destan bikeve. Êdî ew firset bi dest ketibû û xizmeta Qerenî Axa ya bikêr dilê Xwocendî geş kiribû. Xwocendî serê sibê zû ji xew rabû û çente dan hev û bi taybetî tiştên antîke û biqîmet bi awakî qahîm di biniya hemû tiştan de bicî kir, riyê xwe kur kir û li ser kursiyê rûnişt. Sergord (bînbaşi) ê alîkar û du zabitên din li ba wî rûniştibûn û bi xwarina berqene mijûl bûn. Bi ber nanxwarinê re Xwocendî berê xwe da zabitên din û bi ken ji wan re got:

– Dê ka em vê carê jî penîr, torax û şîrê Kurdistanê bixwin, Xwedê dizane belkî em êdî qet nevegerin vir. Ez li ser navê xwe bi xwe dibêjin, eger ez careke din vegerim vir, ev şaşiyek mezin e...

Ew roj li Xwocendî û bevalên wî wek sed rojan hat. Çiqas piyase dikirin û diaxiftin jî qet roj nediçû ava. Belê, ew dema ku bêsebir li hêviyê bûn hat gihîşt. Tu esker li ba wan zabitan nemabûn ku makînê ji wan re bajon, vêca ji ber vê, her çendîn ajotina makînê ji bînbaşî re 'eyb û sernizmî bû, lê

mecbur ma li pişt dîreksiyona makînê rûne. Zabitên din çente li pişt makînê bicî kirin, çend tiving û tabanceyên zêde bi xwe re birin. Serbeng li rexê sergord û berdu zabitên din jî li piştê siwar bûn û ketin rê.

Vêca dê were lê binêre; ew zabitên Şahînşanî ku ji xerabî û dijminatiyê pê ve tu karekî din ji kurdan re nekiribûn, di vê tariya şevê de û di nav çiya û geliyên Kurdistanê re li ber çavê çekdarên kurd re derbaz bibin. Ya Xwedê, di wî balî de kafir jî di balê wan de nebe...

Lêvên serbeng û yên bevalên wî nedilepitîn, her çendîn rê bi kevir jî bûn, lê cardin yawer bi zorê makîne diajot.

Rengê Xwocendî û yên bevalên wî wek cawê spî lê hatibû. Di vî halê han de temamên ew xerabiyên nemirovane yên bi eskerên kurd re kiribûn wek şerîtê sînemayê ber çavê wan re dihat û diçû.

Ew xortên kurd ên gundî ku bi zorê dibirin eskeriyê, hê ji roja yekê ve, ji ber ku bi farisî nedizanîn, diketin ber şeqam, qamçî û dijûnên zabitên faris. Çunkê ew fermanên ku ji wan re didan fehm nedikirin. Mesela eger zabitan fermana "tiving ser mil!" bidana, eskerên kurd tivingên xwe datanîn erdê, yan dema ku fermana "ber bi paş vegere!" bidana, yên kurd rû bi rûyê wan disekinîn û... Vêca çi eskerê yek ji van şaşiyan bikira, cezayê lêdana pêncî qamçiyan jê re dihat dan û li pêşberê hemû eskerên din radizandin erdê û lê dixistin. Vêca ji ber vê, xortên kurdan her ji roja yekê ya eskeriya xwe ve her di fikra firarkirinê de bûn û li firsetekê digeriyan ku ji wê eziyet, zulm û sivikatiyê rizgar bibin. Dema eskerekî bi çekê xwe ve firar bikira, cezayê wî gullebarankirin bû û wextê dihat girtin li ber çavê eskerên din dihat gullebaran kirin. Vêca di wê muddetê de ku Xwocendî fermanderê şaxê

ordiyê ya Seqizê bû, çend xortên kurd ên ku bi çekên xwe ve firar kiribûn û çûbûn Kurdistana Iraqê û li wir polîsên Melik ew girtibûn û teslîmê Îranê kiribûn. Xwocendî bi xwe fermana gullebarankirina wan xortan îmza kiribû...

Ji bilî vê, Xwocendî derbeyek jî li axayên derûdora Seqizê dabû ku gur neyne serê bizinê. Wî bi zorê tevan mecbûr kiribû ku biçin li bajaran bijîn û her axayekî bi ciyekî ve leqandibû û ev jî awayekî din yê surgunkirina axayên Kurdistanê bû. Begzadeyên Feyzûllah Begî ku li derûdora Seqizê dijiyan, belavê Urmê, Tebrîz, Şîraz û Kirman kiribûn û Serheng Xwocendî piraniya beşa malê wan talan kiribû û ji wan bi sedan û bi hezaran tumen bertîl sitandibû.

Serheng Xwocendî, serokê Eşîreta Dîbûqrî girtibû û biribû Seqiz û di orta nîvroyê wextê nimêjê kapek kiribû sitoyê wî û ew di nav bajêr de gerandibû. Ev sivakatî û nemirovatî qet ji bira Eşîreta Dîbûqrî neçûbû. Di nav vê eşîretê de tenê Qerenî Axayê Kanîsewze li ser riya ku hukumeta Îranê dabû pêşî dimeşiya û ji Heme Riza Şah re nûkerî dikir...

Zabitên din ên li ba serheng Xwocendî jî, her yek ji wan kirinên xwe yên xerab ên di derheqê gelê Kurdistanê de dianîn ber çavên xwe û tirs û lerz bi giyana wan diket. Di wê demê de te digot ev zabitên han di seranserê 'omrê xwe de cara yekê ye hîs pê kirine ku dibê li hemberê ew hemû xerabî û necamêriyên ku kirine li bersîvê bigerin. Serheng û hevalên wî, ji bo mij û mûrana ber çav û nav mejiyê xwe bidin milekî, cigare ser cigarê vêdixistin û Xwedê Xwedê digotin ku dengê 'ewtîna san seh bikin û ew dilê wan xweş bike ku gihîştîne avahiyan. Lê gelek bi ser de neçû hêviya wan di binê lingêv wan de ma...

Navek re, ku sergord makîne bi tundî diajot û çavên xwe

kiribûn rê, ji nişkave qêriya:

– Ya Ebû'l–Fezlê 'Ebbas, rê birîne!

Sergord ev got û bi lez lambên makîneyê tefandin. Tam vê navê re çend gulle teqiyan, sergord makînê sekinand û her çar zabit bêsekin hatin xwarê û her yekî xwe avêt milekî. Wê navê re çend gulleyên din jî ber bi makînê ve hatin avêtin. Lê kurdan dîtin ku ji aliyê zabitan ve qet gulle nayên avêtin, wisan zanîn ku tevan kuştine yan birîndar kirine. Pîrût bi hevalekî xwe re hêdî hêdî ber bi makînê ve hat.

Di wê tariya şevê de çav çavan nedidît, tenê makîne wek reşeyek mezin ji nêzîk ve dihat dîtin. Xwocendî, ku li milê çepê yê makînê li berpala çiyê xwe li hinê kevirekî qelizandibû, ji nişka ve dît ku yek ji wan rêgiran li teniştê wî ye û dixwaze ber bi makînê ve biçe, bi lez berê lûla tabanca xwe lê rast kir û tiliya xwe da ser tetikê. Pîrût ku di pê wî de dihat, dît ku hevalê wî birîndar bû, dest avêt xencera xwe û yek li ser dilê Xwocendî xist. Tenê dengek ji Xwocendî derket û got: "ayê wayê mordem..."

Kurdên din bi bihîstîna teqîna tabancê, wisan zanîn ku zabit xweparastiniyê dikin û xwe nadin dest, bêyî ku bizanin ber bi ku ve diavêjin, çend gulleyên din jî teqandin. Hawar û waweylaya Xwocendî û teqandina çend gulleyên din, zabit hê zêditir kirin nav tirs û xofê, wan xwe bi teqle û gilêlkirinê ji rê dûr xistin û bêyî ku bizanin ber bi ku ve diçin ketin riya çiyan...

Kurdan, xwe li ser singê xwe xuşilandî nêzîkî makînê kirin û ji bo ku makîne ji ciyê xwe nelepite çend xencer li tekelê wê xistin û kûn–kûn kirin. Pîrût bi destê çepê deriyê makînê vekir û bi destê rastê serê xencerê ber bi hindurê makîn ve girt û got:

– Seyo teslîm!

Tu deng ji nav makînê nehat. Kurdan ku zanîn kesek tê de tune, derketin ser û çi tiştên tê de hebûn hemû sitandin û hetta fişekek jî tê de nehiştin. Pîrût bi alîkariya hevalên xwe yên din hevalê xwe yê birîndar hilda û danî ser milê xwe û hêdî hêdî ji rê dûr ketin.

Ji ew tiştên ku ketin destê wan, Pîrût tenê du tivingên birno yên dirêj û bi dused fişekan ve hilgirt û ji tirsa kek Mamendê babê xwe newêriya bibe mal û berê xwe da nav çandiniya xwe û tiving û fişek di nav gidîşên genim de veşartin û vegeriya mal. Êdî şev nîvî bûbû û temamê xelkê gund raketibûn, tenê se hîşyar bûn ku car caran direyiyan û bêdengiya şevê xera dikirin. Pîrût çawan gihîşt mal, çû û ket nav ciyê xwe yê serbanê. Lê ji bidestxistina tivingan ewqas dilxweş bû ku xew nediket çavên wî û temamê fikir û bîra wî li derûdora tolevekirina ji Mîne Axa diçû û dihat û di dilê xwe de digot: "Ez bi Kelamûllah sond dixwim ku ez ê gulleya tivinga xwe ya yekê berdim singê wî mizawirê û ez heta sonda xwe bicî neynim ez gulleyekê pê navêjim...".

* * *

Di tariya beyana sibê de hê Pîrût nîvxewî, bo qêr û hawara gavanan û xwe bi xwe diqêriyan û digotin: "garan diçe, ker man", "garan diçe, golikan berdin", ew rabû û çû nav malê, dît ku cêrê avê ser milê xwîşka wî Xezal e û temamê maliyên malê berhevbûne û bi kişmiş çay vedixwin. Kek Mamend pêşiya tevan das, hesan û cêrê ava xwe hilgirt û çû dirûnê û zarokên malê jî her yek ji wan ber bi milekî ve belav kir. Dayîka Pîrût xaltiya Mencê ku tenê li mal mabû, berê xwe da

Pîrût:

– Kurê min, ru ji bo çi naçî dirûnê? Babê te çil salî ji te mezintir e, ew berî te diçe. Tu qet şerm û 'eyb nakî?

Pîrût bi zanetî dixwest wê rojê li mal bimîne û bizane ka gelo hewadîsên rêbirî û kuştina zabitan dê di gund de çawan belav bibe. Pîrût xwe bêdeng kir û ji dayîka xwe re got:

– Dayê can, serê min diêşe, ez dixwazim îro li mal bimînim... Pîrût ev got û xwe li ser kulavê malê yê kevin dirêj kir.

Wextê taştê, Xezal bi cêrê ava xwe ve ji ser kaniyê vegeriya, bi nefesçikyayî û hêdîka ve berê xwe da kekê xwe û got:

– Keko, ru dizanî çi qewimiye. Min li ser kaniyê cêrên xwe tejî dikirin, min dît ku riya aliyê Seqizê ve cotek ga bi otomobîlekê ve girêdane û ber bi mala axê ve dikêşin. Axa, kurên wî, muxtar û xulam hemû pê ve diçûn. Pîrejinan digotin ku ew otomobîl a fermanderê Seqizê ye ûbi şev siwarên kurdan riya wî birîne û ew şelandine û pişt re jî kuştine.

Pîrût bi sehkirina van gotinên ji xwîşka xwe berken bû û xwe li nezanînê danî.

Êvarê kek Mamend ji dirûnê vegeriya, çawan das û hesana xwe danî ser refkê, berê xwe da Pîrût:

– Erê te sehkiriye, dibêjin şevê mirovên Komeleyê riya fermander girtine û kuştine. Qerenî Axa gelek qehiriye. Dixwaze bi axayên din re, çawan dibe bila bibe rêbiran bibîne...

Kek Mamend meşrefeyê tejî av kir û vexwar, cardin dest pê kir û got:

– Destê wan xweş be, bi Xwedê karekî baş kirine. Wî fermanderê gor bi gor, 'ezaba san bi kurdan dida kêşan, destê wan derd nebîne...

Pîrût, dema ku dît dilê babê wî bi vî karî gelek xweş e, di dilê xwe de gelek kêfa wî hat û hê zêdetir bi karê kirî razî bû,

lê heta wê rojê navê Komeleyê sehnekiribû û ne jî dikarî seh bike, çunkê dagîrkerên welat zimanê wî yê şêrîn ê bab û kalan qedexe kiribûn û qet firset nedabûn ku pêş de biçe û bi bêjeyên xwerî kurdî yên ji xezîneya bêbinî xwe dewlementir bike. Pîrût û xortên wek wî, her çendîn xwendewar nebûn, lê li gel vê jî di temenê xortîniya xwe de heta dihat zêdetir bêjeyên farisî seh dikirin. Vêca ji ber vê, ew gotina nû gelek lê ecêb dihat û bêyî ku bizane ew navê mirovekî ye, navê îdareyê yan navê eşîretekê ye, wê gotinê di dilê wî de cîgirt û li hember wê di dilê xwe de hurmet, evînî û rêz hîs dikir. Çunkê tenê dizanî ku Komele jî dijminê wî reîsê xwînxwer e.

Pîrût, ji bo Komeleyê fehm bike pirsî:

– Erê babo, Komele çi ye û li ku ye?

– Welle kurê min, ez bi xwe jî ewqas serî lê dernaxim, lê qasê tê gotin, ew Komele li Seblaxê ye, nehênî ye û dijminê axan û eceman e û tê gotin ku, dibêje gereke kurd bên azad kirin...

Kek Mamend di derheqê Komeleyê de ji wê zêde tiştekî din nedizanî ku kurê xwe têbigihîne. Lê her ew çend karekterên ku kek Mamend bi Komeleyê ve danî, di nav dilê wî bab û kurê kurmancê feqîr de ji bo rojên xweş û rizgariya ji destê zulm û zoriya axatiyê ronahiyek peyda kir...

Pîrût êvarê çû nav zeviyê, ji nav gidîşa genim tiving derxist û ew bi perçe çatekî paqij kirin. Pîrût heta dereng li tivingan nêrî, lê ji nêrîna wan têr nedibû û di qondaxên wan ên biriqandî de serê Mîne Axa didît. Pişt re çarka xwe li herdu tivingan pêça û cardin ew di nav gidîşa genimê de veşartin û ber bi mal ve vegeriya. Ji tirsa babê xwe newêrîbû ew daxwazên ku di dilê wî de hene bêje û tenê çaveriya tiştekî hû ku

bibe firset û ew gotinên di dilê wî de hene ji hahê xwe re veke. Piştî serpêhatiya şelandina makîna reîsê serkantê dewletê yê Seqizê û kuştina Xwocendî, Pîrût bi temamî guherîbû û te digot ew Pîrûtê berê nîn e ku biçe zibareyê, coyan paqij bike, baxan bikole û berî hemû paleyan qebaleya xwe temam bike. Êdî fikra tiştên wiha li ba wî tunebûn û nedixwest biçe ji axa re karkerî bike, hetta dixwest rojekê zûtir ji Kanîsewzeyê derkeve, gulle bavîje, serbest bibe, li gor dilê xwe bijî û serî ji kesekî re netewîne. Êdî ew ji wan kesan nebû ku guhê xwe bide muxtarê axa û ji hemû kesî zûtir ji bo ulamê derkeve pêş. Wek pêşiyan gotine: "Kor ji Xwedê çi dixwaze? du çavên ronî". Hemû daxwaz û hêviyên Pîrût jî ew bûn ku tivingek bikeve destan û niha jî ew daxwaza wî bicî bûbû. Wek ku dibêjin: "Keçel dizane dermanê keçeliya wî çiye", vêca kurd be tiving destan ketibe! Wey halê dijminê wî kurdî!

Kek Mamend têgihiştibû ku, Pîrût gelekî sist e û ji nîvê dilê xwe nerehet e û ji xwe aciz e. Kek Mamend bi derdê dilê kurê xwe hesiyabû û dizanî ku, Pîrût ji kerba Mirût dîn hûye û piştî Mirût xwe kuştiye heta niha ew hi temamî guheriye û gêj û lal bûye. Ji ber vê, ji bo ku dilê kurê xwe xweş bike, şevê dema ku li ser sekoya hewşa malê rûniştibûn, berê xwe da kurê xwe û got:

– Erê kurê min, ji bo çi tu rojekê naçî ba Şêrko. Tu dizanî ku ew reben tenê maye û ji te jî gelek hez dike. Ya baş ew e ku tu car caran serekî lê bidî.

Kek Mamend ev got û qelûna xwe vêxist û cardin:

– Ji Şêrko re bêje bila bêhna xwe teng neke, Xezal a wî ye û çi çaxê bixwaze dikare bê bibe...

Dema ku xaltiya Mencê ev seh kir, ji ciyê xwe hilpekî û

gotinên kek Mamend birî û got:

– Erê ma tu malxoyê wî mirovî yî. Tu qet melheze nakî dê tu çawan jinê ji vî kurî re bînî...

Kek Mamend ji jina xwe hêrs bû û got:

– Jinik, eqlê te nagihîje vê û tu nizanî. Şêrko hatiye mala min û me bi hev re nan û av xwariye û min soz daye wî. Gotina kurdan carek e ew nabe ducar. Mêr dihê mêr be û li ser sozê xwe bisekine. Tu dixwazî min bi vê kalbûniyê ve şermezar bikî û ez bibim pêkenê li ha û li wê? Ne, ne, tu nefehmî û eqlê te sivik e, ez kurê babê xwe me û ez haşa pîç nînim. Axir tu dizanî ew jî piştî xwîşka xwe ji berdêlî mehrûm bûye. Tiştekî din jî heye ku dilê wî pê keça me ve ye...

Xaltiya Mencî dixwest cardin xeber bide û fikra xwe bêje, lê ku dît mêrê wê gelekî hêrs bûye, tûka xwe dabeland û lêvên xwe ji ser hev ranekirin. Pîrût jî di dilê xwe de gelek kêfa wî ji gotinên babê wî re hatibûn, lê li gor orf û adetên kurdîniyê heqê wî tunebû xwe têke nav gotinên dê û babê xwe û xwe bêdeng kiribû. Pîrût di dilê xwe de bêriya Mirûta ciwana evîna dilê xwe dikir û digot: “Emê Xezalê bidin birayê te û bila gulek ji gulistana nav dilê min ku min ji bo te perwerde kiriye, bibe nimûneyek ji eşq û evîniya min ji te re, ey gula sîsbûyî ya Kurdistanê, bila ji bo birayê te yê tekane ruhê te yê pak û saf rehet be...”.

Hê bayê hêrsbûna kek Mamend ji ser ranebûbû, ji nişka ve kir qêrîn:

– Xezal, Xezal, ka were vir ez bizanim.

Xezal ku li hindur rûniştibû û li ber çirayê bifitîl derpê û kewayê babê xwe pîne dikir, bi sehkirina dengê babê xwe da xwe rabû û ber bi hewşê ve çû û got:

– Kerem bike babo, tu çi dixwazî?

– Erê keça min, tu dixwazî Şêrko bikî?

Xezal ku ji babê xwe ne li hêviya pirseke wiha bû, bi sehkirina wê te digot cêrek ava sar serî de kirine û wek kaçkaçokê sor bû, serê xwe kir ber xwe û te digot nefesê jî nastîne.

Kek Mamend:

– Dê bêje, tu dixwazî bi wî re bizewicî an na?

Cardin pêjn ji Xezalê derneket.

Kek Mamend bihêrs:

– Keçê tu kerr î, zimanê te jêkirine, te elemê girtiye, ji bo çi tu bersîva min nadî?

Xaltiya Mencê, ku gelek baş xasyetê mêrê xwe dizanî û dizanî ku eger gelek kerba wî vebe dikare li keçkê jî bixe, ji hêdîkave çû ber guhê wê û bi dengekî nizm jê re got:

– Keça min bersîva wî bide, bila neqehire...

Kek Mamend cardin...

– Dê tu çi dibêjî. Yan ji kesekî din hez dikî û te kiriye serê xwe tu pê re birevî, tu dixwazî heyayê me bibî û rûyê me reş bikî...

Xezal bi sehkirina van gotinên babê xwe te digot xencerek ser dilê wê dane û gelegirînî bû. Kek Mamend hinekî din jî da ser:

– Dê bireve, bireve.

– Babo, qet rev li keçên te tê ku tu van gotinan layîqê me dibînî û dibêjî?

Kek Mamend gotina keça xwe birî û got:

– Gelek nerês e, bêje ez bizanim, tu dixwazî ez bi vê kalbûniya xwe derewîn derkevim?

Bi vê gotinê hinekî din jî dilê Xezalê tejî bû û bi dengekî nizm û li gor orf û adetên kurdînî got:

– Ez di bin emrê kekê xwe de me, ew çawan baş bizane ez

ê wisan bikim. Xezal ev gotin û ber bi malê ve vegeriya.

Êdî şev dereng bûbû. Pîrût, Xezal û kek Mamend, her yek ji wan bi awakî dilxweş bûn. Pîrût dilxweş bû ku, dê biçe Kanîkîsele û ji Mîne Axa tola xwe veke û mizgîniyê jî bigihîne Şêrko. Xezal dilxweş bû ku, babê wê razî ye û dê wê bide Şêrko. Kek Mamend jî dilxweş bû ku, sozê xwe bicî tîne, derewîn dernakeve û dilê kurê kurmancekî xweş dike.

Her xew nediket çavê xaltiya Mencê tenê, nerehet bû û ketibû nav deryaya wan fikir û xeyalan de ku nedizanî dê bi kîjan riyê Pîrût bizewicîne...

* * *

Pîrût eynî şevê ji mal derket û çû tiving û fişek ji nav gidîşa genim derxist û bi riyek rêder re ber bi Kanîkîsele ve ket rê. Dema ku bi ser Zênoya li hemberê malan ket şefeqa sibê jî avêtibû û bayê sehera sibê dengên musîqayê yên ji Kanîkîsele dihatin digihand guhê mirov. Eger kesên bi kul û derd guhê xwe bidana vê musîqayê, bê şik wan dikarîn hemû derd û kulên xwe bi van ahengên musîqayê jibîr bikirina û bêyî hay lê bin dest bi govend û şahîniyê bikirina.

Çi musîqe, çi musîqe! Dengê kilîna meşkan, çêlekdotina keçan, bangên dîkên berê beyanê, hîre–hîra hespan, kare–kara karik û berxan, waqe–waqa qaz û werdekên gola ber malan, hawara şivan, gavan, golikvanan û bi sedan dengên din têkelê nav hev bûbûn û ahenga musîqayek wisan saz bûbû ku ji destê tu nivîskarên musîqayê yên bi nav û deng yên dinyayê nivîsandina musîqayek wiha nedihat... Lê ji wê ahenga xweş û dilbikul dengekî din jî dihat ku heta Xwedê hez bike nexweş û dilêş bû. Bi dengê qaz, quling, kew, qîqî,

teyrê şivanan, reşîle, mirîşkên avê, kotir, pepûk, kûresol û bi sedan teyrên din yên xweşik ku şahîniya biharê girtibûn, dengê kundan li ser kulavê zivistanê bi tundî rûniştibû û bi dengê xwe yê nexweş bersîva wan dida û digot: "dê rojek bihara we jî kavil be û dê zivistan bi ser de bê, xwe ewqas mezin nekin", dihat. Bi van gotinan tevan bêdeng dikir û xem û kul bi ser wan de diwerand. Ew dengê ku ahenga musîqaya tabîî Kanîkîseleyê xera kiribû û wek dengê kundê ji nav hemû wê ahengê dihat û diket guhê mirov, dengê muxtarê mala axê bû ku, wê beyana zû ketibû nav kolanan û xelkê bangê ulamê dikir. Lê Pîrût guhê xwe neda wî dengî.

Ji Pîrût re Kanîkîsele ji hemû ciyê dinyayê xweştir bû. Çunkê cara yekê li ser kaniya vî gundê bi me'neya hezkirinê ya rasteqînî gihîştibû û hemû hêvî û daxwazên xwe yên dahatû bi jinanîna keça vî gundê xweş kiribû. Pîrût ji ber xatirê gula ciwana ruhê xwe hez ji dar û berên Kanîkîseleyê jî dikir. Dema ku ew ser Zêno ket û Kanîkîsele pêş ve hat xuyakirin, hemû ew keç û jinên meşk dikilan, tepik çêdikirin, gulkan berdidan, av dianîn, tendûr vêdixistin û taştê dibirin dihatin ber çavê wî û di dilê xwe de digot: "ev hemû nas û destxwîşkên Mirûta min a şêrîn in û bêhna Mirût ji wan tê..."

Mala Şêrko li rexê gund bû û diket ser riya Pîrût. Pîrût, ji bo ku kesek wî nebîne bi riyeke nepenî re xwe avêt hewşa mala Şêrko. Şêrko taze ji xew hişyar bûbû. Dîtina Pîrût bi du tiving û gelek fişekan ve ew hinekî şaş kir, lê zû hişê wî hat serî û Pîrût bir jorê, berî hemû tiştî û heta berî ku pirsa hal û kêfa Pîrût bike, bi herdu destan tivingek hilda û maçî kir û danî ser serê xwe. Te digot sofî Heme Hesenê meşhûr ê Şarwêranê ye cêrek ava destnimêjê ya qirêj a dest û lingên şêxê xwe bi dest xistiye û li çavê xwe yê kor ê tekane dixe ku

ji bînahiya çavan nebe. Yan jî te digot Mam Hacî ji Mekke û Medîneyê lalûpêçek gilî aniye mal û têkelê nav ar, genim, şekir û çaya malê kiriye ku bereket bikevê...

Şêrko, tiving û fişek di kewarê de veşart û milê Pîrût girt û çûn serê jorê odê rûniştin. Pîrût gelek dilteng û bi mereq bû û ji hesreta Mirût çavên wî tejî hêsir bûbûn, lê ji şerman li xwe nedidanî û bêyî ku bikare temaşa nav çavên Şêrko bike serê xwe kir ber xwe û rûnişt. Navek re herdu jî bêdeng bûn û çunkê derdên hevûdu fehm dikirin. Şêrko, ji bo ku xwediyê xanî bû xêrhatinê li Pîrût da û hal û kêfa Kek Mamend û xaltiya Menîcê jê pirsî, lê ji şerman behsa Xezalê nekir. Lê Pîrût ji bo ku dilê Şêrkoyê destebirayê xwe xweş bike, got:

– Babê min got ku, Xezal jê re pîroz be, Xezal jî min kiriye wekîlê xwe. Ji xwe tu jî dizanî ez ji bo tolevekirinê tu texsîratî nakim û xwîşka min jî li te pîroz be...

Şêrko bi sehkirina wan gotinên dawiyê yên Pîrût, li gor orf û adetan rabû û destê wî maçî kir û Pîrût jî ji xwe li bahaneyekê digeriya ku dilê xwe pê hênik bike, ji ber vê destê xwe avêt sitoyê Şêrko û dest bi girînê kir. Piştî bi ser xwe ve hat, Pîrût got:

– Kekê min, tê bîra te ku me sond xwar em tola Mirût vekim, vêca va ez hatime ka gelo fikra te çiye?

Şêrko ji Pîtût zekîtir, hîşyartir û têgihîştîtir bû û Pîrût jî bi vê yekê dizanîbû û ji ber vê jî ew pirs ji wî kir. Şêrko got:

– Kekê min, ez bi xwe ji mêj ve ye di wê fikıê de me û bi dîtin û hatina te di halekî wiha de, tê dîtin ku firsetek baş ji bo daxwaza me pêk hatiye.

Di nav gundiyên Kurdistanê de adetek heye, dema ku qîma xwe bi zulm, zordarî û ulama ji heddê der ya xwediyê milk neynin, bi riyên cihê cihê zerarê didinê. Agir berdidin

lodên genimên wan, dovê hespên wan yên herî di dilê wan de ezîz e dibirin, pez û dewaran berdidin nav genim, bostan û tutinên wan, yan jî ava hê dema wê nehatî berdidin ser zeviyan, ew dibetilînîn û darên wan dibirin û. hwd...

Vêca ew herdu xortên dilşewitî rûniştibûn û difikirîn ku pêşî Mîne Axa bibetilînin û zerarekê bidinê. Şêrko ku li gund baş xuya bû, kele, nav xaniyan û derûdora mala axê baş dizanî, bi vî awayî fikra xwe got:

– Di van dawiyan de Mîne Axa ketiye nav xof û tirsek mezin û ji bo parêzgeriya xwe gelek tiving sitandine. Axayê Kanîgorgê dijminê serê Mîne Axa ye û niha çek û cebirxane ketiye destan û êrîşê Mîne Axa dike. Vêca ji ber vê, xew nakeve çavê mîne Axa, heta şefeqa sibê ji bo kontrola riya Kanîgorgê li rexê baxê xwe mirovên xwe dide rûniştandin û ew tembîh kirine ku bi dengê tivingan re bêsekin wî agahdar bikin. Mîne Axa xulamên xwe yên din jî tembîh kirine ku bi teqîna tivingan ji aliyê baxê ve ber bi wê ve biçin û nehêlin dijmin bikeve nav gund. Hetta li hemû paleyên ku ket û giya didûrîn jî tembîh kiriye ku bi teqîna tivingan nesekinin û bêsekin biçin hewara xulamên din. Vêca dê ru sibê piştî şîvê û belavbûna xelkê ji mizgeftê, tivinga xwe hilgirî û ber bi aliyê baxê ve biçî. Du sed gavan ji baxê wêdetir pirek heye, dê tu tam li hemberî wê pirê tivingekê biteqînî û ber bi milê rojavayê ve vegerî û bê mal û ji xwe re rakevî...".

Pîrût, berî ku bihêle Şêrko gotinên xwe temam bike jê re got:

– Kekê min, min sond xwariye dibê ez gulleya tivinga xwe ya yekê berdim dilê mîne Axa. Ya ku tu dibêjî ne li gor min e.

Şêrko jê re got:

– Serhişkiyê neke û ez çi dibêjim gotina min bike. Min planek baş çêkiriye û xera neke.

– Ne kekê min, tu çi bêjî ez ê gotina te bikim, lê ez gulleya yekê bi tivinga xwe bernadim.

Şêrko, dît ku feyde nake, rabû û çû herdu tiving bi temamê fişekan ve ji kewarê derxist û anî û raxist ser berkê û pirsî:

– Ev herdu tiving ên kê ne?

– Yek a te ye û ya din jî ya min e.

– Kîjan a te ye?

– Tu kîjanê dixwazî ji xwe re hilgire.

Şêrko tivingek bi sed fişekan ve veqetand û kir nav kovarê û jê re got:

– Ji bo ku sond bi te nekeve, sibê tivinga min bi xwe re bibe.

Pîrût, ku heta wê çaxê bi mebesta Şêrko negihîştibû dest bi ken kir û got:

– Bi Xwedê tu fêlan dizanî. Dê ka ji min re bêje piştî ku min gulleyek teqand dê ru çi bikî?

Şêrko got:

– Min ji te re got were malê û rakeve. Êdî karê te bi tiştekî din neketiye. Dê tu pişt re bibînî.

Pîrût wê rojê qet ji mala Şêrko derneket derve û bêsebir li hêviya êvarê ma. Dema ku tarî bû micewr derket serbanê mizgeftê û bang da. Pîrût qasê seetekê xwe li hewşa mala Şêrko bêdeng kir. Dema dît ku xelk ji mizgeftê derdikevin, rext û tivinga Şêrko hilgirt û bi pênc fişekan dagirt û ber bi aliyê pirê ve ket rê. Şêrko jê re çawan gotibû bi wî awayî kir û ji aliyê rojavayê ve ber bi mal ve vegeriya. Dema ku gihîşt pişta hewşa xanî dengê qêr û hawarê gihîşt guhê wî. Dixuya

ku temamê xulamên axê êrîşê ber bi aliyê baxê ve dikirin. Pîrût nêzîkî nav çepera mal bû û dikir ku bikeve hindur û biçe jorê, dît ku ew şeva tarî û zilmat bû wek rojê. Loda ketê mala Mîne Axa ku serê wê gihîştibû asîmanan agirek wisan pê ketibû ku ji pişt çiyan jî pêta agirê wê dihat dîtin. Sorahiyê asîmanan girtibû, Pîrût di wî halî de plana Şêrko fehm kiribû û berkenek hatê û di dilê xwe de got: "Welleh tu mirovekî wisan î ku tu dikarî kumê Şeytên berevajî bidî serî..."

Pîrût çû hindur hinekî rûnişt, lê dît ku Şêrko nehat. Sitare lê nebû û derket derve û ji dûr ve li pêta êgir nêrî. Qasek din bi ser de çû cardin Şêrko nehat. Êdî sebra wî nema û nekarî xwe lê bigre. Pîrût tiving û rextê xwe veşart, xencera xwe kir ber pişta xwe û ber bi agir ve ket rê û gelekî mereqa Şêrko dikir û di dilê xwe de digot: "Xwedê neke eger ketibe destê axa, welleh dê wî bikuje." Pîrût xwe da pişt dîwarekî nêzîkî êgir veşart û dît ku temamê xelkê bi satilan, bi qovan, cêran û tenekan avê dikêşinin, ax û xweliyê diavêjin ser agirê û mijûlê tefandina agire lodê ne, hemû ev karên han ji dûr ve gelek baş dihatin kifşekirin. Ronahiya agirê lodê wek elektrîkê temamê derûdoran ronî kiribû û Pîrût gelek hêsanî dikarî însanan ji hev veqetîne. Dema ku Pîrût baş lê nêrî, dît ku va ye merek di destê Şêrko de ye û ew jî ax û xweliyê diavêje ser êgir. Çaxê Pîrût ev dît bawerî bi çavê xwe nekir, lê çiqas diçû pêtên êgir geştir dibûn û ser û çavê Şêrko jî haştir dihat dîtin. Pîrût xwe lênegirt û ji hêdîka ve çû ba Şêrko û bêyî li Şêrko binêre wî jî dest bi tefandina êgir kir. Gelek hi ser de derbaz nebû, Şêrko Pîrût dît û dema ku van herdu çavan hevûdu dîtin, ev gotinên han jê hatin xwendin. Şêrko ji Pîrût re digot: "axir min ji te re negot here mal û rakeve, tu ji bo çi hatî vir. Ji bo mineta teqîna tivingê...", ji çavên Pîrût jî dihat

xwendin û digot: "bi Xwedê se û fêlbazekî wekî te di dara dinyayê de tune..."

Pîtût çavên xwe li derûdora xwe gerand, dît ku deh û panzdeh gav li pişt wî mirovek sekiniye, bi şedeya serî, miradxanê reş, şalê zer, piştîniya peşmîne, xencera qevde spî û çend pişkokên zêr pê ve, zanî ku ew axa ye û di vî haletê han de dixwest dest bavêje xencera xwe û wî perçe petçe bike, lê dema ku li Şêrko nêrî, ji çavên wî derxist ku ew razî nîne û bi awakî nejidil cardin dest bi tefandina êgir kir.

Dema ku Şêrko bi mer, ax û xwelî bi agir de dikir, di dilê xwe de difikirî ku her vê şeva han Mîne Axa wenda bike. Her çendîn hatina Pîrût li ber agirê vî karê han zortir kiribû, lê di milekî din de pê xweş bû û digot ku: "vêca her bila Pîrût jî bê, wellehî emê îşev vî mizûrê ban bifewtînin. Hekene dê ew piştî vê şewata han zêdetir miqateyê xwe bibe. Niha hemû xulamên wî bi tefandina agir ve mijûl in, serê wan di xayîlê de ne û fikra wê yekê nakin ku axa ber bi mal ve bişînin. Gereke ez tiştekî wisan bikim ku axa biçe mal û wê çaxê ez jî dikarim biçim kolanek tarî û li ser riya wî li hêviya wî bimînim...".

Şêrko hem kar dikir û hem di serê xwe de plan digerandin. Dema ku dît hemû tişt di serê wî de bi rêkûpêk e, xwest Pîrût jî bi mebesta xwe agahdar bike. Şêrko, ji bo ku bikare xwe nêzîkî Pîrût bike û tiştên difikire jê re bêje, berê xwe da xulamê axê Bapîr, ku li hemberî wî bû û ew jî bi merê bi tefandina êgir ve mijûl bû, jê re got:

– Kek Bapîr, mala te neşewite, ji axê re bêje bila li ber ronahiya vî agirê han nesekine. Bila biçe mal. Kî çi dizane, belkî ew sebabê agir berdaye vê loda han li ciyek nepenî xwe veşartiye û dixwaze gulleyekê jî berde axê. Mîne Axa ha li vir

be û yan li vir nebe, ji xwe xelkê gund hemû li vir e û agir ditefînin...

Bapîr çawan vê sehkir, gelek munasib dît û mera destê xwe de girt avêt û çû ba axê. Dema ku Pîrût dît mer vala ye bêsekin çû girt anî û hat mil bi milê Şêrko dest bi xebatê kir. Şêrko vê navê re temamê plana xwe jê re got. Dema ku Pîrût ev gotin ji wî seh kirin, got:

– Ka ez biçim tivingê bînim.

Şêrko bihêrs jê re got:

– Lez neke, tu jî pê min de were.

Di vê navê re Şêrko dît ku, Bapîr xwe nêzîkî guhê axê kir û tiştek jê re got, ew jî bi lez ji ber êgir bi dûr ket û ber bi aliyê malê ve meşiya. Dema ku Bapîr vegeriya ber êgir, Şêrko jê re got:

– Kek Bapîr, ha mera min ji te re, ez ê biçim ser avekê û bêm.

Xaniyê Mîne Axa li milê din ê gund bû û ji ciyê şewatê ve nedibat dîtin. Deriyê wî yê ser kolanê li pêşberê dehlekê bû û deh–panzdeh gav ji wê wêdetir jî rêkorek sernişov ber bi aliyê dehlê ve diçû. Mîne Axa li milê rastê dimeşiya, ji bo ku Şêrko bikare bikeve pêşiya wî û kesek wî nebîne, li milê çepê meşiya û ji Mîne Axa gelek zûtir gihîşt nav wê riya sergirtî ya tarî. Pîştî Şêrko çû, Pîrût jî bi bahaneya bihênvedanê mera di destê xwe de danî erdê û di pişt wan de meşiya.

Şêrko taze gibîştibû nav wê riya sergirtî, dît ku kuxte–kuxta Mîne Axa ye û nêzîkî wî dibe. Di demên wiha de kuxte–kuxta Mîne Axa ji tirsan bû, te digot ji êrîşa ku lê bihatiya kirin re dibêje: "va ez têm, xwe ji ser riya min bidin alîkî...".

Mîne Axa hê gava xwe neavêtibû riya sergirtî, Şêrko derket pêşî. Mîne Axa bi dîtina Şêrko di vê şeva han a tarî de hinekî

veceniqî û bêyî li xwe deyne, xwe hêrs kir û got:

– Hêtîmo, tu li vir çi dikî, xelk hemû mijûlê lodtefandinê ye, here, here alîkariya wan bike!...

Şêrko bersîva axê da û got:

– Qurban, ez ji bo xizmeta jina axê çûbûm...

Dema ku Mîne Axa ev gotin seh kirin, destê xwe bire xencera xwe û ji kalanê wê derxist û dikir ku li Şêrko bide, tam wê navê re ji pişt ve Pîrût bi destê Mîne Axa girt û bada û xencer ji destan ket erdê. Pîrût xwest ku wî bi xenceran kerî–kerî bike, lê Şêrko bi destê wî girt û got:

– Melezîne, mala te bişewite. Ka zû piştîniya wî ji pişta wî veke û deyne ser pişta xwe û em biçin.

Pîrût bi lez piştîniya Mîne Axa ji piştan vekir û da destê Şêrko û Mîne Axa da pişta xwe û Şêrko Mîne Axa qahîm li pişta Pîrût girê da û ji bo ku deng jê dernekeve destmala ber xencerê jî li devê wî girê da û ketin rê. Ew ber bi aliyê dehlê ve ber bi jêr bûn. Nêzîkî sê çarîkan çûn û heta gihîştîn wî ciyê ku Şêrko cenazeyê xwîşka xwe dîtibû. Dema ku gihîştin wir, Şêrko, Mîne Axa ji pişta Pîrût danî erdê û destmala ser devê wî vekir û got:

– Dê, merezbab bêje, te çima Mirût kuşt û te ew li binê kîjan darê kuşt?

Ji tirsan zimanê Mîna Axa nedileqî û lêvên wî ji ser hev ranedibûn, bersîv neda. Pîrût bi şeqam û pehînan ket ser û qasekê şûn de bi naçarî xire–xirek jê hat û bi destê xwe darek nîşan da.

Şêrko bêsekin serek piştîniyê bi wê darê ve girê da û ji Pîrût re got:

– Here kevirekî bîne û deyne bin piyên vî seyî.

Pîrût wek pehlewanan kevirekî mezin himbêz kir û anî da-

nî ber darê û ji Mîne Axa re got ku derkeve ser wî kevirî. Şêrko vê carê jî serê piştîniyê yê din li gewriya Mîne Axa aland û berê xwe da Pîrût û jê re got:

– Lo, tê bîra te ku min ji te re got: "keko, dinyayê dûr e, dê roja me jî bê". Belê niha ev heramzadeyê han ê bênamûs û diwênpîs, ku bû sebebê xwekuştina xwîşka min û destgirtiya te ya delal ber destê me ye û di bin darê tolevekirinê de ye. Ev rûreşê han ne tenê qatilê xwîşka min e, belko wî babê min jî ji birçiyan kuşt, çend caran muamelên sivikatî û heqaret jî bi min re kiriye. Ji ber vê tu îzna min bide ez ê hi vî dilê xwe yê tejî, kevirê bin piyên wî bikêşim.

Şêrko ev got û kevir kêşa û kelaxê Mîne Axa daliqandî di hewa de ma û herdu çavên wî zîq derketin derve. Pîrût jî ji bo ku têhna dilê xwe bişkîne çend xencer li laşê wî yê mirî xist...

Şêrko û Pîrût bi kêf û xweşî vegeriyan mal û dîtin ku hê agir ji loda axê bilind dibe û xelk jî bi tefandina wê ve mijûl e. Şêrko berê xwe da Pîrût û jê re got:

– Êdî derengîketina me ya mayîna li van deran bêfeyde ye û divê em îşev biçin. Rabe em ê tivingên xwe hilgirin û biçin Kanîsewzeyê ba kek Mamend. Emê sibê li wir bin û êvarê jî bikevin rê ka em bizanin Xwedê dê riya me ber hi ku ve bibe...

Herdukan rextên xwe girêdan, tivingên xwe hilgirtin û derketin. Pîrût berê xwe da Şêrko û got:

– Tu Xwedê bikî ka em di nav dehlê re biçin û em çarekê din ji kelaxê wî sebabî re bihînin.

Şêrko, ji bo xatirê Pîrût berê xwe da ser riya nav dehlê û gelek ser de neçû gihîştin ciyê ku kelaxê mîne Axa li wir bû. Pîrût, lûla tivinga xwe ya birno ya kurt kir ser singê Mîne

Axa û tiliya xwe kêşa û pişt re lê nêrî û ji nîvê kezeba xwe nefesek sitand û got:

– Oxxx, min sonda xwe bi cî anî û ez derewîn derneketim...

Micewrê mizgeftê ji bo banga sibê taze derketibû serbanê mizgeftê, Şêrko û Pîrût nêzîkî Kanîsewzeyê bûn û tiving û rextên xwe di nav zeviyê de veşartin, berê xwe dan mala kek Mamend. Kek Mamend jî nû ji xew rabibû û mijûlê destnimêjgirtinê bû ku, dît Şêrko û Pîrût ketin hindur. Çavên Şêrko çawan bi kek Mamend ketin çû destê wî maçî kir. Ev dihat wê me'neyê ku "ez gelek kêfxweş im ku te min ji bo xulametiya xwe qebûl kiriye...". Kek Mamend û xaltiya Menîc wek mêvanekî herî 'ezîz pêşwazî li Şêrko kirin û Xezalê jî li milê din ji bo haziriya xwirîniyê dihat û diçû. Piştî xwirîniyê û vexwarina çayê, kek Mamend dikir ku das û hesana xwe bigre û biçe dûrîniyê. Lê Pîrût çû ber guhê wî û jê re got ku karekî Şêrko bi te heye û tu bikarî hinekî din jî bisekinî baş dibe. Kek Mamend zanî ku dê Şêrko di derheqê Xezalê de pê re biaxive, ji ber vê îşaretek da xaltiya Menîc ku ew û Xezal derkevin ji derve û ew jî bi bahaneya avanînê derketin...

Dema ku hersê tenê man, Şêrko serê gotinê daxist û got:

– Kek Mamend, tu ciyê babê min de yî û ez dizanim ku tu qasê Pîrût ji min hez dikî. Min û Pîrût me karek kiriye û em dixwazin ji te re bêjin û bi te bişêwirin...

Şêrko ev got û piştre mesela agirberdana lodan û kuştina Mîne Axa tevan jê re neqil kir. Kek Mamend jî ji nîvê dilê xwe ve guhê xwe da wî û piştre jê pirsî:

– Êê baş e, we tiving ji ku bi dest xistin?

Pîrût dizanîbû ku babê wî bi bûyera şelandin û kuştina serokê fermanderiya Seqizê dilxweş e, bêtirs hemû meselê jê re

got. Dema ku kek Mamend ev seh kirin, di dilê xwe de bi kar û mêraniya kurê xwe serbilind bû, lê li xwe danenî û me'da xwe tirş kir û got:

– Hêtîmê çilmîn, te ji bo çi bêpirsa min ew kar kir, ji kengê ve ye ku tu bêpirsa min karan dikî?

Ji uslûba xeberdana wî dihat zanîn ku ew van gotinan ji dil nake, ji ber vê dilê Pîrût û Şêrko ewqas pê neşikestin. Pişt re kek Mamend qelûnek dagirt û mijek lê da û ji nû ve dest hi xeberdana xwe kir û got:

– Kuro lo, çi dibe bila bibe, destê we xweş be. Ji xwe wan reîs û axayan heşra me anîbûn û me ji destê wan îdare nedikir. Em di bin destê wan de mirin. Ji xelkê jî wisan e ku mirovên Komeleyê hatine riya wan birîne û ew sekitandine, ew nizanin ku Pîrûtê me yê 'ecemî bûye mêr û bi xencer ketiye ser dilê wan reîs û meyîsan. Mezinan meseleyek meşhûr gotine: "Cehşên bi pirç, gulikên bi zik û zarokên lixêz esîl in", bi Xwedê Pîrûtê me yê bipirç jî ji wan e.

Dema ku kek Mamend ev got, Şêrko û Pîrût dest hi ken kirin û ew bi xwe jî keniya û ji kenê wî jî dihat dîtin ku kek Mamend bi kurê xwe serbilind e. Navekê re hersê jî bêdeng bûn û pişt re Şêrko hilda û got:

– Tu rastiyê bixwazî kek Mamend, êdî di vê rewş û halê han de em nikarin li vir bisekinin, dibê em berê xwe bidin rê û biçin welatekî din. Her çendîn ji bo rêbirî û kuştina fermanderê eskerî kesek şikê ji Pîrût nake, lê herkes dizane ku şewitandina lodan û kuştina Mîne Axa karê me ye.Temamê xelkê Kanîkîsele dizanin ku qatilê xwîşka min Mîne Axa ye û min kîna wî di dilê xwe de veşartiye. Vêca em niha hatine ji te dipirsin û em dixwazin serê xwe hildin û hiçin, hizanin ka dê Xwedê me rastê çi bîne.

Pîrût jî, ji bo ku ew gotinên di dilê wî de ne ji babê xwe re birêje, wî jî piştî Şêrko hilda û got:

– Bi Xwedê babo, êdî ru min bikujî jî ez ji mala Qerenî Axa re ulam nakim û êdî ez naxwazim dujînên axa, muxtar û gizîr seh bikim. Niha êdî tivinga min heye û ez Şah jî ji xwe re bi xulamtî qebûl nakim. Ez dixwazim serbest bijîm û li hemberî tu kesî serî netewînim.

Kek Mamend bi bihîstina van gotinan ji devê kurê xwe, çavê wî tejî rûndik bûn û got:

– Ax ez çi bikim, jin û zarok ser pişta min in, hekene welleh dê ez jî bi we re biketima rê û wê çaxê dê we bidîta dê min çi heşrek bi serê van axa, reîs û meyîsan de bianiya.

Dema ku Pîrût ev gotinên babê xwe seh kirin, kelegirînek hatê û got:

– Babo êdî tu kal bûyî, li mala xwe rûne û wan karan ji me re bihêle. Niha dewr dewra me ye.

Dema ku kek Mamend ev gotin seh kirin, hinekî berken bû û got:

– Kurê min, "dema hirç dikeve kutkên wî bi gunikên wî dileyzin", li gor te jî ez niha kal bûme û tiştek ji min nayê. Welleh niha jî di nîşan, cirît û pişthespiya xwe de ez sed kesên wek te ji cêba xwe derdixim. Te seh kiriye ku dibêjin: "hêstir bimre jî postê wî barê sed keran e...".

Pîrût serê xwe kir ber xwe û Şêrko jî bi kek Mamend re dest bi ken kir. Pişt re kek Mamend hilda û got:

– Xwedê alîkarê we be, herin, lê min jibîr nekin û car caran serî li min bidin...

* * *

Şêrko û Pîrût bi şev bêyî ku bizanin dê bi ku ve biçin û armanca wan çiye, ji Kanîsewzeyê derketin.

Pîrût, piştî kuştina fermanderê eskerî û Mîne Axa êdî bîr û baweriyên wî yên di derbeqê dinyayê de bi temamî hatibûn guhertin, tenê melheza şer, rêbirî, mêrkujî û tiving di mejiyê wî de bebû û ji van pê ve qet fikra tiştekî din nedikir. Hemû hewlên di mejiyê Pîrût ew bûn ku, bi serbestî bijî û bindestiya tu kesî neke. Lê nedizanî jiyana riyek wiha çawane, tenê di hişê wî de tiving hebû. Herçî Şêrko bû, bi awakî din li dinyayê dinêriya û ew wek Pîrût di fikra şer, rêbirî û kuştîniyê de nebû. Şêrko jî dixwest bi serbestî û bi azadî bijî, lê ne bi xwe bi tivinga xwe ve li çiya û baniyan...

Herdu bi hev re dimeşiyan, lê her yek ji wan bi awakî din difikirîn, wek dibêjin: "dil agahê dil e", ew jî ji dilê hevûdu agahdar bûn. Ji nişkave Şêrko dest bi xeberdanê kir û got:

– Pîrût, were em îşev xwe bigihînin Berdereşê û bibin mêvanê Mîrza Qutas. Mîrza Qutas miroveki dinyadîtî ye û destebirayê babê min e jî. Mirovekî gelek têgihiştiye û emê lê bişêwirin û bizanin ka dê ji me re çi bêje.

Pîrût razî bû û herdu ber bi Berdereşê ve ketin rê û nêzîkî paşîvan gihîştin qonaxa xwe û ji hewşa Mîrza Qutas derbazê jorê bûn. Dema ku çavê Mîrza Qutas bi van herdu xortên bitiving ket hinek silikî, lê silav û hurmetên Şêrko ew nerm kir û gelek bigermî xêrhatinî li wan da û ew birin li serê jorê odê dan rûniştandin.

Mîrza Qutas di salên xwe yên zaroktiyê de di hucreyên feqîtiyê de wek şagirt hinekî li ba mela xwendibû û heta "Mirîşka Reş" hatibû. Dema ku roja ew gihîştibû sûreta "'Ebese wetewella, encaehû'l–'ema, wema yûdrîke le'elellahû yêzzekûma", ji Mîrza Qutas re gotibû: "Qutas, 'ebese yanê xwen-

din bes e, wetewella yanê bûye mela, wema yûdrîke yanê gelek e, bê ji mela re mirîşka reş e...". Zirediya Qutas mirîşka reş nedabûyê ku ji mela re bibe û wî jî dev ji xwendinê berdabû. Lê bi wê qasê xwendina xwe jî dikarî lîsteya goşt û deynên dikandar binivîse. Vêca ji ber vê, hê di zaroktiya wî de xelkê gund navê Mîrza Qutas pê ve danîbûn. Ji bo pêşdebirina paşnavê xwe Şahnameyek Firdewsî ya çerimkirî destê xwe xistibû, beşa piraniya helbestên wê jiber kiribûn û bi şev xelkê gund li dora wî berhev dibûn û wî bi dengekî xweş ji wan re dixwend. Ew xelkê nexwenda yên li dora Mîrza Qutas berhev dibûn û tenê li devê wî dinihêrî û tiştek ji wan helbestan fehm nedikirin, digotin: "mirovekî ku hikare kitêbek evqas sitûr bixwîne, bêşik dibê ew melayekî dowanzdeh ilmî be...". Mîrza Qutas car caran bi siyasetê ve jî mijûl dibû. Di salên dawiyê yên Hukumeta Pehlewî de bûbû katibê axayê Berdereşê. Ji ber ku axa mirovekî nexwenda bû, dema ku karekî wî biketiya îdareya dewletê di ciyê xwe de Mîrza Qutas dişand.

Mîrza Qutas, ji destê memûrên dewletê û bi taybetî jî ji destê jendirme, polês û îdareya eskerî ewqas 'ezab, eziyet, zulm û zordestî dîtibû ku, qasê dinyayê kerba wî ji wan vedibû. Wî bi çavê serê xwe dîtibû ku karbidestên dewletê bi çi awayê sivikatî bi neteweyê wî, zimanê wî, orf û adetên di welatê wî de hene dikin. Eger ji destê wî bihatiya dê wî di cî de ew perçe perçe bikirina û yan hi qewlê wî ku bi xwe digot: dê bişandiya "cehennema mûşeret". Mîrza Qutas gelek ji neteweyê xwe hez dikir û dema ku Şahname dixwend bi kibrî û serbilindî ji xelkê re digot: "ew pehlewanên ku Firdewsî behsa wan dike, hemû kurd bûne. Lê rûyê zemên reş be, niha dewran guheriye û mişk û koremişk siwar in û şêr û pi-

ling peyane. Di şûna bazan de qirik diqirin, di şûna qulingan de kund dixwînin...".

Dema Riza Xan de, her çendîn pêç û piştînî hatibûn qedexekirin û çi kesê wergirtiya jendirman lê dixist, eziyet lê dikirin û ceza dikirin, lê li gel vê jî Mîrza Qutas pêç û piştînî danenîbû. Tenê dema ku axa ew ji bo karekî dişand bajêr, li nêzîkî bajêr pêça xwe dikir paxila xwe û kulavekîqirêj û kevin yê "pehlewî" dida serê xwe. Dema ku dam û dezgehê Riza Xan têk çû, Mîrza Qutas berê hemû tiştî ew kum da ber pehînan û ew di huzura xelkê gund de şewitand.

Têkçûna Hukumeta Pehlewî, çekdariya kurdan, avabûna Komeleyê li Seblax û hêdî hêdî belavbûna bîra rizgarîxwazî li Kurdistanê, di dilê Mîrza Qutas de ronahiyek peyda kiribû û hêviyek wî ya zêde ji dahatû re hebû. Mîrza Qutas çûbû Seblax û li wir bi nehênî bûbû endamê Komeleya J. K. û ji aliyê Komeleyê ve jê re serokatiya liqa Berdereşê û derdora wê hatibû dan. Dema ku Mîrza Qutas xeber dida, ji bo tesîrê li ser ew kesên di meclisê de ne bike, gotinên farisî, erebî û kurdî têkel dikirin.

Piştî ku xêrhatinî bi Şêrko û Pîrût da û xwarin da wan, ji wan pirsî:

– Oxira we a xêrê be, ka bifermin em bizanin em bizanin hûn ê bi van sîlehan biçin heta ku?

Şêrko, ji bo ku nasiya wî bi Mîrza Qutas re hebû, çend caran çûn û hatina wî çêbibû û baweriyek wî ya zêde pê hebû, ji serî heta binî her wek ji babê xwe re bêje hemû serpêhatiyên xwe jê re gotin. Piştî ku gotinên xwe temam kirin, jê re got:

– Belê ezbenî, hal û ehwalê me bi vî awayî ye, niha em hatine mala te û bi te bişêwirin û ji me re çi feydeye wê bêjî û

em bikin.

Mîrza Qutas qasekî ponijî, melheze kir û ket nav bîr û xeyalan. Enîşkê xwe danî ser ranê xwe, destê xwe da ber çavên xwe û pişt re destê xwe bi rûyê xwe de anî xwarê û got:

– Welleh ez jî li insanên wek we digeriyam û va Xwedê hûn ji min re şandin. Babê min, we qet navê Komeleyê sehkiriye?

Pîrût got:

– Belê min seh kiriye. Dibêjin dijminê axatî, reîs û meyîsê 'eceman e û xelkê digot şelandin û kuştina fermanderê eskerî yê Seqizê jî karê Komeleyê ye...

Mîrza Qutas hinekî berken bû û got:

– Berê hemû tiştê Komele dijminê hemû 'eceman nîn e, tenê dijminê wan reîsan e ku zulm û zorê li millet dikin. Komele rêbirî û kuştina kesên bê xeta û bê guneh karekî xirab û qebehet dihesibîne. Wisan dixuyê hê hûn baş Komeleyê nas nakin. Vêca guhên xwe bidin min û ez ê ji we re bêjim:

– Ez ji axayê xwe re bêjim, Komele ji bo azadî û îstîqlala kurdan hatiye avakirin. Îddîa dike ku, dibê malê milletê kurd di destê wî de be, bi zimanê xwe xeber bide, sen'et, avahî, kultur û karên tibbî li Kurdistanê pêşde biçe. Komele dixwaze jendirme û ajanên biyanî hakimiyeta xwe li ser milletê kurd rakin, muqeddesat, orf û adetên kurdî neyên rencîde kirin...

Gelek pêwistiya Komeleyê bi xortên wek we heye, ji bo ku hûn jî bêçare û derbeder bûne, ji bilî Komeleyê pişt û penayek we tune. Werin daxilê Komeleyê bin û di riya wê de ji bo fedakariya ruhê xwe amade bin.

Şêrko ku gelek bi hişyarî guhê xwe dabû gotinên Mîrza Qutas û got:

– Bi rastî me jî navê Komeleyê seh kiriye û me dixwest em di derheqê wê de zêdetir bizanin û gelek baş bû ku te em serwext kirin. Lê, emê çawan xwe bi mirovê Komeleyê bidin nasîn û emê wê çawan peyda bikin?

Mîrza Qutas dikir ku bersîva Şêrko bide, lê Pîrût berî wî dest pê kir û got:

– Kekê min, bi Xwedê ez bi wê razî nîn im. Niha dewran guheriye, welat têkelhev bûye û kes–kesayetî ye. Çek ketiye destê beşa piraniya kurdan. Hinek mijûlin ji dijminê xwe tole vedikin û hinekên din li ser riyan di bin beran û di kuncan de xwe bêdeng kirine û dixwazin bin û bintarê dewlemendan rût bikin. Çiyê me ji wan kêmtir e! Tivinga me? heye, em di kuştinî û rêbiriyê de bêkêr in? nexêr em ne bêkêr in. Mîrza Qutas, tu dizanî dema ku me reîs kuşt û bi kek Şêrko re Mîne Axa daliqand, me çi zewqek jê sitand!! Tu tişt ji wê xweştir heye ku tu destê xwe bavêjî pêsîra dijminê xwe û serbikevî û wî bifewtînî. Ne, ne bira, were em bi serbestî û bi azadî bijîn û serî ji tu kesekî re netewînin...

Mîrza Qutas, ku çavên xwe kiribûn nav çavên Pîrût û gelek bi hişyarî guhê xwe dida wî xortê xwîngerm, li gor mantiqa xwe dest bi xeberdanê kir û jê pirsî:

– Çend axayên ku dijminê te ne hene?

Ji bo ku Pîrût mebesta pirsa Mîrza fehm nekiribû, got:

– Du kes hene, yek ji wan niha li Cehennemê piyên xwe dirêj dike û yê din jî hê maye.

Mîrza Qutas:

– Ê baş e, ew hemû axayên ku xwîna bi sedan hezaran gundiyan dimijin, dijminê te nîn in? Gelo ji bo ji wan tolevekirana xelkê ru ne amade yî?

Mîrza Qutas nehişt Pîrût bersîva wî bide û ji bo ku wî hê

baştir têbigihîne, cardin jê pirsî:

– Tu dixwazî bi çekê xwe ve bi azadî û bêyî kesek ji te re bibe asteng bigerî?

Pîrût bi sehkirina van pirsan, wisan zanî ku Mîrza Qutas jî eynê wek wî difikire, bersîva wî da û got:

– Êê, ez çi dibêjim? Ez bi zimanê 'eceman xeber didim!

Mîrza Qutas cardin Pîrût da ber pêlên pirsan û jê re got:

– Gelo tu dixwazî hemû wextê kincên kurdî li xwe bikî? Gelo tu dixwazî mirovên xwe ji bindestî û talanê xelas bikî? Gelo tu dixwazî bi azadî li mala xwe rûnî? Gelo tu dixwazî bera zehmet, cefa û keda te ji te re bimîne û tu têr û tejî bî? Gelo tu dixwazî...

Mîrza Qutas dixwest çend pirsên din jî jê bike, lê Pîrût gotina wî birî û bixeyîd jê re got:

– Mamê Qutas, wisan dixuyê ku tu min ker hesêb dikî, axir ez jî eynî tiştî dibêjim û ji ber wê ye ku ez dixwazim derkevim serê şax û çiyan, bi serbestî bijîm û serî ji kesekî re netewînim.

Pîrût di dilê xwe de gelekî kêfxweş bû ku bîrûbaweriyên Mîrza Qutas jî eynî wek yên wî ne. Mîrza Qutas ev fehm kir û piştî demek bêdengiyê, got:

– Ne xortê delal, me'neya gotinên min bi wî awayî nîn e ku te fehm kiriye. Rêbirîn û li şax û çiyan mayîn netîceyekê nade, tu tenê bi serê xwe nikarî tiştekî bikî. Te seh kiriye ku dibêjin: "bi gayekî tenê gêre nabe", te bi çavên serê xwe di dema şelandin û kuştina fermanderê eskerî de birîndariya hevalê xwe dît. Em ferz bikin ew hevalê bimiriya yan ew nebûya tu bûya. Wê çaxê hem tu pê şermezar dibûyî û bem jî xwîna we bêfeyde dihat rêtin. Di dema rêbirî û şer de insan hemû wextê bi ser nakeve. "Cêra avê hemû wextê ji kaniyê

saxlem venagere", ev meseleke meşhur e.

Xerez ew e, irsan bi rêbirî û kuştinê dikare du–sê kesan bikuje, yên mayî dê çi lê bên? Nexêr 'ezîzê min, ew riya te daye pêşiya xwe riyeke rast, saxlem û baş nîne. Riya rast ew e ku, tu ne tenê ji bo nefsa xwe belko ji temamê civakê re bixebitî û qazanc û menfeetê bigihînî millet. Wê çaxê jî eger tu di wê riyê de bê kuştin tu dibî şehîd, toleya te tê vekirin û navê te dikeve nav rûpelên dîrokê...

Mîrza Qutas qasekî bêdeng ma û cardin dest pê kir û got:

– Te qet seh kiriye ku hemû erbab ji Komeleyê ditirsin?

– Belê min seh kiriye.

– Haa... gotin li ser vê cewherê ye. Eger ji rêbir û şer an ji min ji te tenê erbabek bitirse, ji Komeleyê hemû erbabên zalim û qatil ditirsin. Bi navê Xwedê, ziravê jendirme û ajanan jî jê diteqe û ji tirsa Komeleyê ji bo xwe bisitirînin li kûnên mişkan digerin...

Wê navê re Şêrko, ku heta wê demê bêdeng mabû, carek din pirsa xwe dubare kir û got:

– Dê baş e emê çawan mirovên wê komeleyê peyda bikin?

– Ezbenî ez yek ji wan im, ez amadeyê xizmeta we me û werin ez ê kar bidim we û we bibim Sablax...

Dema ku Pîrût ev gotin seh kirin, çav li Şêrko kir û gelek lê 'ecêb hatibû ku Mîrza Qutas mirovê Komeleyê ye. Li gor Pîtût, mirovên Komeleyê xwediyê reng û rûyekî taybetî ne. Ji ber vê gelek bi 'ecêbmayî pirs kir:

– Kek Mîrza, çawan, tu jî Komele yî, erê çima tu nîşanek bi te ve nayê dîtin?

– Xortê delal, nîşana Komeleyê di nav çavê insan bi xwe de nivîsandiye, dibê di dilê însên de cî girtibe. Komele jî ji insanên wek min û te pêk hatiye.

– Êêê baş e, "karê" te çiye ku dê tu bidî me? Dê tu niha wê muhur bikî?

Mîrza Qutas dest bi kenê kir û got:

– Ne berxê min, ez tu muhur pê ve nadim, karê te kaxezeke, tu wê dikî paxila xwe û ew dibe heval û hogirê te, ew dibe namûs û şerefa te. Tu di nav millet de bi wê rûpela kaxezê tê nasîn.

Gotinên Mîrza Qutas ên sade lê pirr bi me'ne û zelal di dilê Pîrût de cî girtin. Pîrût, bi dilxweşî û serbilindî eynî wê demê bi Şêrko re amade bû ku bi destê Mîrza Qutas bibe endamê Komeleya J. K. Li ser vê, li gor adetan heft caran bi Qur'anê sond xwarin ku, di riya armancên Komeleyê de ji fedakirina ruhê xwe texsîratî nekin...

Şêrko û Pîrût çend rojan bi mêvanî li mala Mîrza Qutas man û piştre xwediyê malê ew girtin û bi xwe re birin Sablaxê...

* * *

Ew sê kurd bi dilekî gelekî bihêvî û bi daxwazeke xweş ji Dolê (Geliyê) Besrî serketin û Sablax pêş wan ve xuya kir. Mîrza Qutas hem rêber û hem jî rîsipiyê wan herdu xortan bû. Ji ber wê her tim çavê Şêrko û Pîrût li devê wî bû ku tiştekî bêje û ew jî pêk bînin. Te digot Mîrza Qutas di dilê hevalên xwe de ye, ji ber vê dest bi axaftinê kir û got:

– Ez bi ax û huzura mubarek bikim va em gihîştin Mahabadê. Ka vêca werin em bikevin nav Baxê Qazî hinekî bêhna xwe vedin heta tarî dadikeve, piştre emê herin bajêr mala Kek Siwar û we pê bidim naskirin. Kek Siwar mêrekî hêja ye, endamekî çeleng û bi nav û deng ê Komeleyê ye û em bi

riya wî bi Komîteya Merkezî re danûsitandin datînin...

Mîrza Qutas, piştî ku tarî bû ji aliyê Gerawan ve ket nav bajêr û çûn mala kek Siwar a li Taxa Xirî. Kek Siwar li mal nebû. Maliya wî mêvan birin jor û ji wan re got dê niha mêrê wê jî bê. Mêvanan hê şûşeyek çay venexwaribûn Kek Siwar ket hindur û gelek bi germî xêrhatinê bi Mîrza Qutas û hevalên wî da.

Mîrza Qutas, ji bo ku bi Kek Siwar bide fehm kirin ku hevalên wî jî ne xerîb in, endamên Komeleyê ne û dikare piştrast be û bê girê û asteng biaxive, bi vî awayî got:

– Birader, ev herdu xortên han, ku navê vî delalê han Şêrko û yê vî delalê han jî Pîrût e, bûn endamên Komeleyê, ji ber vê tu dikarî bi awakî vekirî bi wan re sohbet bikî. Navê Şêrko yê nehênî "Azer" û yê Pîrût jî "Bira" ye...

Kek Siwar gelek pê dilxweş bû û bi berken got:

– Vêca Mîrza Qutas, ru ku kesekî hevbîr û heval nebe qet tînî mala min. Çawan çavê min bi wan ket min zanî ku ew heval û hevriyên me ne û dirubê welatparêziyê bi wan ve heye, hûn gelek gelek bixêr bên...

Mîrsa Qutas serê xeberdanê daxist û got:

– Ev herdu xortên han gelekî bêçare mabûn û hatin mala min ku ez tedbîrekê ji wan re bibînim. Min jî biryar da ku ez ew bikim endamê Komeleyê û bînim vir.

Pişt re mîrza Qutas serî heta binî hemû serpêhatiyên Şêrko û Pîrût ji kek Siwar re neqil kirin û wiha domand:

– Ew nikarin êdî li gundê xwe rûnin, tu şik tune ku niha jendirme û axa wek seyên har li wan digerin ku wan bigrin û ceza bikin. Bila şikirandin tê de tunebe, lê li derûdora Seqizê hê jendirme dikarin mudaxeleyê hemû awayê kar û barên kurdan bikin. Ez hêvîdarim ku hûn bikarin wan li vir bipa-

rêzin, bêguman dê ew hemû emir û daxwazên we bicî bînin û nahêlin mamê wan Qutas şermende be...

Dema ku Komeleyê li hemû ciyê dest bi têkoşîna nehênî kir, pêwistiyek zêde bi xortên aza, serînetewandî û têkoşer hebû. Endamên Komeleyê yên berpirsiyar lib lib ber bi navçeyên cîhê cîhê yên Kurdistanê ve dîçûn ku şaxên Komeleyê damezrînin û zêdetir xelkê ber bi xwe ve bikêşin. Di beşa piraniya Kurdistanê de hê jendirme, ajan û li çend ciyên din jî beşên ordiyê û her wiha kesên xwedî milk ên zordar û welatfiroş destê wan dirêj bû û bi hemû hêzên xwe ve li ser riya avabûna Komeleyê asteng û dijîtî pêk dianîn. Çi gundiyekî li hemberê zulm û zordestiya ji heddê xwe derçûyî ya xwedî milk lêvên xwe jî ji ser hev rakiriya, bêgotin navê Komeleyê pê ve dizeliqandin û dihat girtin. Hetta axayek li navça Şarwêranê ji bo ku ji gundiyên din re gotibû werin em biçin têkevin nav Komeleyê guhê kurmancekî birî bû.

Kovara Niştiman, ku belavkerê bîr û baweriya Komeleyê bû, nû dest bi weşana xwe kiribû û belavkirina wê di seranserê melbendên Kurdistanê de li ser milê berpirsiyarên Komeleyê wezîfeyek gelek giran, zehmet û cefa bû.

Rûniştiyên Kurdistanê, bi taybetî gundî bi awakî nedîtî di pê bîr û baweriya nûnerên Komeleyê de diçûn û bi dil û can endametiya wê qebûl dikirin, çiqas ji wan bihatiya ewqas zêde heqê xwe yê endametiya Komeleyê û alîkarî ji sandoqa Komeleyê re dikirin.

Derketina hejmara yekê ya Kovara Niştiman wek dengê birûskê di serarserê Kurdisranê de deng da, çi kesên hinekî jî bûya xwendina wan hebûya, yên xwedî milk, tucar, mela, feqî û xwendewar ji hemû milan ve hewil didan ku hejmarek wê bidest bixin. Niştiman li ser destan digeriya. Ew helbes-

tên tê de dihatin belav kirin, bi taybetî ew munaqeşeyên Bayîz û Bapîr ku bi awakî kûr û xumalî derdê hindur dida xuyakirin û axatî û serokeşîretên welatfiroş didan ber pêlên rexne û lomeyan, ew hetta ji aliyê nexwendewaran ve jî dihatin jiberkirin û li her cihî behsa Bayîz û Bapîr dihat kirin.

Komîteya Serokayetiya Komeleyê li hemberê daxwaz û ruhiyeta rûniştiyên Kurdistanê pê re nedigihîşt ku kovara Niştiman bigihîne hemû cihî, ji ber vê gelek îhtiyaca wan bi xortên mêrxas, têkoşer û aza hebû ku bi riya wan bi hemû teşkîlatên xwe re peywendî dayne û kovara Niştiman di nav kurdan de bide belav kirin.

Kek Siwar bi van xortan gelek kêfxweş bûbû û di dilê xwe de digot: "ew ji me re gelek pêwist in û dikarin karekî gelekî zêde ji me re bikin...". Kek Siwar berê xwe da Mîrza Qutas û got:

– Emê sibe êvarê Azer û Bira bigrin û biçin ba Kek Bînayî. Dê hevalên din jî bên wir û ew çi bêjin emê wisan bikin. Ez bawerim ku dê xêrhatinek gelek germ li wan bê kirin...".

Ciyê Komîteya Serokatiya Komeleyê li taxek Sablaxê di mala miroveki herî dewlemend de hatibû bicî kirin. Ew mirovê dewlemend, di dema Riza Xan de gelek eziyet dîtibû û tenê piştî têkçûna dîktatoriyê karîbû nefesekê bistîne. Ew ji dil miroveki welatparêz û kurdhezker bû. Bi nehênî alîkariyek gelek zêde ji Komeleyê re dikir, lê kesekî şik jê nedibir ku ew welatparêz e. Ji ber vê jî Komîteya Serokatiya Komeleyê xaniyê wî ji navenda têkoşîna xwe re helbijartibû ku ji çavdêriya dijmin dûr bikeve. Çend deriyên wî xaniyî hebûn, temamên endaman ciyê wê nedizanîn û hetta beşa piraniya endeman hevûdu jî nasnedikirin. Her yek ji wan bi serokê komîteya xwe û bi çend kesên din re peywendiyên wan he-

bûn.

Roja din êvarê Kek Siwar û heval çûn, dema ku gihîştin kolanekê ji wan re got:

– Hûn li vir bisekinin heta ku ez têm.

Qasek derbas bû Kek Siwar hat û heval dan pê xwe û meşiya û nêzîkî deriyekî bû, çar caran lêxist û derî vekirin. Di nav xaniyekî tarî de meşiyan û pişt re çend kapangan derketin jorê û çûn odeyekê. Di odê de çirayek fitîl diteyîsiya, kesek li wir tunebû û çend kursî li ortê hatibû danîn. Di koncek odê de perdeyek bi dîwêr ve hatibû daliqandin û berê hemû tiştên wê perdeyê bala Şêrko û Pîrût kêşa. Gelek bi dîqqet li perdeyê dinêriyan ku, ji nişkave ji pişt wan ve mirovek ket hindur û got:

– Şevbaş!

Kek Siwar û Mîrza Qutas di cî de rabûn piyan û Şêrko û Pîrût jî ji ciyên xwe rabûn. Ji awa û sekna Kek Siwar û Mîrza Qutas dihat zanîn ku ew miroveki mezin e, mimkun e ew Bînayiyê ku li mala Kek Siwar behsa wî hat kirin ew be...

Hê hemû li piyan sekinîbûn, Kek Siwar hilda û got:

– Qurban, ew herdu xortên ku min ji we re erz kiribûn ev in û ji bo xizmeta we hatine.

Kek Bînayî mirovekî bejindirêj, çarmil û qelew bû. Temenê wî xwe li çil–çilpênc salan dida û riyê xwe yê kehrebarî û tenik hinek berdabû û daîma berken bû û vê hinek din jî wî xwînşêrîn û xweşik kiribû. Cilûbergê melan ê sade lêbûn û ger kesekî nenas ew bi vî halê ve bidîta dê bigota ew feqiyê hejar ê Mizgefta Rûstem Begê ye.

Kek Bînayî berê xwe da xortan û ji wan pirsî:

– Xortên delal navên we çi ne?

– Qurban Şêrko û Pîrût.

Dema ku Kek Bînayî ev nav seh kirin, bi awakî nejidil li Kek Siwar û Mîrza Qutas nêrî û wan ji çavên wî derxistin ku dibêje: "we ew perwerde nekirine, wisan dixuyê ku we navê nehênî jî li wan nekiriye...".

Mîrza Qutas pê hesiya ku Kek Bînayî ew qels dîtin, hilda û got:

– Qurban, bibexşîne navên wan ên nehênî Azer û Bira ye. Bi rastî min terkexemî kir ku ez wan têbigihînim û ji wan re bêjim ku dê hûn ji vir şûn de navên xwe yên nehênî bi kar bînin.

Ev gotinên han li Şêrko û bi taybetî jî li Pîrût gelek ecêb hatibûn û qet hîn nebibûn ku bi navekî din bên hangkirin.

Kek Bînayî wek ku fikra dilê wan xortan de xwendibe dest bi xeberdanê kir û got:

– Lawên min, rûyê dinyayê reş be, lawên kurd ji bo ku bikarin xwe ji destê dijmin biparêzin hinek caran mecbûr in navên xwe yên eslî danin milek û navên din li xwe bikin. Gereke ev bêhna we teng neke û divê hûn bizanin ku heta rêxistina me bi tevayî eşkere nebe navê we Azer û Bira ye û tenê bi van navan bangî hevûdu bikin ku hûn hîn bibin. Dê kek Azer û kek Bira, ka bêjin we fermanderê eskerî yê Seqizê û Mîne Axa çawan kuşt. Ev karê we kiriye li serarnserê Kurdistanê deng daye. Zurnevanên Tehranê, piştî kuştina Xwocendî digotin ku ev karê Komeleyê ye, lê piştî Mîne Axa hat kuştin û hûn herdu wenda hûn, êdî dev ji Komeleyê berdan û niha tenê navê Şêrko û Pîrût heye. Van rojên dawiyê li derûdora Seqizê çend karwan hatin şelandin û çend jî jendirme hatin kuştin, wan tevan jî kirin sitoyê we. Birayên min, niha hûn qehremanê rojê ne û li hemû ciyê li we digerin...

Dema ku Şêrko û Pîrût ev seh kirin, şaş man û li hev nêrîn

û di dilê xwe de digotin: "wî çi zû pê zanî...".

Şêrko dikir ku bersîva pirsên Kek Bînayî bide, lê mîrza Qutas dest bi xeberdanê kir û got:

– Qurban, kek Bira bi tu wechekî hazir nedibû ku bi me re be û her dixwest biçe kuştin û şelandinê bike, lê bendeyê we ew têgihand ku ev karekî bêfeyde ye...

Kek Bînayî rabû piyan û bi destê xwe perdeya ku bi dîwêr ve hatibû daliqandin, da milekî û çawan mamoste ji xwendevanên xwe re dest bide, bi wî awayî berê xwe da Şêrko û Pîrût û gelek bi hişyarî û hêdî got:

– Ev nexşa ku hûn dibînin a Kurdistanê ye, yanê ya welatê kurdan e ku niha hatiye çar perçe kirin û di bin hukmê biyaniyan de ye. Çerxa 20'an ku çerxa bidestxistina rizgarî û serbestiya gelên cîhanê ye erkek mezin kiriye ser milê nesla neteweyê kurd a îro. Îro neteweyê kurd ji hemû neteweyên cîhanê zêdetir paşketî, lêqewimî û bêmaf e, lê nêrîna bîr û ruhiyeta destxistina rizgarîxwazî û serbestî di nav neteweyê me de kok avêtiye. Tu bi kîjan kurdê re biaxivî di dilê xwe de li hemberê dagîrkeran bi kîn e xezeb e. Karzanî, azayetî, netirsî, liyaqat û nesersarî nîmetek Xwedê ye ku çavkaniya wan ji koka kurdan tê û têkelê nav şîrê dayîka me bûye. Vêca komela me ava bûye ku, ji bo rizgariya kurd û Kurdistanê ji destê dagîrkeran bîr û ruhê rizgarîxwaziyê bi xesletên taybetî yên kurdan re, ku min behs kirin, têkel bike û di tekeriyekê de pêşde bibe. Vêca ev jî bi gotin, mezintî û xwefişkirinê nabe. Li gor gelek kesan wisan e ku tenê bi gotina ez kurd im, tivinga min heye û ez kurdîtiyê dikim dê bibe têkoşer û şoreşger. Ne, ev ne wisan e, mirov wisan hêsanî nikare bibe têkoşer û şoreşgerê azadî û serxwebûnê. Têkoşer û şoreşgerên azadiya gel serbilindî û îftîxarek gelek mezin ên însaniyetê ne

û ji bo gihîştîna wê serbilindiyê dibê dibistana têkoşer û şoreşgeriyê re derbaz bibe û bikare ji hafa berjewend û ceribandinan derbaz bibe. Şoreşger, ji wan kesan re dibêjin ku temamê jiyana xwe ji bo xizmeta bextewerî û se'adeta gelê xwe amade kiribe, ji wan kesan re tê gotin ku xwe ji tu hevraz û nişovên jiyanê nedabe alîkî, xwe ji xelkê cihê nekiribe, ji xelkê piştsitor be, dahatûyê bi çakî, baş û ronahî hîs bike, dost û dijminên xwe ji hev cihê bike. Di dema pêwistiyê de pêşde biçe û dema ku paşvekêşan pêwîst bû dest û piyên wî li hev neale, ruhiyet û jîndariya xwe wenda neke, hêviyên xwe nebire û hêzek nû ya ji bo berbipêşveçûnê berhev bike. Bi kurtî dibê şoreşger xwediyê bername, helwêst û arınancek eşkere û ronak be. Ji bo hemû ev pêdawistiyên şoreşgêriyê dibê dibistana wê bê damezrandin ku ew jî partiyek pêşkevtî ye. Komeleya me di vê riyê de têkoşînê dike...

Niha ku hûn hatine dikevin nav sefên wê, berê hemû tiştî dibê hûn jidil bibin şoreşgerê wê riyê û dibê hûn hêdî hêdî dîroka bijarte ya netewe û welatê xwe hîn bibin û şarezayê riya berbipêşveçûna şoreşa wê bin...

Wê navê re xortekî xwînşirîn, rehsivik, çavbelek û simbêlreş ket hindur. Çavên wî wek sitêrkan dibiriqîn. Berkenek tejî ji behs û xeberên xweş li ser lêvan bû. Ev berkenek ewqas sipehî û xweşik bû ku te digot hemû uzwên bedena wî pê re dikene û mizgîniya serkevtinek mezin dide. Pêşî Kek Bînayî û pişt re jî yên din ji berve rabûn. Kek Bînayî berê xwe da wî û got:

– Kek Hêmin, şukir xêr e, ka ji me re bêje em bizanin...

Ew xortê hunerê tazegihiştî, lê meşhur û bi nav û deng ê Kurdistanê, Mihemmed Emînê Şeyxulîslam bû ku pişt re bû endamê Komeleyê û navê Hêmin lê hat kirin. Rêz û hezkiri-

nek taybetî ya Kek Bînayî ji Hêmin re hebû, pê serbilind bû û îftîxarê pê dikir. Qewîtî dikir ku hemû şiîrên bi pirme'ne, baş û spehî yên Hêmin jiber bikin û bikin programa têkoşîna xwe. Hêmin hê di gava yekê ya têkoşîna xwe de wek şairekî netewî û civakî bîr û baweriya xelkê ber bi xwe ve kêşabû. Çunkê helwêstên wî di rasteqîniya xwe de bûbûn eynika dilê civatên gel û danexuyakirina bîr û daxwazên wan. Hêmin hê ji roja yekê ya têkoşîna jiyana xwe ve ji bo parastin û pêşdebirina zimanê bab û kalan ê kurdî zendên xwe radabûn. Helbestên xwe bi zimanekî sade dihûnandin û bi zimanê gel xeber dida. Vêca Kek Bînayî lê qewîtî kiribû ku di ciyê gelek bêjeyên farisî û erebî yên di dema xebata siyasî de tên bikaranîn, bêjeyên kurdî bên dîtin û bikaranîn. Hêmin ji serokatiya komîsyona vê xebatê re hatibû tayîn kirin. Hêmin bersîva Kek Bînayî da û got:

– Qurban, welleh xeberek ewqas xweş li ba min heye ku eger ez ji we re bêjim mimkun e hûn bawer nekin. Va du roj bûn min hejmarek biraderên xwendewar, hunermend, pispor û zimannas berhev kirihûn ku em bizanin ka di zimanê kurdî de di ciyê bêjeyên serbaz, nîzamî, esker, mucahîd û fedayî de em kîjan bêjeyê bikarbînin. Em gelekî li ser peyivîn, girê û astengek mezin peyda bû, lê em negihîştin netîceyekê, em hemû westiyan û me daxwaza çayê kir. Kalekî dinyadîtî ji me re çay anî û bi ken ji me re got:

– Hema ez nexwendewar jî bim, ma ez ê bibim kafir ku ez bizanim ka gelo girê û astenga we li ser çi bû?

Me bersîva wî da û jê re got ku, nexêr tam eksê ku tu dibêjî, mimkun e tu bikarî alîkariya me jî bikî. Vêca bêje ka em bizanin mirov di kurdî de ji serhaz re çi dikare bêje? Pîremêr cardin keniya û got:

– Bêbela be, we xwe ji bo vê ewqas aciz kir. Ma we seh nekiriye ku di nav kurdan de ji mirovên canfeda re "pêşmerge" digotin.

Belê, ez hatime ku vê ji we re bêjim. Çunkê ez dizanim ku hûn gelek ji xeberên wiha hez dikin. Ew gotin gelek bi dilê kek Bînayî bû. Bi xwe jî çavên wî tejî rûndik bûn û bersîva Hêmin da û got:

– Bêmafî, zulm û zordariya bêhed û bêsinor hemû kurdên xwedî şeref kiriye welatparêz û ew ruhê welatparêzî piştivaniyek xurt ji bo bidestxistina azadî û serxwebûniya gelê kurd peyda kiriye. Vêca bizane wî kalê nexwendî heta çi dereceyê xwediyê wê ruh û hîsa welatparêziyê ye ku ew bêjeya sipehî û pirr bi me'ne li ser ferhenga zimanê neteweyê me zêde kiriye. Bi rastî dema ku mirov vê gotinê seh dike, xwe bi xwe kurdekî serînetewandî, aza, bikêr, netirs û karzan dibîne û hêviyên wî zêdetir û qahîmtir dibe. Ez hêvîdarim ev herdu xortên han jî ku hatine ba me cewherek wan hebe ku em ji wan re bêjin pêşmerge...

Şêrko û Pîrût ku gelek bi hişyarî guhên xwe dabûn van gotinan, ecêbmayî mabûn. Ji Pîrût webû ku ev gotinên han di xewnê de jê re tên gotin. Wî tu carî ew gotin seh nekiribûn, gelek ew gotinên ji aliyê kek Bînayî ve hatin gotin qet fehim jî nekiribû, çunkê kek Bînayî bi kurdiyek paqij û sade diaxift. Kek Bînayî li ser çend behsên din jî xeber da û piştre ji wan re got:

Baş e îro bes e. Kek Siwar ez Azer û Bira dispêrim te. Bila bi roj bigerin û bîhna xwe vekin, bi şev jî ji bo sohbetê bînin vir. Bila deh–panzdeh rojên xwe bi vî awayî derbaz bikin, hinek siyasetê hîn bibin, rewşa welatê xwe nas bikin û piştre emê wan îmtîhan bikin.

Êdî nêzîkî paşîvê bû û her çar derketin û hatin ınal. Di rê de Pîrût berê xwe da Şêrko û got:

– Ê baş e Şêrko te tu ji wan gotinan fehm kirin gelo?

Mîrza Qutas nehişt Şêrko bersîva wî bide û hilda û got:

– Kek Bira, ev nebû, qerarê me çibû, ma tu nizanî navê wî axayê delal Azer e.

Pîrût hinekî sor bû û dengê xwe nekir.

Şêrko û Pîrût çend rojên xwe bi vî awayî derbaz kirin. Bi roj diçûn bajêr û li nav bazarê digeriyan, li qehwexaneyê rûdiniştin û bi şev jî bi kek Siwar re diçûn Komeleyê û kek Bînayî di derheqê kurd û Kurdistanê de bi wan re sohbet dikir.

Rojekê li qehwexaneya ser Çemê Sor rûniştibûn, temaşe kirin ku hemû kes behsa çend serokeşêrîtên welatfiroş dikin, ku siwarên xwe li derûdora Sablaxê berhev kirine û dixwazin bi şev êrîşê bînin ser bajêr û wan talan bikin. Qazî jî mirovên xwe belavê nav bajêr kiriye ku çi kesên destên wan tiving digire, bila êvarê rahêjin tiving, tabance û xencerên xwe û çaraliyên bajêr bigrin û nehêlin siwarên eşîretên welatfiroş bikevin nav bajêr. Şêrko û Pîrût bêsekin ber bi mala kek Siwar ve ketin rê û tiştên ku seh kirihûn ji xwediyê malê re gotin. Pîrût got:

– Erê kek Siwar, ew Qazî kî ye ku xelk bi wî awayî bi hurmet behsa wî dike û pê wî de diçe?

– Kek Bira, Qazî Sablaxî ye, ji binemaleke gelek maqûl û bi nav û deng e, xizmetkarê kurdan e û çend sedsal e xizmeta vî neteweyê dikin, di vê riyê de fedakariyek zêde kirine û qurbanan dane. Di vê têkelhevî, girê û astenga niha de xelkê Sablaxê Qazî ji bo mezintiya xwe helbijartiye, bawerî û îmana wan pê heye û ji gotinên wî dernakevin. Qazî bi şev û bi roj bêsekin ji bo temînkirina hêminî, asayîş û jiyanek xweş ji

xelkê xwe re têdikoşe, hewil dide, dixebite û riya baş nîşanê wan dide. Hetta bi şev jî sekin nizane, li nav bajêr digere û bi xortên canfeda yên din re derd û êşa xelkê dikêşe ku nebe dijmin xewa şirîn li wan heram bike...

Pişt re kek Siwar ji wan re got:

– Haa, baş bû bîra min ket, kek Bînayî cewab şandiye ku em îşev hinekî zûtir biçin balê û tivingên xwe jî bi xwe re bibin.

Dema ku bû êvar û tarî daket, hersêkan tiving û rextên xwe hilgirtin û çûn Komeleyê. Dema ku ketin hindur dîtin ku kek Bînayî şal û çoxeyek gewr li xwe kiriye, tabanceyek lagan a tazî kiriye ber piştîniya xwe û li hêviya wan e. Çawan çavê wî bi wan ket, got:

– Kek Siwar, tu here li ba mirovên xwe yên li taxa te ne û ez ê Azer û Bira bi xwe re bibim.

Kek Bînayî herdu xort birin û ket nav bajêr û ji kolanekê derbazî kolaneke din dibû û ji taxekê diçû taxeke din. Ewqas kişt, sivik û geş bû ku Şêrko û Pîtût bi wê xortîniya xwe nedigihiştin wî û bihîn li wan diçikiya. Dema ku kek Bînayî dît hevalên wî westiyane, li ser dikekê sekinî û ji wan re got:

– Dê ka em hinekî bihna xwe vedin, pişt re emê herin rexê bajêr.

Di esnayê bihînvedanê de Pîtût got:

– Kek Bînayî, eger temamê xelkê bajêr wek te ji gotinên Qazî dernekevin, hişyar bin û herestiyê bikin, ne tenê siwarên eşîretan, leşkerê tu dewletê jî nikare êrîşê Sablaxê bike. Ku tu wiha yî ka gelo niha Qazî çawane?

Kek Bînayî bi sehkirina van gotinan berken bû û qet dengê xwe nekir. Pişt re Pîtût cardin dest pê kir û got:

– Erê baş e, mala Qazî li ku ye? mirovekî çawan e û navbe-

ra wî û Komeleya me çawan e?

Kek Bînayî bersîva wî da û got:

– Eger navbera wî û Komeleyê xerab bûya, me bi gotina wî herestiya bajêr nedikir û emê biçûna di nav lehêf û doşekên xwe yên nerm de raketina.

Pîrût cardin pirsî:

– Erê kek Bînayî, Qazî endamê Komeleyê ye?

Wisan dixuya ku hemû pirsên Pîrût bi kêfa kek Bînayî nebûn, ji ber vê jê re got:

– Lawê min, tu wextê hewlê hînbûna her tiştî nede, hekene dê pora serê te gelek zû sipî be û dê tu gelek zû kal bibî...

Pişt re kek Bînayî destmalek pêçayî ji bêrîka çoxeya xwe derxist û got:

– Azer, Bira niha hûn birçî ne, ka bi min re hinek nan, penîr û pîvazên hêşîn heye, werin em bixwin û pişt re emê rabin û ber bi qeraxê bajêr ve biçin û bi hev re serekî li heresan bidin.

Çend şevan heta beyana sibê kek Bînayî û ew herdu xort, li nav bajêr û derûdora wê digeriyan. Her şev kek Bînayî şal û çoxeyekî din li xwe dikir û bi awakî rengê xwe diguherî û hetta eger Şêrko û Pîtûr ji nişka ve rastê wî bihatina nedikarîn wî nas bikin.

Xelkê Sablaxê yê qehreman bi hişyarî û cansîperaneyek taybetî heresiya bajarê xwe dikirin. Ji ber vê, dema ku serokeşîretên welatfiroş ev hîs kirin mecbûr man paş de bikêşin û bi xwe re nedîtin êrîşê Sablaxê bikin.

Şêrko û Pîrût bi awakî wisan hînê rabûn û rûniştina kek Bînayî bûbûn ku te digot ji zaroktiya xwe ve ew nas dikirin. Kek Bînayî ne tenê wek mamostayekî, belko wekî hevalekî herî nêzîk û sade bi wan re dida û distand û di dema rabûn,

rûniştin û meşê de qet xwe ji wan jortir nedidît. Her çendîn bi temen 10–15 salan ji wan mezintir bû jî, lê xwe wek destebirayekî wan dihesiband û hemû awa henek û tinaz bi wan re dikirin. Şêrko û Pîrût jî, eger hûn rastiyê bixwazin êdî wek berê şermîn nebûn û raste rast pê re xeber didan û pê re henek jî dikirin...

Rojekê Şêrko û Pîrût li qehwexaneyê rûniştibûn, dîtin ku xelk dibêje îro dê milet li Çarçirayê berhev bibe û dê Qazî ji wan re biaxive. Ew jî ji bo daxwaza dîtina Qazî û guhdarîkirina gotara wî bi lez xwe gihandin Çarçirayê û li nêzîkî wê kursiya bilind ku li wir hatibû danîn sekinîn. Deste deste xelk dihatin meydanê û berhev dibûn. Di navbera seetekê de nêzîkî bîst hezar kes li wir berhev bûn. Bi awakî wisan li derûdora meydanê hatibûn hev ku te derzî biavêta li erdê nediket. Ji nişka ve ji aliyê rojavayê meydanê ve xelkê rê vala kir û melayekî derpêsipî, kale (reşik an çarix) di piyan de û hejindirêj di riya vekirî re ber bi aliyê kursiyê ve hat û temamê xelkê bi dîtina wî dest bi çepikan kirin.

Dema ku Şêrko û Pîrût baş li wî melayê nêrîn, dîtin ku ew kek Bînayî ye û di cî de ji kurdekî ku nêzîkî wan bû pirs kirin:

– Erê keko, Qazî kîjan e? xelkê digot dê îro xeber bide.

Wî mirovî li wan herdu xortan nêrî û zanî ku ji gundan hatine û ne beled in û ji wan re got:

– Yê xeber dide ew e Qazî.

Dema ku Şêrko û Pîrût ev seh kirin, ketin rewşek nemir û nejî de û temamê bedena wan di nav xwîdanê de ma û bi çavê xwe bawer nekirin. Her çendîn kek Bînayî nedizanî Şêrko û Pîrût li wir in, lê wan ji şerman nekarîn xwe li wir ragirin û ji dizîka ve ji meydanê dûrketin. Te digot zimanê wan bi-

rîne û heta wisan bûn qasekî bi hev re jî xeber nedan. Kek Bînayî rojekî berî wê ji wan re gotibû ku hinek zûtir werin ba wî. Rûyê Şêrko û Pîrût nedigirt ku biçin û ji şerman wext bû dîn bûna. Danê êvarê kek Siwar hat mal û dema ku ew di wî halî de dîtin ecêbmayî ma û sebebê xemgîniya mêvanên xwe pirsî:

– Çi li we qewimiye, ji bo çi hûn bi vî awayî xemgîn û melûl in?

Şêrko û Pîrût, hemû serpêhatiya wê rojê jê re neqil kirin û gotin ku rûyê wan nagre biçin li ba kek Bînayî. Lê kek Siwar li ber dilê wan ket û ji wan re got:

– Ne, ne, rabin herin û qet bi ser xwe ve jî neynin. Hûn nizanin kek Bînayî heta Xwedê bixwaze însanekî sade û xalis e û eger hûn neçin dê dilê wî ji we bimîne.

Şêrko û Pîrût nejidil û bi bej–hej rê ketin û dema ku gihîştin hindur, dîtin ku kek Bînayî bi cil û bergên wê rojê ve rûniştiye û kitêbek li ber wî ye û dixwîne. Ew hinekî bêdeng man û gotinek ji devê wan derneket. Pişt re ber bi pêş de çûn û xwestin destê kek Bînayî maçî bikin. Dema ku kek Bînayî ew dîtin ji ber wan ve rabû û nehişt ew destê wî maçî bikin û di cî de zanî ku wan xortan ew naskirine. Ji ber vê, ji bo ku şerma wan birevîne, ji wan re got:

– Dê baş e, we Qaziyê xwe yê çîpilrût dît?

Her çend kek Bînayî ji wan re gotibû rûnin jî, lê ew rûneniştin û destê wan li ser hev sekinîbûn û serê xwe kiribûn ber xwe. Pişt re Pîrût xwe lê negirt û got:

– Qurban, Qaziyê birêz li me bibore. Me heta niha te nas nedikir...

Kek Bînayî hinekî rûyê xwe tirş kir û got:

– Ji kengî ve ye ku ez ji we re bûme birêz Qazî! Kek Bira

herhalde te navê min ji bîr kiriye, ez li ba te ne birêz Qazî me, ez kek Bînayî me. Kekên min gelek e ev qet ji bîra we neçe, hekene dê emê rastê astengan bên û biçûktirîn terkexemiya me dê firset bide dijmin ku karê me yê nehênî bizane. Ji me re îro hişyarî, ew jî hişyariyeke zanatî ji hemû tiştî pêwîstir e.

Kek Bînayî hinekî bêdeng ma û pişt re bi berken got:

– We wisan dizanî ku şaxên Qazî hene û ew naşibin însanan? Ne, ne, birayên min, ez jî wek we me û tiştekî min ji yê we zêde tune, eger ji vir şûn de hûn wek destebirayekî û hevalekî li min nenêrin dê dilê min ji we bimîne...

Mutewazîtî û gotinên xweş û sade yên kek Bînayî şerma wan xortan revand, ew rûniştin û kek Bînayî ji wan re dûr û dirêj behsa dîroka Kurdistanê kir...

Pişt re kek Bînayî berê xwe da wan û got:

– Sibê dê makînek Lorî ber bi aliyê Urmiyê ve biçin, hûn jî siwarê wê makîneyê bin û vî torbê kitêban bibin bidin Cangoyê Herkî yê li gundê Sîrme yê navçeya Têrgeverê û bila belav bike. Lê tivingên xwe negrin ser xwe.

Şêrko û Pîrût, zû ve bi hêvî bûn ku ji aliyê Komeleyê ve, bi taybetî ji aliyê kek Bînayî ve ji wan re wezîfeyek wiha bê dan ku xwe pê bidin îspat kirin... Pîtût her çaveriya wê bû ku rojekê jê re bêjin here filan serokeşîrê welatfiroş bikuje yan tazî bike û bîne bajêr. An jî here filan fermanderê jendirman bişelîne. Lê qet hêviya wê nebû ku torbek kaxez bidin pişta wî û jê re bêjin here wan belav bike. Ji ber vê, gelek nejidil ji ba kek Bînayî derket û di rê de berê xwe da Şêrko û jê re got:

– Hêêê û hê, xwelî serê me, welleh me tamam kir! Vêca tu bi Xwedê bikî mirov bi kaxez û perran dikare zora dijmin bibe? Heyf nîne tu tivinga reş nîşanî dijmin nedî...

Şêrko bersîva wî da û jê re got:

– Ew ji me aqiltir in û dibê çi tiştên ew bi feyde bizanin em wisan bikin û kaxêz belavkirin jî karek e, li hemû ciyê tiving nayê bikaranîn...

Şêrko û Pîrût çi ji wan re hatibû gotin pêkanîn û pişt re cardin vegeriyan Sablaxê.

Êdî ew cotexort bûbûn 'ezîzê Komeleyê û çi karên ji wan re dihat spartin ew bi serfirazî pêk dianîn. Kek Bînayî çend caran wî cotexortê bi xwe re bir nav eşîretan, seferên dûr û dirêj û di eynê wextê de hemû rojan seetekê dersê siyasî jî ji wan re digot. Piştî salekê ew herdu xort hînê xwendin û nivîsandinê jî bûn.

Bi kurtî êdî Qulî ne ew Qulî bû. Bi qewlê kek Mamend, nav û dengê mêrxasî, azayî, karzanî û têkoşeriya Pîrûtê pirçîn li seranserê welat belav bû. Pîrût tenê di warekî de qels bû. Ew jî ew bû ku, dost û bîraderên wî jê re Bira digotin û navê xwe yê xweş yê kurdî nedikarî ji kesekî re bêje. Rojekê Pîrût bi çend dost û hevalên xwe ve, ku hemû endamên Komeleyê bûn, rûniştibûn û xwarin dixwarin û hemûyan ji hev re bira bira digotin. Ji nişka ve pişîkekî kir miyew–miyew û ket hindur û dema ku Pîrût pisîk dît wî dest bi ken kir. Ev halê wî li tevan gelek ecêb hat û jê pirsîn: tu ji bo çi dikenî? Pîrût jî ji wan re got:

– Li aliyê me melayek hebû û ji bo ku bi gotina "pişe–pişe" gelek dixeyêdiya, navê wî danîbûn "mele pişe–pişe". Feqiyan roja înan diçûn ratib berhev dikirin û ron, pirinc û mirîşk dianîn û bi awakî xweşik ew dipehtin. Dema ku bi emrê mela li dora sîniyê berhev dibûn û xwarin dixwarin, gurpe–gurp ji lêva mela yê jorê diket. Feqiyan jî ji tirsa mela nediwêriyan bêjin pişe–pişe û mecbûr diman bi dengekî din

pisîkê dûr dixistin. Yekî digot "wehe", yê din digot "heçe" û yê sisiyan jî digot "kis–kis". Lê pisîkê guhê xwe nedida wan gotinan û çavê wî bi çi perçê goştê xweş biketiya direvand. Çend caran ev bi vî awayî diqewime û di dawiyê de êdî sebra feqiyan namîne, rojek dema ku xwarinê dixwin cardin pisîk dikeve hindur û yekê ji wan dibêje: welleh eger mela min bikûje jî ezê bêjim "pişe–pişe". Vêca niha hûn min bikujin û kerî-kerî jî bikin hûn bi kêfa xwe ne, navê min Pîrût e, wî bira birayê bi min ve daneynin...

* * *

Pîrût, ji roja Kanîsewzeyê derketibû heta wê demê tu wextê bab, dayîk, xwîşk û birayên wî ji bîra wî neçûbûn û çend mehan carekê bi riya rêbarên nas çay, şekir, pere û pêlav ji mala xwe re dişand û kek Mamend di saya wî de ji destê zulm û zoriya ji heddê xwe derketî ya Qerenî Axa jiyanek nemir–nejî derbaz dikir û her wextê dua'ayên umrekî dirêj ji kurê xwe re dikirin...

Pîrût, çend caran Qerenî Axa tehdît jî kiribû û gotibû ku: "eger rojek jî jiyana min li ser rûyê vê dinyayê bimîne ez ê tola xwe û babê xwe ji te vekim...". Pîrût çend caran xwestibû ku ji bo pêkanîna karekî Komeleyê wî bi aliyê Seqizê ve bişînin, lê serokên Komeleyê dizanîn ku di şandina Pîrût li wir de tirs heye û li hemû ciyê lê digerin, ev daxwaza wî qebûl nekiribûn.

Qerenî Axa jî ji ber tehdîdên Pîrût di nav tirsek zêde de bû û bi awakî vekirî nediwêriya dijmintiya kek Mamend bike, lê di bin re û bi riyên cihê cihê re ji bo wêrankirin û perîşankirina mala kek Mamend ji tu xerabiyên necamêriyê paş de

nedima...

Di havîna sala 1945'an de, Pîrût ji aliyê Komeleyê ve bi du berpirsiyarên Komeleyê re ji bo karên siyasî ber bi navçeyên Makû, Xoy û Salmasê ve hat şandin. Çend meh bi ser vê seferê re derbaz bûn û di vê navê re Pîrût nekarî alîkariyek ji babê xwe re bişîne. Nehatina alîkariyê ji aliyê Pîrût ve û zerardayînên bi zanetî yên Qerenî Axa bi hasilata ku kek Mamend bi keda milê xwe anîbû ber berhem, rewşa wî malê di wê zivistana giran a sala 1945'an de rastê perîşanî, nexweşî û birçîtiyek gelek xerab kiribû...

* * *

Di dawiya sala 1944an de êdî Komeleya J. K. siya xwe bi ser seranserê Kurdistanê de berdabû û kar û barên Sablaxê bi awakî eşkere bi destê Komeleyê dihat meşandin. Komele, di nav beşa piraniya civaka rûniştiyên Kurdistanê de ji bo pêşdebirina şoreşê şert û mercên baş pêkanîbû. Êdî dema têkoşîna nehênî xelas bûbû û ew rewş peyda bûbû ku partî eşkere bibe û ji bo daxwaz û armancên civaka gel, yanê ji bo bidestxistina rizgarî, serxwebûnî û muxtariyeta Kurdisatnê dest bide ber xwe.

Di destpêka sala 1945'an de, êdî qefle–qefle kesên çekdar diçûn ba Komîteya Serokatiya Komeleyê û dixwestin wan bişînin melbendên Kurdistanê yên din û wan deran jî rizgar bikin. Qefle–Qefle xortên gundî, eşîretên welatparêz û feqîrên bajaran hatibûn Sablaxê û çaveriya qewîtî û emrê Komeleyê bûn. Li milê din, hatina leşkerên qehreman ên Barzaniyan, çend zabitên xwenda ên perwerdekirî, têgihiştî û pispor ên kurdê Iraqê, hê zêdetir tevgera şoreşê bihêztir û firehtir

kir û berî hemû tiştî pêwist bû rêxistina partiyê bibe çavkanî û mamosteyê rêkûpêkkirina tevgerê û handerê şoreşê û ev jî bi wan hat pêkanîn.

Komeleya J. K. ciyê xwe da Partiya Demokrat a Kurdistanê. Gava yekem a ji aliyê Partiya Demokrat a Kurdistanê ve ku hat avêtin, sazkirina hêza pêşmerge ya Kurdistanê bû.

Hêza pêşmerge... wê navê xweş ê kurdî hê zêdetir ruhê xortên xwîngerm welatparêz ên kurd geş dikir û azayetî, mêrxwasî û bikêriya wan ew kapang–kapang ber bi jor ve dibir. Hemû xortan hewil didan ku di riya rizgariya welatê xwe de bibin pêşmerge û ji hevalên xwe yên din pêştir bikevin. Pîrût jî yek ji wan xortên pêşmerge bû. Ji wê muddê ku nehênî bi Komeleyê re kar dikir heta vê çaxê, gelek caran hatibû ceribandin, di hemû karan de bi başî serketibû, di lêxistina nîşanê de û pişthespiyê de nav û dengê wî belav bûbû. Pîrût bi şev û roj mijûlê hînbûna fennên eskerî bû û çend rojan di bin destê zabitên kurdê Iraqê de wisan lêhat ku, di fennên eskerî de bêyî ku zanistgeha bilind a eskerî xwendibe ji gelek eskerên ordiya Şahînşahî şarezatir, tecrubetir û zanatir be. Berbijorve çûyîna wî rastê wê demê hat ku, êdî zanistgeha welatparêziyê temam kiribû û ruhiyet, bîr û baweriya xwe di nav wê zanistgehê de helandibû. Ew jî ji mirov re ji hemû zanistgehên zanistî binirxtir e û baştirîn dibistana têgiiştina mirov e. Pîrût gelek bi ser de derbaz nebû kirin zabit û fermanderiya 40–50 pêşmergeyan dikir û qehremaniya wî ya yekê jî di dema rizgarkirina Serdeştê de bû. Li ser vê qehremaniya han ji aliyê Pîşewayê Kurdistanê Qazî Mihemmed ve pîrozbahiyek taybetî ji desteya wî re hat kirin.

Ew desteya ku Pîrût fermanderiya wê dikir, ji xelkên cihê cihê yên Kurdistanê pêk hatibûn. Mirov di nav wan de

Hewşarî, Sablaxî, Barzanî, Şikakî, Seqizî, Kirmanşahî û yên din didît û herkesê bi devoka aliyê xwe xeber dida û hemûyan jî ji hevûdu fehm dikirin. Çunkê zimanê tevan kurdî bû. Armanc, bîr û baweriya tevan wek hev bû, yanê rizgariya Kurdistanê bû. Bi roj wan pêşmergan perwerdetiyê dikirin, hînên fennên eskerî dibûn û bi şev jî çend seetan hînê xwendin û nivîsandinê dibûn û piştî tev van kirinan jî li hev berhev dibûn henek, tinaz û yarî dikirin.

Şevekê piştî temambûna xwendinê hemû li hev berhev bûbûn û her yekî ji wan behsa serpêhatiya bûyereke xweş dikir û pişt re jî tevan bi hev re ji nîvê dilê xwe dest bi ken dikirin. Yê Mengûrî got: "Rojekê em li mizgeftê rûniştibûn û mela ji cema'etê re kitêb û Qur'an dixwend û digot: 'dinya li ser pişta gayê ye û ga jî li ser pişta masiyê ye, dema ku masî xwe bileqîne dê dinya xera bibe'. Dema ku min ev gotin ji mela seh kir, min jê re got: melayê birêz, ez bi hersê telaqê xanima Zîna xwe sond dixwim ku bi şer'a Xwedê û pêxember tu fetwa jê re tunebe, ez ji vê du'ayê re amîn nabêjim. Eybe ji te re eyb!"

Ebdulbaqiyê Kelhurî ku ji aliyê Hewşarê ve hatibû û bûbû pêşmerge, gelekî methê xwe dikir û gelekî jî ji xwe razî bû. Vêca berê xwe da hevalên xwe û got: "Ez bi Seyîdê Sefaxaneyê û Çinara Hewes Xan sond dixwim, ez ê êrîşek wisan bibim ser wan ku kok û xwîna wan sebaban bimalim...". Kurekî Kelhurî yê din ku nasê Ebdulbaqî bû û dizanî ku ew gelekî methê xwe dike û zirtan davêje, ji nişka ve hilda û jê re got: "Ebdulbaqî, ez bi Şalpîr Mihemmed qesem dikim tu derewa dikî, ka pêşî behsa tirsa xwe ya ji reşahiyê bike". Dema ku Ebdulbaqî ev seh kir, hinekî sor bû û got: "Sebab, tir li ku û das li ku, çi eleqa tirê bi das û ya Hemze bi Ebbas ve

heye, qey niha ciyê van gotinane". Lê pêşmergeyan dev jê bernedan û jê re gotin ku gerek e ew ji wan re behsa wê meselê bike. Ebdulbaqî dest pê kir û got: "Êvarekê qerebînaya min di berîka min de ye û ez ber bi aliyê Qozluyê ve diçûm. Di rê de min dît ku reşahiyek ber bi min ve tê û wek jendirman e. Min di dilê xwe de got: keçelo mala te ne ava, eger niha ji qerebîna min duman derkeve dê çawan be. Min pesnê xwe da û da ber zirtan û got: tu çavê min ê rastê yî Ebdulbaqî! Lê çiqas diçû hê zêdetir reşahiya sebab ber bi min ve dihat, ziravê min qetiya û di dawiyê de ez bi ser de qêriyam û min got: reşahî tu bi raya Xwedî bikî tu bêjî ka tu kî yî? Lê dema ku reşahî hê hinekî din jî nêzîkî min bû, min dît ku ew kurê keçel ê pînedizê me ye. Min jê re got: ma qey tu insan î, mala te neava, ma qey te nedikarî tu dengê xwe bikî?.. ". Ebdulbaqî ev got û ji bo ku hevalên wî yên pêşmerge jê re nebêjin tirsonek, cardin dest bi methê xwe kir û got: "Ezbenî, sond li canê we be, dema ku em biçin şer, ez ê şeşluleya xwe ya le'netî wisan biteqînim ku hemû ordiya 'E'lahezretê Xumayînî ji tirsan zikê wan biteqe...". Kurekî Kirmanşanî yê ku navê wî Nasirqulî bû, jê re got: "Kek Ebdulbaqî, tu bi serê Hezne dikî, tu henekan nekî. Birayê min, te sehkiriye ku dibêjin: 'bi tir û fisan hemam germ nabe! tu fayda pesindanê tune, eger tu mêr î di meydana ceng û şer de xwe nîşan bide, bi henekan şer nayê kirin...".

Nasirqulî gelekî bêdeng û melûl bû, çi kesê çavê wî pê biketiya dizanî ku ew xortê şox û şeng dilê wî tejî gotinin û li hevalekî digere ku ew jê re vala bike. Wê navê re ku hemû pêşmerge bi henek û laqirdiyan mijûl bûn û rojên xwe bi ken û xweşî derbaz dikirin, Nasirqulî her mat û xemgîn bû. Ne tenê ku ken û henek jê sadir nedibû, belko ji henek û ti-

nazên Ebdulbaqiyê Kelhurî jî aciz dibû. Pîrût wek fermanderekî karzan û agah li hemû derdên pêşmergeyên xwe, yên di dilê Nasirqulî de bûn xwendin û dest avêt sitûyê wî û jê re got:

– Birayê min, tu ji bo çi ewqas dilmayî û melûl î. Kirmanşana te bi bîra te ketiye û yeqîn tu niha dibêjî: "va Sablax rizgar bû, çend roj şûn de emê biçin Seqiz û Baneyê jî ji destê dijmin rizgar bikin. Lê dê Kirmanşan di destê dijmin de bimîne...".

Ne çavê min, mereq neke. Dê dora rizgarkirina Kirmanşan jî bê. Dewleta azad û serbixwe ya Kurdistanê, navçeya petrolê û bi hezaran gund û avahiyên pirr bi serwet, wek baxê bê bulbul û bibara bê gul wisan e. Do haya te lê bû, dema ku Pîşewa ji pêşmergan re xeber da çi got? Wî got ku: niha ordiya Ingilîzan li Kirmanşanê ye û em jî xwediyê wê taqetê nîn in ku bikarin li hemberê dewletek mezin a wek Ingilîstanê rabin. Lê em nasekinin û emê ji bo azadiya hemû Kurdistanê têbikoşin. Komara me bûye çirayê ronahiya temamê Kurdistanê. Ha, haa tu wan pêşmergan dibînî? ew Barzaniyên birayên me ne û ji Iraqê hatine alîkariya me, bi awakî qehremanî ruhê xwe di riya Komara Kurdistanê de feda dikin. Çunkê ew Komar a xwe dizanin... Babê min, bila dilê te xweş û şa be, qet xwe aciz neke, gelek nakêşe dê tu wek fermanderekî qehreman ê hêza peşmerge bi xwe bi leşkerê xwe ve Kirmanşanê rizgar bikî û dê xelkê wê bi çepik û destgulan bên pêşiya te...

Dema ku Nasirqulî ew gotinên Pîrût ên dawiyê seh kirin, berken bû û got:

– Ev gotinên te mesela karwançî û kerê wî bi bîra min xist, ku ji kerê xwe re gotiye: "kero nemre bihare, şîva kero qêvar

e". Babê min, kek Pîrût, niha li Kirmanşanê tewş têkelhev û aloz e. Tu dizanî, dûtketina ji malê gelekî ne xweş e. Ew Ingilîzên sebab mala xelkê Kitmanşanê wêran kirine. Çavê xelkê li riya me ye...".

Dema ku Pîrût bi Nasirqulî re xeber dida, pêşmergeyên din mijûlê henek û tinazan bûn û Seyîd Ebdullahê Sablaxî, ku di dema xeberdana xwe de derewên mezin dikirin, çend pêşmergeyan li dora xwe berhev kiribûn û mesela xwe ya evîniyê ya di nav qelaxên sergînan a li Indîrqaşê ji wan re digot û hemû heval dikenandin. Seyîd Ebdullah digot: "Min li Indîrqaşê hez ji keçkekê dikir. Ew ewqas sipehî bû ku wek çirayê diteyîsiya. Çavên wê ewqas xweşik bûn ku te digot sitêrka Suheylê ye. Ciyê hevdîtina me di nav qelaxên sergînan ên malan de bû. Ez şevekê çûm wî ciyê me û di nav qelaxên sergînan de li hêviya wê bûm, tam wê navê re min dît ku tiştek ber bi aliyê qelaxê ve tê. Dema ku min baş lê nêrî, ez ji we re çi bêjim axayên min, va seyê zerê dirr ê Hacî Birahîm. Ez nizanim wî sebabê bîhna min hildabû û çi, wextî ziravê min biteqe û ez bêdeng li ciyê xwe rûniştim. Min tiştek girt destê xwe û min got, Wellehî eger ew bê min ez ê vê nîvê şilka serê wî bidim. Hinekî tarî bû û min tişta destê xwe de hilgirt û min hinekî lê nêrî, min got erêêê û erê mêrik me tamam kir. Vêca ezbenî seyê zer li ber deriyê qelaxa sergînan rûnişt, ez dikuxim ew direyî, ew dikuxe û ez direyîm û dibêjim ku belko destê min li kunga milê wî bigre...

Tam li vir Pîrût biken got:

– Seyîd Ebdullah te lezzet dît...

Seyîd Ebdullah ku gelek bêzarî xeber dida û dixuya ku wê şevê gelekî tirsiya bû, got:

– Kuro mala te bişewite, di wê demê de lezzet û mezzeta çi

û tiştê çi, agahê min bi tu tiştê nemabû, wisan li min hatibû ku tiştê min jî raketibû...

Gelek gotinên xweş bi kek Hesoyê Şikakî re jî hebûn. Heso du salan li Urmiyê eskerî kiribû û ji destê zabitên ordiya Şahînşahî gelek qehir û eziyet kêşabû û piştî belavbûna ordiya Urmiyê, tola xwe ji zabitan vekiribû. Vêca Heso ji pêşmergeyên hevalên xwe re qise dikir ku çawan ji destê wan zabitan kêşaye û çawan tola xwe ji wan vekiriye. Heso digot: " ez xulam, ez wextê Hukumeta Riza Şah de li bajarê Urmiyê esker bûm. Zabitê me mirovekî gelek xerab bû û ji pîsaya xwe pîstir bû. Hemû şevan piştî ku em radiketin, ew dihat û digot: "çavê xwe bel kin!", "simbêlê xwe qît kin!", "milê xwe req kin!", "tivinga xwe saz kin!". Me ji bo 'e'la Hezretê Şahînşahî şer dikir. Ji bo ku xewa min gelek giran bû min nedikarî ez zû bi zû rabim. Hemû caran wî bi zîlle û pehînan li min dixist. Wî sê caran digot: "dê kopek rabe!". Wextê ordiyê banz da wî ji tirsan kincên jinan li xwe kir û banzda gundekî Têrgeverê. Min dizanîbû ew çûye kîjan gundî. Ji ber vê, ez çûm wî gundî û min ew dît û gazî kir: "birêz zabit, te ez nas kirim?". Wî ji min re got: "tu mirovekî qenc î, were rehmê li min bike". Min jê re got: "bi salan te bi pehînan li min xist, niha guhê xwe bide min: "dîqat!, simbêlê xwe qît ke!, çavê xwe bel ke!, zikê xwe bikêşe hindur!, lingê xwe fireh ke!". Dema ku wî zabitî lingê xwe fireh kirin, min li ser hesaba dused caran pehînek li pişta wî xist. Wî kir qaje–qaj û bi zarîn bi ecemî got: "ey way gozim sindî, belim çixtî...".

Şev gelek dereng bû, lê kesekî ji pêşmergan hîsa bêxewî û acizbûnê nedikir. Hemû kêfxweş û şad bûn, dora kilamgotinê hat. Dengekî gelekî xweş li ser Nasirqulî hebû, ji ber ku ew heval jî kêfxweş û biken be Pîrût destê xwe avêt sitûyê wî

û jê re got:

– Birayê min, dê ka bi wî dengê xwe yê xweş kilameke aliyê Kirmanşanê ji me re bêje...

Temamê pêşmergên din jî jê daxwaz kirin ku ji wan re kilamekê bêje. Nasirqulî nekarî bêdiliya wan bike û bi wî dengê xwe yê xweş dest bi vê kilama han kir:

Ez Kurdistanî me xwe fars nizanim
Bi zimanê kurdî dertê ji giyana min
Ber bi bihîstinê herdu bi hev re rabin
Gotina min tesîr kir ji hev cuda bin
Kurdo min çi got te çi seh kir
Û bi gotinên nenasan ji min dûr ketî...

Nasirqulî ne hunermend bû û ne jî xwendewar, van gotinên pirr bi me'ne ji ber xwe ve çênekiribûn, wî ev di zaroktiya xwe de di dema gerelawêjî û sitiranên li gundan seh kiribûn. Di wê demê de ku temamê fikir û xeyala wî li Kirmanşanê bû, bêyî ku hay lê hebe ew kilam hatibû ser zimanê wî.

* * *

Di zivistana xedar û giran a sala 1945'an de, Pîşewa ji bo rizgariya navçeya Seqizê û Dîwandereyê ji destê ordiya dagîrker a Îranê biryar da ku hêza pêşmerge rê bikeve. Çend caran ji aliyê Hukumeta Millî ya Kurdistanê ve ji serok û fermanderên ordiya Îranê re hatibû gotin ku bê şer û bê xwînrijî Seqiz û Dîwandere vala bikin. Lê Hukumeta Îranê ev qebûl nekiribû û bi ser de jî roj bi roj beşên nû yên ordî, çek û cebirxanan dişand Seqizê û heta gelek çek û cebirxaneyên zêde da-

bûn çend axayên welatfiroş ên wek Qerenî Axa yê xelkê Kanîsewzeyê ku li hemberê hêza pêşmerge şer bike.

Ew emrê Pîşewa ji bo Pîrût û her wiha ji pêşmergeyên ku ji navçeya Seqizê bûn, mizgîniyek gelek xweş û mezin bû. Pîrût bi sitandina vî emrî, temamê pêşmergeyên Kanîsewze û gundên li derûdora wê li dora xwe berhev kirin û bi kêfa dilê xwe ew rêkxistin.

Pîrût ji wan re digot: "em çawan bigihîjin Kanîsewzeyê, ez ê berî hemû tiştî biçim û destê babê xwe maçî bikim. Çunkê min cara yekê navê Komeleyê ji wî seh kir û wî bi du gotinên xwe yên kurt û sade temamê me'neya kûr û hemû milên Komeleyê bi min da fehm kirin. Bi rastî jî ew ne tenê babê min e, belko yekemîn mamosteyê xebata min e jî...".

Pîrût, piştî van gotinan çavek bi ser pêşmergeyan de gerand, dît ku Şêrkoyê bira û dostê wî yê hevraz û nişovan hinekî aciz in. Xwe nêzîkî wî kir û ji bo ku dilê wî xweş bike, jê re got:

– Bira can, bêhna xwe teng neke, Xezala xwîşka min dê bi dîzek dewê sar ve bê pêşiya te, ez ê bi xwe bi destê xwe daweta te bikim û sergovenda wê jî ez ê bi xwe bikêşim...

Vê navê re peşmergeyekî ji Kanîsewzeyê û got:

– Kek Pîrût, min seh kiriye ku Qerenî Axa ji Pîşewa re kaxezek nivîsandiye û jê daxwaz kiriye ku wî qebûl bikin ew bê bikeve bin alaya Komara Kurdistanê, erê gelo ev rast e?

Pîrût bi berken bersîv da û jê re got:

– Ew heramzade wek lêfka hemamê ye, herroj li ser yekî ye, wek nisk pêş û paşiya wî kifş nîne. Ne, ne, wek tê gotin nîn e. Niha Qerenî Axa hê zêdetir xwe nêzîkî dewleta Tehranê kiriye û li navçeya Seqizê bûye çov û çomaxê destê Riza Xan. Te seh kiriye, dibêjin: "ker bi hecê nabe hacî". Qerenî

Axayê çi demokratê çi!. Eger ew çil cûzî Qur'an jî jiber bike, gereke kesek bawerî bi wî neke...

Beşek ji hêza pêşmergeyê Kurdistanê ku desteya Pîrût di nav rêzên wê de bû, ber bi aliyê Seqizê ve ket rê û ji Bûkan derbaz bû...

* * *

Qerenî Axa bi fermanderê jendirman, kur û xulamên xwe ve nêzîkî wê qetpala ku kek Mamend bi şev di şikevta wê de mabû, bûn. Ji nişka ve kêrvoşkek rabû û kurê Qerenî Axa yê mezin ku rista Guleşîn di destê wî de bû berda û bi xwe jî bi bayê bezê ket pê kêrvoşk û taziyê û Xwedê çiqas deng dabûyê diqêriya û digot: "dê Guleşîn, dê babê min qurbana te be, bernede!, dê babê min bernede!..."

Qerenî Axa ku di pişt de dihat û ew gotin seb dikir, tenê serê xwe dihejand...

Ew kêrvoşk ji kîsê wan çû û di nav daristanê de wenda bû. Hê gelek bi ser de neçûbû, yek ji xulaman rêçeke nû dît. Ew û kurê axê li pê ketin û hinek çûn, xulam ji dûr ve dît ku kêrvoşkê xwe di biniya şikevtê de di nav befrê de qelizandiye û bi zorê çav û simbilê wî dixuyên. Ji bo ku kêrvoşk bi ser wan re derbaz nebe pêşî lê birî û dest bi qêrînê kir: "hêy, tu ku de biçî, ji min re xulamê Qerenî Axa dibêjin".

Hê hemû siwar li derûdora kêrvoşkê nehatibûn hev û çaverê bûn ku Qerenî Axa kîsa xwe derbixe û heqê dîtina kêrvoşkê bide û pişt re tajiyê berde. Qerenî nejidil û gelek bi hişyarî kîska xwe ji paxila xwe derxist û di ciyê pêncî tumenan de kaxezek pênc rumen girt destê xwe û dikir ku bide xulêm, dît ku ji aliyê şikevtê ve xwişe–xwişek hat û kêrvoşkê

xwe ji ciyê xwe avêt...

Kek Mamend, ku wê şevê heta sibê di şikevtê de mabû, zimanê wî nedileqiya û herdu lingên wî sirbiribûn, tenê perdeyên guhê wî nedirabûn û bi zor û bela jî be hê hinek taqeta wî ya bihîstînê mabû. Dema ku xulamê Qerenî Axa li hemberê şikevtê qêriya, bêyî ku bizane ew dengê kê ye û çi dibêje, dengê wî wek dengekî ji dûr ku ji binê çalek gelek kûr bê hatibû guhên kek Mamend. Kek Mamend di wê halê de jî hê hêviya jînê ji destê xwe bernedabû û bi bihîstina wî dengê bi zikxuşilandî serê xwe ji şikeftê derxistibû...

Dema ku Qerenî Axa dît kêrvoşk banz da pênc tumenê xwe kir bêrîka xwe û ji kerban ewqas aciz bû ku, te digot pizuta êgir e û dikir qîre qîr û digot:

– Kuro, ew çi xişe–xişe?

Qerenî Axa bi xwe jî hespê xwe da ber rikêfan û nêzîkî şikeftê bû. Dema nêzîk bû, dît ku kelaxê kek Mamend li erdê ye û bi zorê nefesê distîne. Axa hinek din jî aciz û tore bû û ji hespê xwe peya bû û bi pehînan lê wer bû û dest bi dijûnan kir: "hey tolebab, li serê çiyê jî tu dibî asteng li ber kêf û xweşiya min, eger te serê xwe ji wê şikeftê dernexistibûya wê kêrwoşkê banz nedida". Kek Mamend, bi zimanqerimî her tenê karî bi çavekî gelek bi kîn û kerb li Qerenî Axa binêre. Qerenî Axa xwe kerr nekir û her diaxift û digot: "dê bila canê te ji birçiyan derkeve! axira we tevan ji birçiyan mirin e. Kurmanc çiye ku bêje ez li hemberê axa heme, dê bila niha Pîrûtê kurê te bê hawara te!...".

Dema ku fermanderê jendirman zanî ku ew kek Mamendê babê Pîrût e, berken bû û Qerenî Axa ji wê berkenê razîbûna sergord Şimîran ji wî karî derxist û hinekî din jî li kek Mamend xist.

Kek Mamend; bi vî awayî li ber çavê Qerenî Axa û fermanderê jendirman nefesa xwe ya dawiyê da...

Tam wê navê re ji aliyê Kanîsewzeyê ve siwarek bi lez ber bi Qerenî Axa û hevalên wî ve dihat. Dilê Qerenî Axa bi dîtina wî siwarê bi lez dest bi gurpe–gurpê kir. Siwar yek ji wan xulamên Qerenî Axa bû û dema ku nêzîkî axa bû bi lez got:

– Ezbenî, pêşmerge gihîştin gund û tu kesî li hemberê wan şer nekir. Berê hemû kesî Pîrûtê kurê kek Mamend bi cil û bergên zabitan ve ket nav gund û niha jî li we digere...

Bi bihîstina vê xeberê rengê Qerenî Axa bû wek cewê spî û ji bo ku ber dilê wî bikeve, berê xwe da fermanderê jendirman û xwest bizane ka gelo dikare çi jê re bike. Fermanderê jendirman li ser hespê xwe çik mabû sekinî û deng jê dernediket, te digot kerr e, bi awakî bile–bilî got:

– Lazime em banz bidin, eger em bikevin destê pêşmergan ew ê me bi zindî bigurên...

* * *

Berî beyana sibê desteya pêşmergên Pîrût bi hev re bi gotina:

"Ey reqîb her mawe qewmê kurd ziban
Nayşikîn daneyê topê zeman!"

Ser bi kelê ketin û derbazê nav Kanîsewzeyê bûn. Tivingdarên Qerenî Axa ku ji hemû gundiyan pêk hatibûn û di dilê xwe de qasê dinyayê rikê wan ji Qerenî Axa vedibû, di saya melayê gund ê endamekî Partiya Demokrat ê nehênî, ku gelek caran ew têgihandibûn û bi wan dabû fehmkirin; nebe ew şerê birayên xwe bikin û di muqabilê kurdên birayên xwe de navê xerabiyê bi xwe ve deynin, çunkê Qerenî Axa dijmi-

nê kurdan e. Vêca ji ber vê, tu kesekî li hemherî wan gulleyek jî neteqandibû.

Pîrût nedizanî ku Qerenî Axa li mala xwe nîne. Ji her vê, çend pêşmerge şandin ser riya Seqizê ku rê li ber bigrin û nehêlin ew banz bide. Grûbeke din ya pêşmergan jî şand mala Qerenî Axa û ji bo xatirê dilê Şêrko, bi xwe jî berê xwe da mala xwe. Dema ku Pîrût gihîşt hewşa mala xwe dengê şîn û girîna xwîşk û birayên wî hat guhê wî û bi hev te digotin:

"Dayê can, em ji birçiyan mirin... ax babê me nehat...". Pîrût bi bihîstina van dengan temamê dinyayê li ber çavê wî tarî bû û wek dînan xwe avêt hindur.

Xaltiya Menîcê pêşî kurê xwe nasnekir. Pîrût ku çend sal berî niha bi tana kiras û derpê çûbû, niha cil û bergê pêşmergeyên Kurdistanê li xwe kiribû, sitêrkên ser milên wî dibiriqîn û qet nedima Pîrûtê berê. Zarok û xortên malê gotin qey ew fermanderê jendirmane ket hindur û tevan dest bi qêjîniyê kirin. Ew reben û êxsîrên zimangirêdayî çi bikin, heqê wan hebû. Piştî kuştina Xwocendî û Mîne Axa û bêserûşûyîn wendabûna Pîrût, çend caran fermanderê jendirman wext û bêwext avêtibû ser mala wan, li kek Mamend xistibû û dijûnan lê dabû û jê re gotibû: "kurê te li erdê yan jî li asîmanan be dibê tu ji me re bînî...".

Ew kesên li mal tenê Xezal kekê xwe naskir û di cî de xwe li dest û milê wî da. Dema ku hişê xaltiya Menîcê hat serî, wê kurê xwe têr bihên kir û dest bi qêrînê kir û pişt re got:

– Ez sedeqa serê te bim, min zanî ku tu fermanderê jendirman î...

Pîrût bi sehkirina van gotinan, zanî ku jendirman kek Mamend girtine û birine Seqizê. Bi lez pirsî:

– Êêê babê min li ku ye?

– Kurê min, mêrik ji do sibê ve çûye nav daristanê ku hinek dar berhev bike û bibe bajêr bifroşe û hinek arvan bistîne, ji wê çaxê ve hê nehatiye, zarok jî ji bo pariyek nan hawara wan e...

Êdî Pîrût xwe li mal gelek mijûl nekir û ber bi mala Qerenî Axa ve çû. Ew pêşmergeyên ku Pîrût ew şandibûn mala Qerenî Axa, jê re cewab şandin ku Qerenî Axa bi fermanderê jendirman re ji paşîvan ve çûye nêçîrê.

Pîrût hê ji zaroktiya xwe ve dizanî ku babê wî li kîjan ciyê daristanê daran berhev dike. Bêsekin bi çend pêşmergeyan ve ber bi daristanê ve çû. Piştî lêgerîneke zêde li nav daristanê û qetpala çiyê, nêzîkî şikeftê bûn. Ji nişkave çavê Pîrût li cesedê babê wî yê sirbirî yê req û bêruh ket, beziya ser û himbêz kir û qêriya: "babooo, babo can, babooo!..." Lê tu pêjin ji kek Mamend nehat û Pîrût ji çavên wî yên mirî van gotinan xwend: "Di riya bidestxistina nan de, ez bi mêranî mirim. Lê, min serî li ber nemerdan netewand! Lawê min, merd be û bi mêranî bijî!...".

Pîrût û hevalên wî cenazeyê kek Mamend anîn gund û gelek bi hurmet li qebrîstana pişt malan veşartin...

Du roj piştî vê serpêhatiya han, ew xulamên bi Qerenî Axa re çûbûn vegeriyan Kanîsewzeyê û gotin ku, Qerenî Axa, fermanderê jendirman û zabitên din li Kanîseyîdê cil û bergên jinan li xwe kirine û ber bi Tehtanê ve çûne...

*DAWÎ*

# Pêşgotina çapa duwemîn

## Rehîmê Qazî

Ji welat dûr gelek nexweş e. Dûr ji wî ciyê ku te çavê xwe lê vekiriye, çerm bi bedena te ve hatiye û zimanê te li wir vebûye. Dûr ji kes û hevalan. Dûr ji wan kesan ku di dema berfehmiya te de bi te re bûne, te tinaz û henek bi wan re kiriye, xwe bi wan girtiye. Li ba te wisan bûye ku dê hûn heta hetayê bi hev re bin, qet ji hevûdu veneqetin; dûrketina ji wan gelek nexweş, dilkul û giran e. Ew jî dûrbûneke wisan ku bi te ve girêdayî nebe, tu nekarî ne kurt û ne jî dirêj bikî.

Li gor min, jiyan, livîn û serpêhatiyên dema zaroktiyê, ew jî bi wê mercê ku te ew jiyan bi awakî ciwan, xweş û dilxweş a tejî ji av, dar, mêrg, çîmen û baxên kurdewarî de derbaz kiribe, daîma di bîra te de dimîne û wek perdeyek filma sînemayê ber çavê te re derbaz dibe, bi taybetî dema dûr ji welat û di xerîbiyê de.

Belê, min li avahiya Gwêgecelê ya ser Çemê Cexetû çavê xwe vekiriye û bi ziman hatime, bi ser pepikan ketime, hevrê, dost û hevalên wê dema min a zaroktiyê ya pêxwas, kirasqetayî, derpêpînekirî, serrût, çilmîn û keçel ên rûniştiyê wî gund bûne.

Dûr ji welat –di dema jiyana min a ne xweş de, di wê demê de ku bi baştirîn û bi nav û dengtirîn unîversîteya cîhanê de min lêkolîna zanistiyê didomand û yan bi zimanê biyanî min ders ji xortên gelên cihê cihê yên cîhanê re dida, di wê demê de ku min di tiyatro, pêşangeh û klûban de li baştirîn baletên cîhanê dinihêrî yan min guhê xwe dida operayên klasîk ên herî bi nav û deng û dîrokî, yan bi guhdana dengê mûsîqeya Bethoven, Şopen, Çaykovskî, Bax, Bize, Şistakovîç û Hatad bi dilek xweş diketim nav derya xeyalan, di wê demê de ku ji bo hişyarî, modernkirin û berhevkirina hêz û enerjiyek nû ya ji bo têkoşînek nû ya baştir, ez diçûm nav koşkên bilind ên di nav daristan, qeraxên deryan û çiyan û bi nûnerên bi dehan û bi sedan netewe û gelên din re dibûm nas û dost û min hevalên nû peyda dikirin, di wê demê de ku, di konferans û civînên

zanistî yên cîhanî yên di derheqê dîroka gelan de, min birrek meselên di derheqê tevgera rizgarî–neteweyî ya gelê kurd de gotarên zanistî pêşkêşî zana û pisporên welatên cihê dikir, bi kurtî di dema xwe ya xweşiyê de, li derve û ji welat dûr hêvî û daxwazek min hebû ku qet li ber çavê min wenda nedibû û ji dilê min dernediket, gelek caran min didan xuyakirin û min ji wan kesên li ba min bûn re vedikirin. Ez bêdeng dibûm û min digot: "Erê tu dibêjî dê carek din jî çavê min li Gwêgecelê bikeve û li gel Seyîd Hûseyn, Xalindî Ehmed Cûcîlan, 'Enewî Mîrza Xelîl, Hemegîr, Esedullahê Smaîl Babirî, Mihemmedê Mahşeref, Mehmûdê Mîrza Ehmed û yên din bikeve û em ê biçin bin 'Taqedar' û di gola kûr, şîn û xweş de sêbahî bikin an biçin nav dehlên darên çilo û serê li çiyan nêçîrê bikin? Belê, bêj e, dê carek din ji min re li hev bê ku heta derengê şevê ez di hucreya feqiyan de rûnim, em gerelewêjî bikin û ji Kerîm Serşîn û Reşîd Zara lava bikin ku bi dengên xwe yên xweşik sitrana 'Heyran' û 'Wergerê Awêzant bim' ji me re bistrên an li mizgeftê û piştê nimêja îşayê bi Hesen Pûrzilexa û Ebdûlkerîmê Nenexan re 'leyîstika gore' bilîzin?..." Belê ev hemû hevrê û hevalên min ên dema zaroktiyê bûn, qet ji ber çavê min wenda nebûn û niha jî dilê min bi wan xweş e. Ji wan, ên ku nemayîne Xwedê wan efû bike û yên mayîne jî Xwedê daîma saxî û selametiyê bide wan. Ev tenê hêvî û daxwaz nîn e, ev koncek biçûk ji bo wî ruhê welatparêziyê ye ku wek deryayek bêbinî û bêsînor di dema ji welat dûr dil û mejiyê mirov ji xwe re dikin wasite.

Ez nizanim ji bo çi wiha bû, di ciyê hemû şiîrên farisî û kurdî ku min di zaroktiya xwe de jiber kiribûn, daîma tenê ev şiîra babê min dihat ser zimanê min, min car caran bêyî ez hay lê bim bi dengekî bilind ji ber xwe ve digot:

Sersewz e Baxê Arezû, nêzîk e bête ber
Mezrayê humîdî tînuw e, wextê şeva wê ye

Qet nabe mirov bêhêvî û dilsar be. Ez nemirim û hêviya min bicî bû. Ez vegeriyam welat. Ez çûm Gwêgecelê. Lê mixabin "Taqedar" û "Baxê Arezû" nemabûn û di bin ava bendê de mabûn. Hemû bîranên min ên dema zaroktiya min careke din ji nû de hatin ber çavê min. Çavê min

ronî û dilê min geş bû. Eger ez bêjim temenê min nûjen bû û ez hatim ser dewra xwe ya berê, lê bi bîr û bawer, bi kirin û bi ruhekî nû ve min qet derew nekiriye. Gelek mixabin, piştî 33 salan, ku temenek e, cardin ez dibînim ku mezrayê hêviya welatê min hê tênî ye û wextê şevava wî bi temamî hatiye û bi başî dibê av ser bigre. Va min jî wek hemû gelê xwe zendên xwe rapêçan û coyan jê re xweş dikim ku têr û tesel av vexwe ku, hemû wextê hêşîn bimîne, dir û deviyan ji nav bijêrim û wê aşêv bikim ku ava bimîne û sal bi sal dahatek zêdetir û baştir jê bê wergirtin.

Ruhê welatparêzî, baweriya bi wê ku ji nû de çavê te li welat û li netewe dikeve, hêvî û çaveriya welat û netewe bi te, ruhiyet, hal û tama mirovragirtinê te naçar dike ji bo paşvenemayîna ji qefîleya têkoşerên gel û qerzdarnebûna li hemberê neteweyê xwe û xizmetekê bikî û erkê ser milê xwe yê netewayetî cîbicî bikî. Di muddetê ji welat dûr de, ez nivîsandina serpêhatiya PÊŞMERGEyê li hemberê welat û neteweyê xwe xizmeteke xwe ya biçûk dizanim, dibê ez bêjim ku ev yekemîn roman e ku min bi kurdî nivîsandiye.

Nêzîkî 25 sal berî niha, min di kovareke kurdî de serpêhatiyek kurt ji rûpelek borî xwend, ku di derheqê jiyana tehl, nexweş û belengaz a mala kurdekî feqîr û reben de hatibû nivîsandin. Vê serpêhatiya kurt perdeya mezin û bêsînor a jiyana xemgîn û hejar a gelê min anî ber çavê min û ji ber vê, bû çavkaniya hêz û îlham ji nivîsandina vê romana han re û min destpêk jî her bi naveroka wê serpêhatiyê dest pê kir.

Bêjeya "pêşmerge" diyarî û bîranîneke binirx, delal û birêz e ku ji yekemîn komara netewî û xwedmuxtarî ya Kurdistanê ji me re maye.

Dîtina bêjeya pêşmerge bi serê xwe destanek e. Di dema Komara Xwedmuxtarî ya Kurdistanê de, pêşewa Qazî Mihemmed ku girîngiyek gelek zêde dida ziman û edeba kurdî, xwest di ciyê bêjeyên serbaz, esker, nîzamî û fedayî de bêjeyek kurdî ya xweş peyda bike ku di ciyê wan de bê bikar anîn. Vêca ji ber vê, grûbek ji nivîskar, hunermend û pisporên kurd ji bo vê armancê civînekûê çêdikin û çend seetan gotûbêjê li ser vê mijarê dikin, lê nagihîjîn netîceyek. Kurdekî kal, nexwendî û dinyadîtî ku di wê civînê de xizmeta wan kesan dike, nan û çay ji wan re tedarik dike, dibîne ku hemû kûr kûr difikirin û ketine nav deryaya xeyalan, ji nişkave hildide û ji wan re dibêje: "erê hûn ji bo çi xwe ewqas beleheq

aciz dikin, bab û bapîrên me ji mirovên mêrxwas û kêrhatî re pêşmerge digotin, hûn jî eynê navê bikar bînin."

Vêca bi rastî jî bi sehkirine bêjeya pêşmerge, kurdekî serînetewandî, mêrxwas, netirs û bikêr, kurdekî welatparêz, rizgarîxwaz û demokrat, kurdekî li hemû ciyê naskirî tê ber çavê mirov. Bi sehkirina bêjeya pêşmerge bi dehan bi sedan ew lawên kurd ên bêtirs tên ber çavê me ku di sefên xebat û têkoşînê de ji bo rizgarî û serxwebûnê bi qehremaniyek bêemsal jiyana xwe feda kirine, heta nefesa xwe ya dawiyê jiyan û wefadariya xwe di nav sefên pêşmergayetiyê de ragirtine. Ji riya xwe şaş nebûne û di dîroka neteweyê xwe de destanên qehremaniyê hûnandine. Bêjeya pêşmerge, dêmen û rûyê wan mirovên binirx û birêz radixe ber çavê me ku, bi mêranî, karzanî û xemxwariyek taybetî ji bo xizmeta gel û welatê xwe zend û baskên xwe rapêçan, Partiya Demokrat a Kurdisranê damezrandin û têkoşîna gelê xwe di riyek durust, baş, bifeyde û li gor pêwistiyên dema xwe gihandin serkevtinê, Kurdistan bi cîhanê dan nasîn û dan qebûl kirin ku, kurd xwediyê hêz, îrade û karzanînek wisan e ku ji hemû kesî baştir dikare kar û barên welatê xwe bigerîne û li ser hukum bike. Ew kesê wek ku xebatkarekî zana, têgihiştî û dûrbîn dibistana bi nav û deng, muhkem û dadgeha xebat û têkoşînê bi pêşveçûna gelê kurd ve damezrand, dost û dijminê gelê kurd da nasîn, tovê biratî, dostayetî, yekîtî û hevkariya gelên Îranê reşand, ew kesê wek pêşmergeyê hejmara yekê bi tawanê rizgarîxwazî û welatparêziyê bi serbilindî şerbeta şehadetê tam kir: pêşmergeyê hejmara yekê, serokkomarê Kurdistanê Pîşewayê nemir Qazî Mihemmed bû.

Di vê romanê de nivîskar têkoşiye ku temamê sirûşt û taybetmendiyên pêşmerge, di xebat, têgihiştin û awayê xebata pêşmergeyekî sade yê wek Pîrût û Şêrko ve bîne ziman. Vêca ez heta çi dereceyê di vî karê de serketime, ew bi teqdîr û bîr û baweriya xwendevanên birêz ve girêdayî ye.

Romana PÊŞMERGE, cara yekê di sala 1959'an de li bajarê Êrîvanê, di sala 1961'ê de li Bexdayê bi kurdî û di sala 1963'an de li Bakûyê bi azerî hatiye weşandin. Li Kurdistana Iraqê ji aliyê xwendevanên kurd ve, bi taybetî ji aliyê edebiyatnas, pisporên edeb, hunermend û nivîskarên kurd ve pêşwaziyek baş lê hatiye kirin û di gelek rojname û kovarên kurdî de li ser nivîs hatine weşandin, meth û rexne li ser hatine kirin. Mixabin, şert

û merc û helwêstên wê demê yên Îranê, yanê desthilat û hukumeta xwînavî ya bereya Pehlewî û kirinên dirindeyî yên SAVAK, mecal nedan ku PÊŞMERGE li Kurdistana Îranê belav bibe. Piştî ku ez vegeriyam welêt, gelek nas û dostên min, bi taybetî hejmarek hunermend û nivîskarên kurd, bi ser tevan de jî fexr û şanaziya neteweyê min, gula serkopa îro yê edebiyata me, mamosteyê birêz, hêja, hunerê netewayetî û civakî yê Kurdistanê Hêmin, ji min daxwaz kir ku ez romana Pêşmerge ji nû de biweşînim. Belê ez niha daxwaza ezîzên xwe bicî tînim.

Dem û riya îro ya Kurdistana Îranê li gel wê serdema ku romana Pêşmerge hatiye nivîsandin, di hemû waran de, bi taybetî di warê siyasî û civakî de ferq û cihêtiyeke wê ya mezin heye. Hîs û têgihiştina piraniya gel, awa û tebîetê xebat û têkoşînê guheriye û ber bi pêş de çûye. Di hemû waran de ferqa pêşmergeyê îro û pêşmergeyê wê demê heye. Karzanî, netirsî û azayetiya her pêşmergeyekî wê rojê bi serê xwe roman û destanek e. Pêşmergeyê serînetewandî yê gelê kurd, wê çaxê li rexê tevgera demokratîk û netewayetî ya dijî emperyalîzmê ya gelê kurd û temamên gelên Îranê rawesta. Tu firset neda destê wan û qehremaniyên bêemsal dan nîşan. Di wê xebata muqeddes de hejmarek pêşmergeyên serînetewandî şehîd bûn. Çapa diduyan a Pêşmerge wek qedirzanî û sipasiyek ji dil e ji bo bîranîn û xatiratên jibîrneçûyî yên wan şehîdên nemir ên gelê me.

Koşka edeba kurdî gelek bilind û rengareng e. Kok û bingehek wê ya kûr û xurt heye. Bi taybetî di warê şiîr û metelokan de. Lê mixabin, edeba me di warê romanê de jar e û ew jî ji ber vê ye ku, şert û mercên hukumetên dîktator û kevneperest firset û mecal ji nivîskarên me re nehiştine ku xwe bilepitînin. Eger romana Pêşmerge bikare di koşka edebiyata kurdî de wek kevirekî ciyê xwe bigre û xwendevanên birêz nirxekî bidinê, ew dê bibe xelatek gelekî bi qîmet û baş ji bo nivîskaran.

Ez sipasên xwe pêşkêşî we dikim.

*Mehabad 1980*

# Pêşgotin

## Izzeddîn Mistefa Resûl

Pêşmerge, çîrokek dirêj e, diçe dikeve nav wî baxê gulên bêhnxweş ên ku di baxçeyê edebiyata kurdî de vedane, yan jî destanek taze ye bi kinceî nû yê huner ve, awakî nû ya romannivîsiya bi çend qehreman a mêrxasî û dilêriya gelê kurde dide xuyakirin. Ew bi dowanzdeh siwarên Merîwanê, Kela Dimdimê, Xanzade, Şerîf Hemewend û Mehmûd Axayê Şîwekelî re di nivîsa romanê de ciyê xwe di xaneya nivîsxaneyê de digre û ev jî serdema bextiyarî û serbixwetiya neteweyê kurd dide nîşan. Di muddetê xewa xweş ya Komara Kurdistanê ya Demokratîk, bi yadê pirr hêja ya dema paytextiya Mehabadê bi xwîna sor a geş a şehîdên kurd, rengê kesk a axa pak a Kurdistanê û serpêhatiya dilê bêtem ê gelê kurd ê aşitîxwaz, birayetî û azadîxwaz, bi van sê rengên sipehî yê alaya delal a Kurdistana Demokratîk ku bi ser erda mîhrîban û axa dilêran û çavkaniya qehremanan, bi ser Mukriyan de daçikandiye, bi wî rengê xweşik bi zebra gula gemim û bi xameya nav alayê destaneke din afirandiye.

Ez li vir naxwazim behsa nivîskarê Pêşmergeyê bikim, wek birayê şehîdê mêrxas Seyfî Qazî û kurmamê şanazî yê nemir ê gelê kurd şehîd Qazî Mihemmed, an wek xwendevanekî kurd ku hiş û bîra kurdayetiyê di bîra nû ya di axa Sovyetê de perwerde kiriye û niha neferekî rewşenbîr ê bi pirrbawer e di meydana xebata gelê me yê mêrxwas de, ez dikarim vê bêjim ku, xwediyê Pêşmergeyê di çiyayên Kurdistanê de yekem nefesa şîmal a rewan a wî welatê mêtiye û destpêka zarokî û xortîniya xwe li gundên Mukriyan derbaz kiriye, bi vî awayî şarezayê gelek koncên jiyana civakî yên gundiyên welatê xwe bûye, di xortaniya xwe de bi çavê xwe rojên jibîrneçûyî yên Kurdistanê li Mehabad dîtiye. Têr li alaya muqedes a kurd nêriye. Pişt re hatiye Sovyetê û bi xwendewariya nû ya giyan û behra jiyana nû û berhemên nivîskarên li wir tesîreke eşkere ser zanîn û awayê nivîsa wî kiriye, ji ber vê, Pêşmerge tebeqa herî jor a riya rast a ber bi pêşdeçûna edebiyata kurdî girtiye ku dibê bi bingehekî qahîm a serwe-

ta neteweyê me ya kevin ve bê qahîm kirin û dîwar û rûkaşên wê bi kevir û nexşên xumalî yên têkel ên li gor hunera xelkê ya bilind bên vehûnandin, bi awakî wisan ku ji wan milên pêşkevtî yên gelên din îstîfade bike, lê tam bi awayê kurdayetî û ber bi pêşveçûna taybetî ya edebiyata kurdî bi xwe tê de be.

Bi qasî ez dizanim, piraniya wan kesên hêja yên Pêşmerge dixwînin di vê nêrînê de bi me re ne û piştî xwendinê jî dibînin ku, xwediyê Pêşmergeyê bingehê wê li ser gelekî xîmek kevin a destana me ya kevin daniye, wek em dibînin ew rola daye wê pîrejinê û xapandina Mirût ji aliyê wê ve, ew karekter in ku me ji çîrokên di nav xelkê de tên gotin seh kirine, yan ew stiran û kilamên di nav folklora kurdî de hene û di Pêşmergeyê de cî girtine, ew dêmenên taze yên ji beytên kevin ên kurdî ne. Bi awakî baş di ciyê wan de bikaranîna pendên pêşiyan xal û riyeke danevejîna nivîsa me ya klasîk û jê re dayîna rengekî taze ye.

Vêca ew tê dikeve nav wê dîwanxaneyê, ku bi awakî sade ya kurdî kincê "Powîst, çîroka bûyera Rusî" lêkirî, yan em bêjin li ser awayê hinek çîroknivîsên ereban ên destpêka vê sedsala han, bûyerên Mahabadê di qalibê romanê de û gelek tiştên dîrokî tê de bicî dike û bi awayê şerîta sînemayê radixê ber çavê me ku, ew kesên agahdarê wê demê nebin mimkun e tenê di çarçeveya xeyala nivîskar de fehm bikin. Xwediyê Pêşmergeyê, bi cil û bergekî sipehî wek nivîskarên îtaetkerê rasteqîniya sosyalîzmê wêneyekî radixe ber çav, wêneya jiyana cotkarên Kurdistanê, peywendiyên navbera gundî û derebegên xayîn, dijminatiya derebgên nûker bi gelê kurd û kurdayetiyê re, hewlên wan ji bo fetisandina komara sava û nazik. Di wê wextê de bi çend komek dêmenan ve ku wek li gel Gogol û Tolstoy be, yan wek li gel Maksim Gorki be di romana Dayîk de. Diyar e mêrxasî û sitûnetewandina Pîrûtê pêşmerge, kerb û kîna kek Mamend di ciwaniya xwe de, baweriya serkevinê di dilê tevan de bi tînî dike û dema ku komar ji holê tê rakirin, Qaziyê nemir û hevalên wî tên îdam kirin û ew bûyerên xwînavî yên li Mahabadê qewimîn, rûpelên kirinên emperyalîzmê û nûkerên wê hê zêdetir reş û tarî kirin. Di wê demê de em dibêjin, nîşandana axatî bi cil û bergên jinan û banzdana wan ber bi aliyê Şah ve, dimîne hawara dayîka Bawil ku polîsên Qeyser dest kiribûn binî û şoreşa sala 1905an tefandibûn, lê ev hawar hebû û digotin: "emê her ser-

bikevin", ev serkevtin û helatina dijmin û nepakan bû. Bêguman 1905'an bi xwe re Oktobrê anî û banzdana axayên xayîn ên kurd jî di dema şikandina alaya me ya muqeddes de bû.

Ev axaftinek ji serpêhatiya Pêşmerge ye. Bila ev jî jibîr neçe ku nivîskar nimûneyek rasteqînî ya awayê têkoşîna nehênî ya şoreşgerî ya Komeleya Jiyanneweyê Kurd (J. K.) radixe ber çavan ku ew û hinek komeleyên kurdan ên berê wê, di têkoşînê de xwediyê serbilindî û dahênerî yên taybetî ne. Ev jî di dema endametiya Pîrût û Şêrko ya di komeleyê de, ku Qaziyê şehîd dibînin derdikeve. Ev jî dibê di bîr de be ku, li gel wê jî Pêşmerge çend rûpelên xweşik ên sade yên nivîsa kurdî ye û bi taybetî ku bi devoka Mûkriyan hatiye nivîsandin, ew devoka ku li gor baweriya min xweştirîn û paktirîn awayê nivîsandina kurdî ye.

*Moskova, 1960*

# Balkêşanek

## Hesen Qizilcî

Zimanê kurdî jî wek zimanên din bi neteweyê kurd re peyda bûye û di seranserê temenê vî millet de wasiteya têgihiştinî û têgihandinî bûye, pêwistiyên gelê kurd pêk aniye. Xwediyê qanûn, destûr û xezîneyek dewlemend a bêje û gotinan e. Li ber hemû bûyerên dîrokê xwe ragirtiye, kariye xwe rizgar bike û bimîne.

Lê, eger hûn rastiyê bixwazin û em xwe nexapînin, di warê edeb de, bi taybetî di beşa romanê de feqîr û kêmzexîre ye. Ev jî zêdetir ji ber vê ye ku, li hinek perçeyên Kurdistanê bi daxwaza helandinê mecal jê re nehatiye dan. Eşkere ye ku eger mecal jê re bihataya dan dê wî jî beşa xwe berhev bikira.

Lê, hinek kesên dilsoz hene, bi çi awayî be neteweyê xwe jibîr nekirine û kesp û karek jê re kirine. Yek ji van kesan Rehîmê Qazî ye ku romana Pêşmerge nivîsandiye.

Kek Rehîmê Qazî, kurê Seyfûlquzzat e, ku wî hemû wextê bi şiîrên ter û têrav kurd bi bîra xwe aniye, biraziyê Mîrza Fettah e ku ew di şoreşa giştî ya Îranê de ji bo hilweşandina hukumeta dîktator û damezrandina meşrutiyetê têkoşiye. Demeke dirêj di zîndanê de maye û di zîndana Tehranê de her wext welatê wî di bîra wî de bûye û di vî warî de wiha gotiye:

> "Xwezî min bizaniya ku ez kengî ji Tehranê rizgar dibim
> Gora min kolana yara min e yan Rey dibe gora min."

Ew birayê heme Huseyîn Xan ê biraziyê Seyfî Qazî ye ku xwe fedayê Kurdistanê kir. Kurmamê Qazî Mihemmed ê serokê Komara Mahabadê ku wek rojê di asîmana azadîxwazî ya Kurdistanê dibiriqe. Vêca ev kek Rehîmê han, riya kes, nas û xanedana xwe girtiye û mejiyê xwe ji bo mil-

letê xwe êşandiye û yek ji wan xemxwarê romana Pêşmerge ye.

Ev romana han bi qelemek rewan û awayek şêrîn nivîsandiye û rewşa jiyana kurdên Îranê daye xuyakirin, rewşa derebeg û gundiyan, zor û zordariya mîrî û piştivaniya şoreşa Mahabadê ya ji aliyê hemû eşîret û çînên Kurdistana Îranê ve radixe ber çav û wek eynik wê bi heleqa dîroka Kurdistanê ve girê dide. wek hatiye gotin; "heta libê wê neyê tam kirin, mirov nizane ka çî ye", heta ew neyê xwendin, mirov sipehîtî, xweşî û berziya wê ya edebî nizane. Êdî pêwist nake em li vir îzah bikin û rayêxin ber çav. Tu bi xwe bixwîne û ji tam û nûtiya wê tam bistîne.

Bi rastî ev tiştekî girîng e di koşka edeba kurdî de û xizmeteke bi qîmet e ji bo ziman û dîroka neteweyê me. Ez hêvîdar im gelek tiştên wiha bên afirandin û zimanê me bi dest û qelema edîbên birêz dewlemend be û di nav zimanan de ciyê xwe bigre. Bi taybetî ku niha dinya biçûk bûye, millet nêzîkî hevûdu bûne û rewşa aborî ya dinyayê bi bez pêşde diçe ku ev jî gelek tesîr ser ziman dike. Çi milletê sistî û tiralî bike dê zimanê wî lê bibe asteng.

Êdî bi hêviya dest û qelema edîbên dilsoz.

*Bexdad 1960*

# WEŞANÊN NÛDEMÊ

1- BINGEHÊN GRAMERA KURDMANCÎ Celadet Alî Bedir-Xan / Gramer (1993)

2- DÊ Û DÊMARÎ Egîdê Xudo / Roman (1995) 112 rûpel

3- KESKESOR Nûredîn Zaza / Çîrok (1995) 58 rûpel

4- DI FOLKLORA KURDÎ DE SERDESTIYEKE JINAN Rohat / Lêkolîn (1993) 153 rûpel

5- HÊZ Û BEDEWIYA PÊNÛSÊ Mehmed Uzun / Ceribandin (1993) 203 rûpel

6- MÎRZA MEHEMED Medenî Ferho / Roman (1995) 107 rûpel

7- MILKÊ EVÎNÊ Rojen Barnas / Şiîr (1995) 81 rûpel

8- ZAROKA ŞEVÊ Jack London Werger: Mustafa Aydogan / Çîrok (1995) 81 rûpel

9- BIYANÎ Albert Camus Werger: Fawaz Husên / Roman (1995) 108 rûpel

10- MÎRZAYÊ BIÇÛK A. de Saint-Exupéry Werger: Fawaz Husên / Çîrok (1995) 99 rûpel

11- GOTIN Yaşar Kaya / Ceribandin (1996) 115 rûpel

12- ANTOLOJIYA ÇÎROKA NÛ ... Xelîl Duhokî (1995) 104 rûpel

13- ŞEVÊN SPÎ Dostoyevskî Werger: Firat Cewerî / Roman (1993) 80 rûpel

14- MIŞK Û MIROV John Steinbeck Werger: Firat Cewerî / Roman (1993) 126 rûpel

15- BEXÇEYÊ VÎŞNE Çexov Werger Firat Cewerî / Piyes (1995) 92 rûpel

16- LI BENDA GODOT Samuel Beckett Werger: Firat Cewerî / Piyes (1995) 112 rûpel

17- GOTINÊN NAVDARAN Amadekar: Firat Cewerî / Aforîsma (1995) 106 rûpel

18- GIRTÎ Firat Cewerî / Çîrok (1996) 174 rûpel

19- KEVOKA SPÎ Firat Cewerî / Çîrok (1996) 60 rûpel

20- KULTUR, HUNER Û EDEBIYAT F. Cewerî / Ceribandin, hevpeyvîn (1996) 423 rûpel

21- XEZAL Sîma Semend / Çîrok (1996) 71 rûpel

22- EVÎNA REBEN Derwêş M. Ferho / Şiîr (1996) 80 rûpel

23- BANGA HAWARÊ Medenî Ferho / Şiîr (1996) 95 rûpel

24- KULTUR Û RAMAN Şerefxan Cizîrî / Ceribandin (1996) 150 rûpel

25- KURÊ ZINARÊ SERBILIND Sidqî Hirorî / Roman (1996) 156 rûpel

26- ŞIÎRÊN BIJARTE Mayakovskî Werger: Süleyman Demir Şiîr (1996) 132 rûpel

27- PÊLÊN BÊRÎKIRINÊ Mustafa Aydogan (1997) 171 rûpel

28- ŞEREFA WENDABÛYÎ YA KATHARINA BLUM


Heinrich Böll Werger: Şahînê Bekirê Soreklî / Roman (1997) 139 rûpel

29- HINGÊ Rojen Barnas / Çîrok (1997) 83 rûpel

30- KEÇA KURD ZENGÊ Cemşîd Bender / Çîrok (1997)

31- PÊŞMERGE Rehîmê Qazî / Roman (1997)

32- SORÊ GULÊ Süleyman Demir / Roman (1997)





**Dr. Rehîmê Qazî** di sala 1925'an de li Rohelatê Kurdistanê, li gundê Gwîgceliyê hatiye dinyayê û di sala 1991'ê de li Bakuyê wefat kiriye.

Ew ji malbateke navdar e û navê malbata wî di dîroka welêt de cihekî girîng digire. Digel têkoşerî û xebata xwe ya siyasî, Rehîmê Qazî perçeyê welatê xwe ji romanê jî bêpar nehiştiye. Ev romana ku wî di sala 1958'an de nivîsandiye, têkoşîn û xebata siyasî û civakî ya serdema Cumhûriyeta Mehabadê radixe ber çavan; jiyana pêşmergetî ya wê demê, zilm û zordestiya dagirkerên welêt, tadeyî û bindestiya hundurîn, bi awayekî sade û zelal digihîne me.

Em hêvîdar in hûn ê vê romana ku ji aliyê Ziya Avci ve adepteyî kurmancî bûye bi kêfxweşî bixwînin.

**NÛDEM**